


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

89
2024



Kwestan Janal
2023



Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 89/ 2024
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Koma hevkarên vê hejmarê:
Ali Çiftçi, Seyfi Dogan, Hızır Akbina, Mem Xelikan,
Mistoyê Heco, Amed Tigris, Salih Bozan, Bêrivan Keskin,
Adem Özgür, Feyzi Mîrhesen, Prof. Dr. Haci Akman
Mehtab İdelî, Xizan Şilan, Bilal Celepli, Siya Jandar,
Dilan Kaya, Dr. Bangin Fayo, Ikram Oguz, Ali Duran Topuz

Medya Kitapevi
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Birnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Birnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Birnebûn"Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Bask: Apec-Tryck AB

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re têt,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin. Ji ber stîl û devokên taybet em
dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Zîman li Almanayê piştgirên kovarê ne.

bîrnebûn 89

2024

Wênayê berg: Kwestan Jamal Bawan

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 89/2024

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Kilamên me; kilama Çanakkalê	8	Mem Xelikan
Dayîka strana Êma Hemê-1	10	Hızır Akbîna
Huner wek îfadeya siyasî li dîyasporayê	14	Prof. Heci Akman
Tiştinên reş, bêbawer û qirêj	31	Mistoyê Heco
Hîvronî	33	Seyfi Doğan
Deng û derîyên hesin-2	34	Adem Özgür
Kurdeleya sor	36	Halil Mîrzan Küçükyıldız
Dawetnameyên dawetan	39	Amed Tigrîs
Hevpeyvînek bi Barbara Sträuliyê re	40	Mehtap Îdelî
Mirineke azad	46	Xîzan Şîlan
Serpêhatiya mala Bişar û Seydo	48	Feyzi Mîrhesen
Ji xewna bakîreyekê	55	Sîya Jandar
Sandoqa xeyalan	61	Dilan Kaya
Rojnivîsk-1	67	Bêrivan Keskin
Îsmail Lawo	68	Bilal Celebli
Qerfo	70	Seyfi Doğan
Quto	71	Seyfi Doğan
Nasnameya kurdî û tekoşîna min	72	Îkram Oguz
Li ser xwarinên kurdî	77	Dr. Bangîn Fayo
Seba Heskîfê	80	Ali Duran Topuz
Nûjîn Qîdo û Sê rojên mê	82	Salih Bozan
27 saliya Bîrnebûnê: Heta niha çi kir û divê çi bike?	90	Adem Özgür

Ji Bîrnebûnê

Ev hejmar di destpêka biharê de derdikeve. Ev meha adarê, bihara pêşîn, li welatê me herçiqas bi şînahî, hêvîyên jîyaneka xweş dest pê bike jî em hersal bi bîranînên wek «Anfal», Halapce, Robotskî û komkujî, malwêranî û qirkirinên mezin ve rûbibrû dibin. Ne tenê bi kuştin, wêranîya malûmilk û xwazeyî herwiha ji aliyê mêjiya bi bîranînên kewneşopî û nasnameyê ve jî bi taybetî li bakurê welêt û herwiha li Anatolîya Navîn qirkirineka nasnameyî ya bêhempa didome.

Em ji kultura xwe bi dûr ketine, nas nakin û bi me xerîb(namo) û nenas tê!..

Newroz di salnameya kurdî de sersala kurdî ye ku dikeve destpêka biharê û sala nû di 21ê adarê de dest pê dike. Cejna Newrozê di dema zerdeştîyê de dînê resmî bû û ji ber vê yekê jî ji alî gelên din ên îranê ve jî tê pîrozkirin.

Di kevneşopîya kurdan de ev pîrozbahî di heman demê de bîranîna efsanewî ya hilweşandina desthilatdarîya padîşahêkî zalim yî bi navê Zehak e ku jê re Dehak jî tê gotin û zêdetirî 2500 sal berê ye. Ev efsane girêdayî mîtolojiya giştî ya Îranê ye û di Avêstaya pîroz û Şahnameya Ferdosî

de jî hatiye parastin. Ji wê hingê ve ye Newroz hersal dema destpêkirina sala nû ye, agirên mezin tên pêxistin.

Cejna Newrozê herwiha eşkerekirina nasnameya kurdî ye. Li gor mîtolojiya arîyan jî Newroz pîrozkirina Xwadayê bereketê, Armahîtayê ye.

Li Tirkîyeyê pîrozkirina Newrozê heta sala 1995an jî qedexe bû. Îro cejn bi taybetî li bakurê welêt bi naverokeka siyasî tê pîrozkirin.

Li gor kevneşopîya kurdan Newrozê weke roja serê salê an jî pêşwazîkirina biharê pîroz dikirin. Ev pîrozkirina Newrozê li Rojhilat, Rojava û Başurê welêt her wek berê tê pîrozkirin. Mixabîn ev pîrozbahîya Newrozê li ba bakurîyên welêt û herwiha li ba kurdên Anatolîya Navîn, herçiqas hinek şopên xwe wek xamilandina tepsîya ku bi gûçikên genim, nîsk an wekî wan dihatin xemilandin, bûka baranê, rengkirina hêkan ku tê wataya vejînê uwd hebûn jî lê niha nemaye.

Di Newrozê de malbat, xizm, heval û kesên nas di dema pêxistina agir de li hev dicivin û bi hev re govendê digrên. Ziyareta malên hev û bi hev re nanxwarin, beşeke girîng a Newrozê ye. Herwiha nakokî an sûvahatin ku

di nav malan de hebin, di rojên Newrozê de lihevhatin dibin, hezkirîyên hev ji hev ra dîyarîyan distînin. Ji zarokan re şîranî û dîyarî tîen belavkirin.

Rojek berîya Newrozê sifreya taybet a serê salê tê danîn ku jê ra dibêin sifreya sersalê (heftsîn).

Maseyeka taybet an an jî sifreyê li ser xalîçeyên nerm datînin. Ji vê tabloyê re heftsîn tê gotin ku di kurdî de tê wateya «heft tiştên ku bi s-yê dest pê dikin». Xwarinên ku divê li ser vê maseyê hebin ev in:

Sincik, ev fêkî di jiyane de dîlnizmîyê nîşan dide.

Simaq, bihareteke tirş e, nîşan dide ku xwarinên pêşerojê dê xweş çêbibin.

Sebze (hişinayî), tepsîya ku bi gûçikên genim, nîsk an wekî wan tê xemilandin. Bi vê yekê re tê hêvîkirin ku bibe saleka bi berhemeke baş.

Sêv, sêvek sor ku bedewî û tenduristîyê nîşan dide.

Semenu, ji nişê genim tê çêkirin. sembola xêr û bereketê ye.

Sîr, sembola tenduristî û şerê li dijî nexweşîyê ye.

Sîrk, sembola veguherîna ye.



Helbet ji derveyî van xwarinan xwarin û sembolên din jî tîen dayî, wek hêkên rengkirî, gul uwd.

Li hinek deverên Kurdistanê bi taybetî li başurê Kurdistanê Newroz sêzdeh rojan tê pîrozkirin. Ji roja dawî û ya sêzdehemîn a Newrozê re dibêjin sêzdebider. Di roja 13ê Newrozê de malbat bi piranî diçin derve, park û qadên xwezayî. Li wir bi awayekî vekirî pîroz dikin ku Newroz bi dawî dibe.

Em hêvî dikin bakurî û kurdên Anatolîyayê bikaribin vê kewneşopîya pîrozbahîya Newrozê ji nû ve wek cejna sersalê, bikin edet û bi malbatî pîroz bikin. Ji bo nasnameya zarokên kurd ev pir girîng e. Heta ku em ji xwe re nekin edet ti maneya xwe ji bo zarokên me dê tunebe!

Di vê hejmarê de ji çanda me ya gelêrî serpêhatî û kilam ji Mem Xelîkan, bi sernivîsa *Kilama Çanakkalê*, ji Hizir Akbîna *Dayîka strana Êma Hemê*, ji şirove û nivîsa Feyzî Mîrhesen bi ser nivîsa *Serpêhatîya mala Bîşar û Seydo*, ji Bilal Celebli, kilama *Îsmâil Lawo* hatine nivîsîn.

Ji salên 1970î vir ve bi sedan hunermendên kurd, ji herçar aliyên welêt li welatên Ewropayê penaber bûn. Li koçberiyê karibûn derbirînên xwe bi rêya hunerê derbînin. Birêz Prof. Hecî Akman li Zanîngeha Bergen a Norveçê di beşa arkeolojî, dîroka lêkolînên dînî û çandî de bi salan e kar dike. Di vê beşê de lêkolînên akademîk ên cûrbecûr tên kirin û herwiha qurs tên dayîn. Birêz Akman jî di warê beşa xwe de hinek lêkolîn kirine. Yek ji wan jî bi navê *Huner wek îfadeya siyasî li dîyasporayê* kiriye. Di lêkolîna xwe de hunermendeka kurd ya bi navê Kwestan Jemal Bawan bi me dide nasîn. Ji bo kovara me ev lêkolîna xwe bi kurmancî nivîsîye.

Barbara Sträuli, wergêreka Swîsrî ye, du pirtûk û destaneka kurdî ya *Dewrêşê Evdî* ya ku Baqî Xido nivîsîye, wergerandine almanî û îngilîzî. Mehtap Îdelîyê bi sernivîsa *Hepeyvînek bi Barbara Sträuliyê re* bi me dide nasîn.

Salîh Bozan bi sernivîsa *Nûjîn Qido û sê rojên mê* kitêbeka Nûjîn Qidoyê bi şiroveyekê bi me dide nasîn. *Sê Rojên Mê* balê dikişîne ser êş û azarên jina kurd a di nava nakokiyên şer û rûxandinên mezin de. Nûjîn Qido bi eslê xwe ji bajarê Efrîna Rojavayê Kurdistanê ye û sala 1996an li Şamê ji dayik bûye.

Ali Duran Topuz, bi helbesta *Seba Haskifê*, Seyfî Doğan bi helbesta *Hivronî* û bi kurtehelbestên *qito û qerfo*, Xizan Şilan bi helbesta *Mirineka azad*, Adem Özgür, bi sernivîsa *Deng û deriyên hesin*, Amed Tîgrîs, bi nimûneyên *dawetnameyên dawetan*, Sîya Jandar kurteçîroka bi navê *Ji xeuna bakîreyekê*, Bêrivan Keskîn *Rojnivîsk*, Dilan Kaya bi sernivîsa *Sandoqa xeyalan*, Îkram Oguz bi nasandina kitêba Mehmet Bayrak, sernivîsa *Nasnameya kurdî û tekoşîna min*, Dr. Bangîn Fayo li ser *xwarinên kurdî* ev hejmara pîrrengî dewlemend kirine. Mala van hemû hevkarên vê hejmarê ava be!

Bi hêvîya Newroza 2024an bibe destpêka jîyaneka serkeftî û aram, Newroza we gîştikan pîroz be!

Heta hejmara tê bimînin di xêr û xwaşiyê de!

Alî Çiftçî

Kamîl, însanekî rûnêrm, dilsoz, întelektûelekî bi empatî bû

Kamîl di sala 1956 an de li Çermûgê / Dîyarbekirê ji dayik bûye. Wî li Çermûg, Sîwerek û li Enqereyê xwendîye. Di navbera salên 1973-1976an de li li bajarê Seydîşehîrê eyaleta Konyayê weke karkerê laboratûwara kîmyewî xebitîye. Di nava tevgera sendîkayê de ci girtîye.

Ew di 1979an de li Enqereyê hat girtin û li girtîgeha Mamakê 7 mehan girtî ma. Piştî cûntaya 1980ê, ew birin girtîgeha Dîyarbekirê ya bi navûdengê "5 nolî"yê de pir îşkence dît û bi mêranî li ber xwe da. 1982an de ji dosyaya Ala Rizgarîyê 8 sal ceza li hatibû birîn. Piştî ku derket sirgûnî bajarê Sêwazê hat kirin. Li dawîya 1988an de hat li Swêdê îltîca kir, heta 1989an li kampa pêneberan de ma. Kamîl bi salan li weşanxaneyê Apecê kar kir.

Wî sê kitêp nivîsandin. Her sê kitêp jî bîranînên li zindanê û dema piştî zindanê bahs dike.

1. *Ana! Esas Duruşa Geç / Amed 5 Nolu'dan Hikayeler-1*, Weşanên Vate, 2011, Stenbol û Apec li Stockholmê

2. *Ana Esas Duruşa Geç! Amed 5 Nolu'dan Hikayeler-2*, Apec, 2018, Stockholm

3. *Sivas Sürgünü*, Apec, 2023, Stockholm

Kamîl li gor sê prensîpên felsefî yê zerdûştî jîya.

Hamata, hakata, werşta: Fikrên rind, hekatên rind û kirinên rind.

Kek Kamîl, bi pênuş û xûya enîyê xwe piştîpazîya kovara me Bîrnebûnê dikir.



Kamil Sümbül

1956.01.01 - 2024.02.11

Kamîl bi Bîrnebûnê pir xenî dibû û digot; Bîrnebûn çavronîya kurdan e.

Kamîl, mala te ava be! Çînwato piritto li ber te ronî û fere be! Cîyê te mala strana be!

Serê malbata Kamîl, jina wî, Asîye û zarokên wî, Bewran û Kawan, heval, nas û xismên wî sax be!

Kamîl di nivîsa xwe ya dawîyê de ku di malpera *Rûpela Nû* de weşandibû bahsa bîranînên xwe yê dema ku di mala durûk a li Dîyarbekirê de dima nivîsîye. Ji wî ra li dijî zordestî û zilmê helbesteka helbestwanê sovyetî ya bi navê *Li benda min be* ya Konstantin Mikhailovich Simonov barê wî çing sivik dikirîye bahs dike.

Çend rêzên helbestê:

....
Li benda min be, ez ê vegerim.

*Li benda min bisekine,
bi înat li hemberî mirinîyê
ji ber ku bendewarîya te ya mezin
ew ê min ji agirê dijmin biparêze.*

*Li benda min be di qije-qija germê
û di dipîya berfê de.*

....

Redeksîyona Bîrnebûnê



KILAMÊN ME (XIV)

Mem Xelîkan

KILAMA ÇANAKKALÊ

Herba Çanakkalê, li sala 1915a di navbera dewletên rojava/mutefîk (Îngiliz, Almanya, Fransa û hwd.) derketî bû. Dewletên mutefîk, ji bo ku Stenbol û tengav / (Boğaz –ên behran) ên dest Osmanîyan de bigirin dest xwe êrişî tengava Çanakkalê kiribûn. Osmanîyan li hember wê êrişê seferberî êlan kirin. Banga kesên dest çekan digirin, dikirin. Ku bi esker bin.

Kurdên Anatolîya Navîn jî ji wê herbê para xwe girtin. Ji gundên kurdan bi hezaran xort berhev kirin, kirin esker û şandin şerê Çanakkalê. Ew xortana, henê zewicî, xwedî zarok bûn. Hen jî bi dergîstî bûn. Hezkirîyên xwe dûw xwe cihîştin çûn. Lê pir ji wan xortana venegerîn. Hena kunya xwe hatin. Şehîd/cangorî

ketibûn. Hena jî, jê tu xet-xeber jî derneketin. Ji wan şûva, li heremê pir kilamên şîna hatin stran. Yek ji wan kilaman jî, kilama Rawa Hemikê ye.

Rawa Hemikê ji gundê Buldux e. Girêdayîyê Cihanbeylîya Konyayê ye. Raw, dayîka pênc kurika wû. Dayîka sê lawik (Hes, Os û Pişar) û du keçan (Zêw û Rehm) bû. Li wê seferberîyê, hersê lawikên Rawê kirin esker û şandin Çanakkalê. Rawê, hersê lawikên xwe yên mîna çavên xwe diparastî, li wê herbê qurban dayîbûn. Dudîya kunya wan hati bû. Yekî jî, tu deng jê biderneketibû. Mala Rawê, şewitî bû. Ar bi bedena wê û dilê wê keti bû. Ocaxê Rawê kwîr bûyî bû. Rawê, ew derd û kulên xwe, şewata dilê xwe bi kilama li jêr anîbû ziman.



Çanakkalê Çanakkalê
Şûna avê xûn dikelê

(Neqeret)

Dilê mino tin e tin e
Bûyê biroşa av li bin e
Mala Hecosmanê Bûklê de hatim mala xwe

Sê recalê min ê dora êr rûniştin e
Min go felek malê dinê li dinê bimîne
Va sê recale min besê min e
Min hay jê çi ye seferberî li piştta min e

Li bin darê, li bin darê
Qîrini ket Hesênê min mîna karê
Zêwê bi Rehmê ve bi qurban kim
Bi ser da hatîye fitla şarê

Ew sibe yê xwaş berbang e
Peyakî bi neqewa gundê Buldux ketîye bangebang e
Diwê xwedêkê ji min re bane Hes, Os û Pişarê xwe kin
Ma werin ber qiran vêketîyê bavê xwe yî sû bi çang e

Li Lêlûnê li Lêlûnê
Kewekê hêlûna xwe çêdikê li neqewa îne
Eza Zêw û Rehma xwe heynim herim Çanakkala şevitî
Ma bişon kincên wan egîtan ên jî xûnê

Vê çûçikê vîyevîye
Cendermekî peyakî Çanakkalê çex dikê nizanîm kî ye
Min go Mîro xwe pêgîne
Bê peyayî li keçîka xalê bi dergîstî ye.

Çavkanî: Serbilind Kanat

DAYIKA STRANA ÊMA HEMÊ - I

Hızır Akbina

Di sed sala 18an de eşîra celika jî wek eşîrên din li welat koçber in. Osmanî daxwaz dikin ji bo boçê û leşker berhevkerinê eşîra di bin bandora xwe kin û jê fêde bibînin. Lê reşî qebûl nakin û li hemberî osmanîya serihildidin. Li dawîya şer reşî talan û belav dibin. Ji çend sirgûn û zordarîya bicîh kirinê, celikî tên li Islahîyê, deşta Amîkê bi cîh dibin. Gunda ava dikin û bi cî û war dibin. Dema biharê jî kerîyên pêz dajon terin li zozanên Sewasê; Gürün û Kangalê cîh digirin. Em ê di nivisa xwe de behsa Êm a Hemê Simîreş (Îsmail) bikin. Kesên gundê Kırkpınarê-Celika avakirin bi piranî ji malbata Simîreş in.

Di dema koçberî û sirgûnkirina eşîrên kurdan de malbata Êmê siftê çûne Helebê, ji Helebê jî derbasî Kerkûkê bûne. Ji vir jî hatine Semsûr-Çelikhanê, derbasî Islahîye bûne. Demekê bi şûnda jî hatine Kırkpınar-Celika ava kirine. Bi cîh û war bûne. Ji ber koçberîyê, Êm bi pirziman bûye, erebî, kurdî (kurmancî, dimilî), tirkî hîn dibe.

Êm li Welatê Jêri di sala 1854an de li gundê kulxêşê (Kül-haşkarahöyük-Pazarcık) hatîye dinê. Dayika xwe Gul e, bavê xwe jî Hemê Simîreş e. Hemê Simîreş kurê Maho ye.

Êm bi zanetî û camêrîya xwe di nav êla celika de bi nav û deng e. Dengê xwe jî pir xweş e. Zilm û zordarîya koçberîyê, derd û kulên xwe bi kilama tîne ziman. Dibe şar e. Êm tenê ne şara bû, jina cimata bû, aqildan bû. Jineka li ser xwe, bi hêz bû. Di gunda da dema şer dibû Êm diçû sulhê, ew aşt dikirin.

Hemû însan bi teybetîyên xwe tenê xandin. Êm jî bi dengê xwe yî xweş, bi şaretîya xwe te nasîn. Ew şareka mezin bû. Li herdemê, li her rêzê kilamên xwe li hevtînan, bi dengê xwe yî xweş bi kelecaneke stran digotin. Êm ekolek bû. Pir şara ji kilamên Êmê hêz heytinan, ji mirîyên xwe re digotin. Hemû bilûrvana qaydê Êmê lêdixistin. Tenê li gundê me ne, li gundên cîran jî dema hinek dimirin herkes li benda Êmê dibûn.

Ên xortên xwe, merivê xwe yên bi qîmet dimirin dihatin Êm dibirin şîna xwe. Bi kilamên Êmê dihatin xwe, teseli dibûn. Li gundê şêxbizina-Dipdede Axayê xwe Xaşîm Beg dimire. Têna Êmê dibin şîna wî. Êm qesî zimanê xwe çexdibe ji wan re bi şêxbizinî kilamên şînê distirê.

Zewaca Êmê

Merê Êmê yê siftê ji Welate Jerî, ji Maraşê Hesê Îbiş e. Hes hatîyê Kuluyê kahvexana karker an. Li wir ji gundê Xelikan Hesên Efendî çûye Hes anîye, ji xwe re kiriye xizmetkar. Hesê xizmetê mêvanan dikirîye, çay û qehva wan bela dikirîye. Rojekê ji Kırkpınarê Milalî dibe mevanê Hesên Efendî. Bi xizmetên Hesê pir qayil bûye, pê re sohbet kirîye. Gotîye Hasan Efendi „ez vî xortî dixwazime, ma li cem min bixebite.“ Axê berê hevûdi nedişkênan, gotîye; „temam ezê bidime te. Bangî Hesê kirine, wî jî gotîye, „dibe ez ê herim.“ Bi Milalî va hatine Kırkpınarê. Du, sê selan bi şunda Milalî ji xizmatên vî pir memnûn bûye, gotîye, „Xorto, tu dixwazî xerê ezê xwanga xwe bidime te, li vir bi cîh û war bibe.“

Hesê gotîye „dibe, ez ê bizewicim.“ Êm li Hesê mar kirine. Ji Hesê Îbiş çar keçikên xwe bûne. Çend salan bişunda Hes ji kula xeraw dimire. Êm wê demê dest bi şaretîye dike.

Pezê me yî bernedane

Yî xwêdane av nedane

Jîkûk şivanê mala bavê min mirîye

Pez û berx man vêxûdane

Ji du salan bişunda malbata Hesê Îbiş bîstine ku Hes mirîye. Hatine şîna birayê xwe û gotine; „Em bûkê û sêwîyên xwe perin Mereşê.“ Milalî gotîye ez xwangê xwe nadim. Ezê keçikan gir bikim, her yekê bi axayekî gundim.“ Êm jî li ser kurikên xwe runiştîyê, neçûye Mereşê.

Çend sal derbas dibin. Om Axê eşîrê ye. Çar jinên xwe hene. Om ê Qere Millo (Ömer Doğan) tere ba dotmama xwe Êmê û jê re dibêje: „Êmê, were min bike, ji 50î salîyê bişunde ez ê lawikekî bidim hembêza te. Ez ê navê wî jî bikim Buldix. Mezin bû jî ez ê wî bikim mixtarê gund. Yê ji gund re 20 sala jî mixtarîyê bike.“ Êm bi pismamê xwe Omê re dizewice. Pênc salan bi şunda lawikekî wan dibe

û navê wî jî dikin Buldix. Buldix mezin dibe û ji gund re 20 sala jî mixtarîyê dike.

Êş pêşîya Êmê bernadin. Mêrê Êmê, Hesê Îbiş dema kerîyê pêz ji bo firotine dibin Sembûlê bi çend kesan re hingê dike û tê girtin. Li Sembûlê davêjin Hepsê. Demekê di hepsê de dimê. Di wan rojên tarî de keçika xwe ya mezin, Cûn

dimire. Cûn zewicî ye û dayîka du kurika ye. Cûn nexweş dibe. Malbat Cûnê nabin doxtir. Dibin gundê Hesarê Ocêx. Cûn li Hesarê dimire. Ew çavxelatîya xwe bû. Ji Cûna xwe pir hezdkir. Sê roj sê şevan Êmê bi êşa Cûnê xew nekir. Du kurik jê man. Êmê li ser Cûna xwe destan çerx kirîye û veng sira-ye:

*Here lê lê Cûn kibarê
Bi Husin e bi Gulizarê
Dîya Husînkî çûyê Hesarê
Rêda mirê wextak vegeêrê
Panzdeh salî ye ser bi barê
Serber hundir hatîye xarê*

*Yasa yasa Cûnik yasa
Dev didana Cûnê min ê spî girtine xûmal û pas e
Va heqsizna va dijminna
Cûna min ê bi emegî pir e
We çing cenezê Cûna min neanîn îçi
Li ser qêngiri, li ber malê lê girtin qeyas e*

*Li ala ganyê li ala ganyê
Têye dengê Hesara şewitî çing bangebangê
Ezraîlikî malşevitîyo
Dîya Husînkî heynayê li xewa barbangê*

*Vî qiranî kalekale
Berxa li mîya kir zewal e
Zênew kor bûye çarkê rabe derkeve derva
Bê dîya Husînkî li ber kêrê, ne yê li mal e*

*Li dê ra nawê m li der benda
An qurban e ge bazingê li zenda
An ê niha dolê Milhesen a lêkeve
Zênew korbîyê êz a ji te bixwezim*

Dîya Husînko çiçeka serê govendê

*Dîsa dîsa Cûnik dîsa
Ne kewên firîne ji meclîsa
An ê we bihîst ku çirbîye
Şîxikê bi xwe xebera Cûnê min ê belavkirîye li nav hepisa*

*Zêrê Cûnê min ê gir in
Şîxikê birin Sembûle bi deh gez berxik gî bi qulb kirin
Dolîk, Besik berçavan de hatino
Zêrê Cûnê min ên gir bi ber mala de bixwe kirin
Husîn hîro omdîk da anê xwe yoo
Got anê tu meraq meke
Êz ê zêrê xwe bi şun da ji dest wan bigirim*

*Şîxik ji Sembûlê sîyar be
Ma pêşîye te a gavîk der be
Tu nîfira li te nakim
Tu bi bavê heft lawîka bî
Ma tim stûyê te bi ser Husîn da xar be*

*Peyîzê Eşê Mehmed sandiqê bûkê xwe vekirin
Serê bûkê xwe hene kirin
Lê de korê kincê bûkê xwe lê kirin
Ser sanqîka Cûnê xwe re meze kirin
Serê Cûnê min ê xelîyayê
Lê korê zêrê xwe yî qetîyayê*

*Tirba Cûna min ê ji axê
Ê ser ranane telaşê megerxê
Zêwê Alê xaska neçûma min nedîya
Çing di omîza Cûnê min re girtin avêtin bin kendalî axê
An qurbanê an qurbanê*

Çavkanî:

- Xeloyê Buldix (Halil Doğan)
- Gizoyê Hûsê (Gülizar Çelîk li gundê Germîkê li mêr e)
- Meremê Kutê (Meryem Akbina)
- Muzaffer Özgür



Huner wek îfadeya siyasî li dîyasporayê

Prof. Haci Akman
Zanîngeha Bergen Norwêc

Pêşkêş

Sirgunî dîyardeyeke siyasî ye ku bi vî rengî kûrahîya hundirê mirovatîyê digire dest. Rewşa sirgûnê bandorê li hemû aliyên jîyanî yên jîyana penaberîyê dike, hîmên rastîya civakî ji bo kesên mexdûr xera dike û êrîşî hesta ewlekariya wan a herî bingehîn

dike. Ronek romantîk peyva sirgûnê vedişêre, û efsaneya ku jîyanek di navbera du çandan de bi rengêkî afirîner bandorê li çalakîya rewşenbîrî xurt dike. (Eastmond 1989/1997) Nêrînek weha bi xwezayî pîvanên navendî yên statûyê, wekî xemgînî, bêmalî û nebûna aîdiyetê ji holê radike.

Koçberî ji demên berê ve beşek ji dîroka mirovahiyê ye. Koçberîya cîhanî ji sala 1945an û vir ve û bi taybetî, ji salên 1980î û vir ve bi berfirehî û girîngîya xwe zêde bûye. Hêjmarên heyî yên Komîsyona Gerdûnî ya Koçberîya Navneteweyî (GCIM) texmîn dikin ku dora 200 mîlyon mirov hene ku salek zêdetir li derveyê welatên xwe derbas kirine.

Gotineke hevpar ji bo van kesan koçber in. Nîşan hene ku koçberî dê di vê hezarsalê de ji zêde bibe û dibe ku ew ê bibe yek ji faktorên herî girîng di guherîna gerdûnî de. Hin koçber bêyî ku aramî û parastinê bibînin ji welatek din koç dikin, hinên din jî li welatek nû bicîh dibin ku dibe ku ji bo jîyanek çêtir fersendan peyda bikin. Koçberî ne tenê bandorê li ser koçberan bixwe dike, lê herwiha bandorê li ser civakên mêvandar û wergir jî dike. Kêm kes hene ku îro xwedî ezmûna kesane ya koçberîyê ne. Gelek koçber rêwîtiyek wekî rêgezê yekalî dibînin, bêyî ku malek rastîn vegere. Rêwîtiya jiyane ji hêla bûyerên giran, xeternak ên jiyane ve hatî asteng kirin. Koçberan, di wateya mecazî de, rêya lêdanê terikandi-

ne û bêyî ti îşaretên rênîşanderî û rênîşandanê ketine rê. Li deverê otobanek din a nîşankirî heye, lê berî wê jî jîngeh tevlihev û kaotîk xuya dike. Sirgûnbûn an jî hebûna dîyasporayê di vê perspektîfê de tê dîtin. Ew li ser hewldana dîtina têgihîştina nû, armancên nû û wateya nû ye. (Akman 1994:11)

Koçber, di nav wan de yên ku ji ber sedemên siyasî direvin, taybetiyên dema me ne. Di teorîya postmodern û postkolonyal de, têgînên wekî perçebûn, biyanîbûn, nisbetbûna nirxê, pirsgrêkên nasnameyê û hilweşandin wekî beşek ji teşîsa hemdem têne bikar anîn. (Lewis & Mills 2003) Ev dîyarde ji bo danasîna rewşa koçberîyê jî dikarin bêtir bikaranîn. Koçber di wateyek de ji çarçoveyên berê veqetiyane û di pêvajoyek muzakereyê ya domdar de dijîn, digel rêzek dubendîyan ku tiştê ku em dikarin hinekî nezêde jê re bibêjin çarçoweya postmodern (Chambers 1994) derdixe holê û saz dike. Cîhan piçûktir û gihîştîtir bûye, lê di heman demê de tevlihevtir û bi hev ve girêdayî ye. Dîsa, koçber di vê pêşkeftinê de taybetmendiyek girîng e û nûnertiya her biyanî

dike ku ji nişka ve xwe di tiştê ku em nas dikin de dibîne. Koçber divê bi tevliheviyê re mijûl bibin, nenas serdest bibin û di perestgeha nû de stratejîyên navîgasyonê pêşve bibin. Koçber ne tenê ji bo koçberan bi xwe, ji bo jîngeha wan jî pirsgirêk in. Rûbirûbûna bi biyaniyan me neçar dike ku em zanibin ku êdî em ne navenda cîhanê ne, û ev tenê standardek e ku teorîyên rojavayî yên "yên din" pir caran meyl dikin ku îdîa bikin. Gerdûnîbûn bi desentralîzasyonê ku bandorê li hemû aliyan dike pêk tîne. Zêdebûna gerdûnîbûn û cihêrengîya etnîkî pîvanên nû dide dîyardeyên çandî yên di civakê de û jiyana bajaran dixê tengasiyê (Chambers 1994). Di encama zêdebûna gerdûnîbûn û seferberiyê de, Norwêcê hin çavkaniyên mirovî yên ku gerdûnîbûn bi xwe re tîne ji bi dest xist.

Di beşa yekem a vê gotarê de, ez hewl didim ku taybetiyên sirgûn û şert û mercên dîyasporayê û çawaniya mirovên li dîyasporayê carinan ji bo peydakirina "navêkî nû" têdikoşin nîşan bidim. Di beşa duyemîn de bal tê kişandin ser rewşenbîrên li dîyasporayê û bi taybetî hunermendên jin ên

dîyasporayê. Beşa sêyemîn vedikole ku huner û vegotina hunerî çawa dikare ji hêla siyasî ve hesas be. Di beşa dawîya gotarê de hevdîtinek bi wênesazê kurd ê sirgûnîrî Kwestan Jemal Bawan re ye, ku piştî deh salan li welatê xwe penaber bû, hat Norwêcê. Hunermendên dîyasporayê bi hunera Norwêcî îfadeyê nezelal didin û bi wê re jî guherto, nuwaze û dinyayeke ku îfadeyê pirçandî û gerdûnî ya dewlemend dide.

Dîyaspora û sirgûn

Têgîna dîyaspora bi eslê xwe ji derketina gelê cihû tê û piştî dagirkirina Babil û Roma ya Filistinê li çaraliyê cîhanê belav bûye. Îro ev têgeh ji bo herêmên ku gelek kesên ji heman welat an herêmê lê bi cih bûne û derfetên jiyane yên nû peyda kirine tê bikaranîn (Safran 1999). Mirovên li dîyasporayê ji bo koçberî û bicihbûna xwe gelek sedemên wan hene. Lêgerîna sirgûna siyasî yek ji wan e. Peyva sirgûnê li vir ji bo kesên li dîyasporayê yên ku ji welatê xwe an jî cihê ku berê lê dijîn reviyane ji bo ku li cihêkî din bigerin û parastinê bikin tê bikaranîn. Dîyaspora û hîn bêhtir têgîna sirgûnê bi azadî û îfadeya

hunerî re têkildar e. Lê belê, encax eger statû û nasnameya wî ya berê li dîyasporayê were pejirandin, bi vî awayî dikare were jiyîn (Akman 1994). Ji bo ku hunermend azad-bûna derbirînê biceribînin, divê îmkana wan hebe ku "deng"ên xwe yên hunerî bi hunerê bilind bikin, çî bi wêjeyê, hem bi wêneyan, hem bi muzîkê û hem jî bi hunera dramatîk "biaxivin". Wekî din, jiyana dîyasporayê ne wekî azadîxwaz û ne jî îlhamek, lê berevajî wê jî wekî kekek teng tê ceribandin. Gelek hunermendên jin ên li sirgûnê çarenûsa jinên din ên ku bi dilxwazî an jî bê îrade neçar bûne ku welatê xwe terk bikin parve dikin. Di bin rejîmên totalîter de jiyaye, ketiye zindanan û îşkence li wan hatiye kirin. Çend mînakên hunermendên jin hene ku ji ber derbirînên xwe yên hunerî yên dijber hatine kuştin û bêyî ku ev yek bê zanîn hatine kuştin.

Sedemên çewisandin, sirgûn an jî revîn di dîrokê de zêde ne guheriye, lê gel, civak û rewş her tim diguhere. Jiyîna sirgûnê gelek caran li dijî sîstemeke siyasî bi awayekî wisa ye ku hikûmet bi cûrbecûr cezayan bertek nîşan dide. Weke ku hat gotin, çe-

wisandina siyasî bi gelemperî encama çalakîyên hunermend e, dibe ku neçar bimîne ku sirgûnê wekî çareseriyek hilbijêrin. Jiyana dîyasporayê bi vî rengî dikare wekî "cezakirinek" xuya bike ku hem li ser kesan hem jî koman bandor dike. Li gorî Akman (1994), sirgûniya li dîyasporayê, îfadeya windakirina mafên bingehîn ên li welatê xwe, windakirina malbat û hevalên xwe, kar, îfadeyên çandî û ziman e.

Li dîyasporayê, sirgûn di çarçoveyek zimanî ya nû de tê cîbicîkirin ku zimanê wan bi gelemperî wekî amûrek ragihandinê an ji bo rûbirûbûna derdorên nû bêkêr xuya dike. Afîrandina ji çarçoveyên naskirî dikare hestek biyanîbûnê bihêle ku ne tişteki ku meriv hildibijêre, bi demê re pêş dikeve an ji hêla kesên din ve tê ferz kirin û pir caran dibe sedema piçûkxistina giran ji ber ku serpêhatî, fikir û hêviyên sirgûnê wekî berê ne xwedî wateyekê ne an jî zehmet e ku veguherîna çarçoveya nû. Ji ber heman sedemê, jiyana li dîyasporayê pir bi nakokî xuya dike. Ji bo gelek, ew lêgerîna aîdiyetê ye, ji bilî kar û cîhek

jiyînê. Di vê çarçovê de, lêgerîn li cîhek e ku meriv tê de tê naskirin ku kî ye. (Eastmond 1989/1997)

Dîtina navêkî

Girêdana bi welat an cihê eslê xwe, bi malbat û hevalên xwe û gel an koma etnîkî re bi gelemperî ji jiyana li dîyasporayê rasttir tê dîtin. Lê belê, ji bo gelek, salên sirgûnê bûne sedem ku ev rastiya berê hêdî hêdî biguhere. Êdî ti tişt ne rast e, ne tiştê ku wan li dû xwe hiştiye û ne jî ya ku hatine. Zanînek weha dikare giran be û di rewşa herî xirab de dikare bibe sedema hestek xerîbbûnê hêdî hêdî. Tê bîra min ku carekê helbestek nivîskarê Pragê Rainer Maria Rilke (1875-1926) xwendibû ku tê de serpêhatiya ku dema çûbû bajarekî nû û xerîb vedibêje. Di pencereya xwe de li bajêr dinêrî, bi hesta wêranbûn û xerîbiyê pê ketibû. Bajar bêderfet dixuya - wî li derve girt.

Dûrketin, wek ku Rilke pênase dike, belkî tišta ku gelek jinên sirgûnkirî yên li dîyasporayê hem di asta kesayetî û hem jî di asta sazûmanî de dijîn dîyar dike. Hinekan hewl dane ku hesta xerîbî û bêkesbûnê kêmbikin, bi bûna

mîna "yên din". Ji aliyek ve, adaptasyona bi yên din re erênî û çêker e, lê ji hêla din ve, ew dikare bibe sedema windakirina tiştê ku di paşeroja xwe de watedar xuya dike. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku sirgûn gelek tecrubeyên hebûnê dihewîne ku dikare bibe sedema guhertina nasnameya kesayetî û etnîkî.

Diperspektîfaegzistensyalîzmê de, mirov dema ku hemî xalên referansê û "navê xwe" winda dike, bi pirsîyara nasnameyê re rû bi rû dimîne, bi gotineke din dema ku haya wî ji nenasbûna xwe dibe (Sløk 1966:65). Lê bi nasakirina vê şertê, nasnameyê nû dikare derkeve holê - bi vî awayî biyanîbûnê. Ji bo ku mirov bibe xwedî nasname divê bi navê xwe, bi xalên xwe yên referansê nasnameya xwe ava bike û di nava şert û mercên jiyane yên diguhere de karibe vê yekê biparêze. Bi navê xwe û dîtina xwe, hûn nîşan didin ku hûn bi mirovên din re, bi dîrokê re, bi cîhana tiştan û rewşên cûda re têkildar in. Bi gotineke din, di rastiya têkilîyan de mirov weke ya xwe diceribîne. Lê di sirgûnê de dibe ku têkiliyên bi vî rengî têk diçin û êdî mirov

bi van t kiliyan nay  naskirin. Ji ber v  yek  xal n referans  y n nasnamey  di rew ke kr z  ya ku sirg n temsil dike de t r  nake.  ro, t g na sirg n  k m t  bikaran n   pir caran wek  p vanek t geh n wek  ko ber    d yaspورا t  d tin, ku di heman dem  de h man n siyas  j  hene.

Rew enb r n jin  n li d yasporay 

Rew enb r n li d yasporay  bi gelemper  bi poz syona ku li welat  xwe   dibe ku di nav koma xwe ya etnik  de cih digirin, t ne nas kirin. «Rew » t  wateya kar   poz syona qan n  an civak  ya kesek li hember kes n din. Di qada siyas  de, t g na «stat » wek  minak, stat ya penaxwaz, stat ya ko ber, stat ya penaberya siyas  xuya dike. Kes n ku rew enb r t ne hesabandin, gelek caran li welat  xwe b ne xwediy  stat yek taybet , ku ew dixwazin li d yasporay  berdewam bikin (Knudsen 1990).

Weke pir caran kes n pir xwenda, ew wek  xwendevan an werg r n  and  y n civaka n  t ne p nase kirin. Ji bo bidestxistina poz syoneke wiha, div  kes  eleqedar xwediy  xal n referans 

y n rabird y  be, xwediy  aqil be   bi zan na gi t  ya civaka d yasporay  ba  were zan n. Ev kes gelek caran ji bo ravekirin,  rovekirin   wergerandina zan n   agahiy n ji kes n din re di nav gel  xwe an koma etnik  ya civaka d yasporay  de t ne xwestin. Asta p baweriy  bi away  t kiliya mirov bi endam n d yasporay  ve gir day  ye. Ne bes e ku mirov di wateya "h nb y " de an j  xwediy  statuyek  were d tin, ji bil  v , kes n eleqedar div  xwed   iyana ba  dan stendin  bin    ret n ba  bidin ku ji h la kes n din ve wek  k rhat  t  d tin (Akman 1994).

Rew enb r n jin  n d yasporay  ji kes n xwed   avkaniy n dewlemend p k t n, l  ji aliy  tecrubey n civak    pi ey  ve ji hev cuda ne.  end ji wan li dij  desthilatdar n welat  xwe derketine   reviyane. Li d yasporay  div  bi aliy n n  y n jiyana civak    zayend  re mij l bibin, bawer , bendewar    ner n n li ser jin  i ye   rew enb r  i ye   her weha rew , rol   berpirsiyariy n jinan di civaka ku hatine de ji n  ve binirx nin. Ma ew dikare li nirx   norm n xwe y n ber  bigire? Rol

û ferasete wê ya jinê wê biguhere? Rola zayendî tenê beşek ji çandê ye; rola wê jî wek kurd, ermen, cihû an suryanî heye. Gelek jinên li dîyasporayê tecrube dikin ku xebatên siyasî yên jinan tenê ji bo piştgirîkirina çalakiya siyasî ya mêran tê dîtin. Di heman demê de, mirov dibîne ku jinên li dîyasporayê dê pirsgirêkên xwe yên siyasî kifş bikin ku ji bo wan têbikoşin, ku bi awayên cûrbecûrên çandî yên wekî dîlan, stran, muzîk, wêje an jî celebên hunerî têne îfade kirin. Jîyana herî kêma di du çandan de, lê ne bi tevahî di yek ji wan de, dikare wekî stres, lê di heman demê de dewlemendker jî were ceribandin. Jinên li dîyasporayê beşdarî çend çandan dibin û bi vê beşdarbûnê di pêvajoyeke berdewam de ku çand li ber xwe dide û civak diguhere, pir caran formên nû yên çandî têne afirandin.

Rastiya ku Norwêc hunermendên etnîkî yên jêhatî di nav dezgehên hunerî û torên hunermendên xwe de dihewîne, hunera Norwêcê dewlemend dike, lê ew di heman demê de îşaretek girîng ji komên etnîkî yên li Norwêcê bi giştî re dişîne. Naskirina Nor-

wêcî ne tenê ji bo hunermendê etnîkî, lê di heman demê de ji bo ku ev kes çî ye û ji hêla siyasî ve tê çî wateyê jî tê wateya. Komên etnîkî yên li dîyasporayê hewcedarî xalên referansê yên sembolîk û nîşaneyên dilsoziyê û hunermendên sirgûnî ne û hunera wan dikare hin ji van temsîl bike.

Huner weke îfadeya siyasî

Di Encyclo Online de, hunera siyasî wiha tê pênasekirin: "(...), xebata ku mijarên siyasî dihewîne, di mijarekê de pozîsyonekê digire, xema giştî radigihîne, an jî hestiyariya temaşevanan radike. Cheryl Toman (2009) amaje dike ku formên hunerî dikarin ji projeyên hunerî yên pir entelektuelkirî bigire heya tevgerên gel.

Hişmendîyek vekirî dikare vê cihêrengiya vegotinên hunerî biceribîne û têkildariyê bibîne. "Huner" dikare bi wateya berfireh a têgînê were pênase kirin; hemû hunerên dîtbarî, edebî û şanogerî û têkeliyên wan dihewîne. Ew wekî din îdia dike ku mentiqî ye ku huner wekî katalîzatorek ji bo guhertin û reforman kar bike (Toman 2009:2), ku tê wê wateyê ku huner mijarek pir siyasî ye.

“Huner di dirêjahiya dîrokê de xizmeta armancên siyasî kiriye û mijar û pirsên siyasî kiriye. Bûyerên ku di nîvê pêşîn ê sed sala bîstan de hatin jiyîn, gelek hunermend neçar kirin ku bi axivin û hunera xwe ji bo daxuyaniyên siyasî bi kar bînin.” ku helwestên felsefî û siyasî hebûn, pir caran li ser hawîrdora siyasî, bûyer an sistêmên siyasî bûn.

Esera hunerî çîrokek jiyanek an komek jiyanê vedibêje. Bêdadîya civakî, xerîbî, bêbextî, ji nû ve bicihbûn û kontrolkirina desthilatdariyê bandor kir û beşdar bû. di hunerê de ku daxuyaniyên siyasî li pişt wateyê vedihewîne. Toman (2009) di edîtorîya xwe ya bi navê ”Jin, aktîvîzm û huner” de dîyar dike ku jin û afirînerî her tim di lêkolînên jinan de bûye mijara balkêşiyê. Ew balê dikişîne ser jinên li dîyaspora ereb û awayê ku ew xuya dike ku afirîneriya xwe bi awayek erênî rêve dike da ku bi hunera xwe amûran pêş bixe ji bo (...) ”hişmendî û navgînek ji bo beşdarbûna çalak di dîrokê de - rabirdû, niha û paşerojê - ya civak û welatên xwe û hem jî ji bo cîhanê bi giştî.» Ew her weha îdia

dike ku huner yek ji kêr hêzên yekbûnê ye ji bo çalakiyê wiha ji ber ku ew îmkânê dide hemû jinan ku bi potansiyelî navgînek ragihandinê ya hevpar bibînin bêyî çîna civakî, paşxaneya etnîkî an olî, an asta perwerdehiya fermî (2009:2).

Toman herwiha karê wênekêşa Lubnanî Rania Matar û rêze wêneyên wê, ”Gelên Jibîrkirî” nîşan dide, ku tê de ew penaberên li kampa Şatîla ya Felestînî li Libnanê nîşan dide. Wêneyên bihêz ên Matar çîrokek ku ji bo hemî penaberan hevpar e vedibêjin. Bi ruh û berxwedana gel ji kûr ve bû. Toman îdia dike ku armanca çalakîya Matar hişyarkirina rewşên wiha ye. Matar bi hunera xwe xîtabî hemwelatîyên cîhanê dike û daxwaza wan ji bo rastkirina neheqîyê dike” (2009:2). Hunera hunermendên jin ên aktîvîst an hunermendên muxalîf ên siyasî yên li dîyasporayê dijîn, bi gelemperî li derveyî çarçoweya dîyasporayê têne rêve kirin, ji ber ku mebest ew e ku jiyana jinan bê ferqê civakî, çandî, aborî an perwerdehiyê baştir bike. Di warê koçberîya bi darê zorê de, Marita

Eastmond (2007:249) tekez dike ku vebêj kêman çaran tenê wateya ku lêkolîner divê li ser jiyane di dem û cihên ku kêman gihîştina me ya din de heye zanibin. Çîrok dikarin ji me re vebêjin ka mirov bi xwe, wekî "mijarên bi tecrûbe" çawa bi şidet û guhertinên turbulan dihesibînin. Eastmond behsa Edward M. Bruner (1986) dike dema ku ew dibêje ku divê em jiyana ku tê jiyîn, herikîna bûyerên ku jiyana mirov dihesibînin ji hev cuda bikin; jiyana bi tecrûbe, li ser bingeha tecrûbeyên berê û repertûarên çandî, mirov çî diqewime çawa dihesibîne û wateyekê lê zêde dike; û jiyana wekî ku tê gotin, çawa ezmûn di çarçoveyek taybetî û ji temaşevanek taybetî re tê çarçovekirin û vegotin (Eastmond 2007:249). Di hunera dîtbarî de ev hemû vegotinên cuda tînan aktuelkirin. Wêneyek dikare wekî çîrokek - çîrokek - ku tê de dengê hunermend tê bihîstin were hesibandin. Di hunera siyasî de ev deng hewl dide çîrokekê vebêje an jî beyanekê bide. "Vegotara dîtbarî" di tabloyê de bi hev ve girêdayî ye û hem di jiyana hunermend,

serpêhatiyên hunermend û hem jî di peyama ku di tabloyê de tê vegotin de cih digire. Wênesazê Bolîvyayî yê sirgûnî Eduardo Ibanez, ku di dirêjahîya karîyera xwe de timî xwe bi qatên civakî yê jêr ve nas kiriye, carinan bi nivîsandina helbestekê li ser tûma ku wê tabloyê li ser biafirîne, dest bi karê xwe dike. Bi vî awayî vegotina helbestî û wêneyê dîtbar dibin yek. Hunermend di tabloya xwe de jiyana xwe ya jiyîn, serpêhatiyên ku bi vî jiyane pêk tîne û vegotina hunerî ya ku mirov dikare weke çîrokeke ku divê were vegotin, dihewîne.

Hunermendeka kurd li dîyasporayê

Çend sal berê min derfet dît ku ez bi hunermenda sirgûnkirî Kwestan Jemal Bawan re li ser hunera wê û peyama siyasî ya ku wê bi tabloyên xwe vebêje, bibînim û biaxivim. Li jêr, ez sohbeta li ser paşxaneya tablo û wêneyên wê rave dikim. Kwestan Jemal Bawan di dawîya salên 1960î de li başurê Kurdistanê li Silêmaniye hatiye dinê. Ew neh sal berê piştî dagirkirina Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê di 2003 de

hat Norwêcê. Di dema Şerê Kendavê de, ew tevî mêrê xwe û zaroka xwe ya nûbûyî, tevî bi hezaran penaberên kurd ên ku ji bin çewisandina siyasî di bin rejîma Baasê ya hov de reviyân, derbasî çiyayan bûn û bi cih bûn. Cihê ewlekarî ji aliyê YN ve li nêzikî sînorê Tirkiyê hatiye dayîn. Wê li Koleja Hunerî ya Silêmaniyê xwendîye û berhemên wê li welatê xwe û her weha li Kanada, Almanya, Japonya û piştî li Norwêcê hatine pêşandan. Paşê jî li Norwêcê mastera hunerê wergirt. Kwestan Jemal Bawan dibêje: "Tiştê ku min dikişîne dema ku ez li dîyasporayê me, ew e ku ez bi tabloyên xwe li dijî zilmê biaxivim." Kwestan Jemal Bawan weke jin û hunermendeke Kurd ku di bin rejîma Seddam Husên de dijî, hovîtiya jiyânê, zordestiya li ser jinan û çewisandina hunermendên ku bi karên xwe yê hunerî peyamên siyasî radigihînin, dît. Ew rexnegira rejîmê bû, lê paşê dengê xwe yê rastî yê muxalefetê li dîyasporayê dît. Serpêhatiyên berê yê Kwestan Jemal Bawan xêza sereke ya tabloyên wê pêk tîne ji ber ku hunera wê


ya berê û niha, hêvî û bêhêvîtiyê hevseng dike. Yek ji tabloya wê ya bi navê "Çîroka Kevir" dîroka wê nîşan dide û sembola revîna gelê kurd a ber bi çiyayên Kurdistanê ye. Pî di avabûnek abstrakt de ne ku tevgera li ser keviran nîşan dide. Hunermend di vê rêwîtiya hovane de dît ku mirov ji birçîbûn û nexweşiyê ketine û bi sedan kes di rê de mirine. Wê dît ku mêr û bav zarokên xwe yê nexweş an mirî hilgirtine. Ji ber ku bi xwe dayik bû, bala wê kişand ser jinan - dayikên bêhêvî di rewşeke bêhêvî û bêhêvî de hewl didin zarokên xwe xwedî bikin û bixwin. Kwestan Jemal Bawan di pirtûkekê de ku berî pêşangeheke wê li Norwêcê hat weşandin, dîyar dike ku ew çiqasî îlhama xwe distîne dema ku ew li çîrokên jinên din guhdarî dike, çî mijar Kurdistan be, çî Norwêc be yan cîhek din be.

- Ez îlhama xwe ji rewşa jinên cîhanê digirim. Bi dîtina êş û azarên li derdora xwe ez dixwazim bi dengê piştgirî bidim van hemû jinan û ev deng di rengê resimê de tê. Ji ber vê yekê ez boyax dikim.

Di hunera Kwestan Jemal Bawan de gelek deng hene: Dengê wê wek jin, dengê hemû jinên êşdar û dengê gelê xwe. Lê hunera wê di heman demê de pirsgirêka giştî ya zordestî, qirkirin û bêdengkirina dangan di bin rejîmên zordar de - ji hêla mirovên li gelek deverên cîhanê ve tê jiyîn, îfade dike. Hunera wê ne tenê ya wê ye, dibêje; aîdî gelê wê û bi taybetî jinan e. Berhemên li jêr serpehatiyên Kwestan Jemal Bawan wek penaber, jin, sirgûn, kurd, endamekî dîyasporaya kurdî radixe ber çavan.

Bê pêlav dimeşin

Şerê Kendavê yê sala 1991ê bû sedema koçberbûna ji Kurdistanê Başûr. Di demar revînê de bi hezaran penaber di şert û mercên herî xerab ên nexweşî, birçîbûn an sermayê de mirin. Van serpehatiyên, tirs û dîtînen wê yên ji derdê hevalên xwe yên penaber, bandorek kûr û mayînde li hunermendê çêkir, lê di heman demê de bûn îlhama berhemên hunerî yên pêşerojê. Di dema pêvajoya hunerî de, hişê wê li revînê vedigere. Ji bo Kwestan Jemal Bawan, gotin pir sînordar





bûn ku birçîbûn, belengazî û mirinê ragihînin. Yek ji wan tiştên ku herî zêde bandor li ser wê wek kes û hunermendek çêkir, gelek penaberên ku di rê de pêlavên xwe winda kirin bû. Di nav berf, serma û qirêjîya çiyayên bilind de ku rêyên wan di nav zozan û newalên kûr de derbas dibûn, hema nedihate fikirîn ku mirov, jin, mêr, zarok, kal û pîr bêyî pêlavên parastinê bidomînin. Ravekirina hunermend ew bû ku tirsê mirov li ser çiyayan hê bêtir ajot. Di meşa dirêj de êş, kul, kîn, di heman demê de hevaltî û hev-girtin bûn rêhevalên dilsoz. Wê dît ku dêûbav ku li serbestberda-

na hestyarî digerin, dê bi zarokan re wekî temaşevanên terorîst bigirîn û êşa xwe biqîrin.

“Çîroka kevîr”

Kwestan Jemal Bawan piştî biryara revînê da zanîn ku tekane rêya azadîyê çiyayên Kurdistanê ye. Gotinek kurdî dibêje “Ji çîya pê ve dostê kurdan tune”. Çiyayên Kurdistanê dikare bê mêhvan û xeternak bin. Lê ew jî parastinê dîkin. Hunermend çiyayan wek însiyatîfa lênêrîne dibîne, gelê xwe hambêz dike, dilovan û evîndar e. Dîroka kurdan di şikeftên çiyayan de hatiye nivîsandin ku ji mêj ve mirov lê dige-



riyan. Bav û kalên wan dîroka re-
va xwe li ser dîwarên şikeftê
nivîsandine – wek dilê hemû
kurdan. Çîrokên ku di nav kevi-
ran de hatine xêzkirin, dixuye ku
her û her li vir mane û bi gotina

”Ez gelek beriya te li vir bûm”
nêzî te dibin. Peyama keviran
tîne bîra me ku dîrok xwe dubare
dike. Li dîyasporayê hêzên bi
demê re tînin bibîranîn. Dîroka
keviran û xwezaya Kurdistanê il-

hamê dide Kwestan Jemal Bawan ku hunereke mezin biafirîne. Ji bo wê kevir metaforek e, îmajeke derûnî ye û di vegotina hunermend de temayek dûbare ye. Kevir gerdûnî ye, li her derê tê dîtin. Têkiliya hemû çandan bi kevir re heye. Dema ku mirov neçar dibin ku birevin, kevir wekî şahidîyek bêdeng dimîne ku çi bûye.

Kwestan Jemal Bawan, piştî şeş salên sirgûnê, dawî li welatê xwe yê ezîz, Kurdistanê anî. Di salên xwe yên sirgûniyê de, xewna wê ew bû ku serdana şikeftên ku ew û bi hezaran mirovên pê re lê digeriyan. Wê kameraya xwe bir çiyayan û bi lingên bêdawî riya azadîyê meşîya. Kevir û kevir hê jî li wir bûn mîna ku dem rawestiyabe. Kevir dîrokê temsîl dikin, wê îdîa dike, tevî çîroka reva wênesazekî ciwan.

Kevir û êşa siyasî

”Çîroka kevir” wêneyek e ku nîşan dide ku em dikarin dîroka xwe bi keviran bixwînin ku dibe şahidê bûyerên ku qewimîne. Motîf balê dikişîne ser şert û mercên civakî û siyasî, lê gava hûn ji nêz ve lê mêze bikin hûn ê şîroveyan (bi xêz, reng û şekil)

bibînin ku di keviran de hatine xêzkirin, an jî bi mîhengê hindî hatine nivîsandin. Di zinaran û di hundirê şikeftên çîya de hûn dikarin yekem dengê çandî di dîroka mirovahîyê de bibînin. Di dirêjahîya dîrokê de kurdan kevir ji bo parastina heywan û debara jiyanê û parastina wan ji xetereyên derve bi kar anîye. Hertişt dikare biguhere, lê tenê kevir dikarin li dijî dijmin û carinan mirinê biparêzin. Weke hunermendeka kurd, ez rastî sistemeke dîktatorî û dijminan hatim ku hewl dane dîrok, çand û zimanê min tune bikin û ji holê rakin. Her carê zinar, şikeft û zinar bûne parêzvanên me. Tenê kevir dikarin çîroka gelê min vebêjin. Kwestan Jemal Bawan tekez dike ku divê cudabûnek di navbera wê de weke hunermend û zanyarekî siyasî yan dîroknas hebe ku pîşeya wê nivîsandina dîroka gel yan sistema siyasî ya civakê ye. Min şêwazeke ragihandinê ya estetîk hîlbijartiyê û xwe bi firçe û rengan li ser kavilê îfade dikim. Huner ji peyva nivîsandî bi rengekî cuda dest dide mirovan. Hemû hest têne bikaranîn. Peyama min bi rastî hêsan û gerdûnî ye, lê di

heman demê de siyasî ye. Tabloyên min behsa pîrsgirêkên siyasî yên welatê min û êşên dîrokî yên gelê min dikin, lê di heman demê de berhemên serbilind ên têkoşîn û hêza gel in. Dîsa em dibînin ku tabloyek çawa dikare wekî vegotinek dîtbar a ku pêdivîyê hunermend vebêje tevbigere.

Huner weke têkoşîna çandî

Li ser hêza reş û tevgerên azadîya jinê yên salên 1960-1970 (û pê ve) li Dewletên Yekbûyî, Lisa Gail Collins (2006:718) amaje dike ku beşdarên dilxwaz û hunermendên çalakvan di her du tekoşînan de cihanek ku ew ê tê de pêş bikevin xeyal dikirin. ewle bin, û xwe girêdayî, rastîn û tevahî hîs bikin. Beşdarên aktîvîst ji bo ku vê dinyayê bi veguherîna nîzama civakî ya serdest ve nas bikin, pir xebitîn.

Wekî ku zanyar û organîzatorê bingehîn Maulana Ron Karenga (1967:6) carekê got: "Em girîngîyê didin çandê ji ber ku ew nasname, armanc û rêwerzan peyda dike. Ew ji we re dibêje ku hûn kê ne, divê hûn çi bikin û hûn çawa dikarin bikin." Wî wekî din

argû kir ku şoreşek çandî ya reş ji bo tekoşîna şoreşgerîya ji bo hêza reş girîng bû (di Collins 2006:724 de hatî destnîşan kirin).

Ji bo Kwestan Jemal Bawan, huner ew e ku Collins femînîzma çandî bi nav dike ku îdeolojiyên ku avakirina afirîner a çandên alternatîfan dijber ji bo berxwedan an berxwedanê bi hunerê digirin dest.

Beşdarek girîng a tevgera hunera femînîst li Dewletên Yekbûyî, Lucy Lippard (1995:10) huner û siyaseta bi hev ve girêdayî dît. Wê bawer kir ku wan herduyan jî "hêza xeyalkirin, tevgerîn û guheztinê" heye (di Collins 2006:7329 de hatî destnîşan kirin). Ev yek ji bo hunermendên berxwedêr ên li cihên din ên ku di bin şert û mercên zordestiya siyasî de dijîn û divê bîst guhertin jî derbasdar e.

Hunermendên kurd bi dehsalan di bin rejîmên zordar de dijîn, lê her çendî ku rewşa Kurdistanê (Iraq) bi awayekî erênî guherîbe jî, divê dengên opozîsyonê hîna hişyar bin. Têkoşîna ji bo azadîya siyasî, azadîya axaftinê û azadîya ramana hunerî ya rexneyî pêvajoyek e ku divê her çiqas bi

awayên cuda jî zindî bê girtin û berdewam bike.

Xelasî

Ev gotar li ser dîyardeyêke tîpîk di dema me de disekine; koçberên ku ji ber sedemên cuda welatê xwe terk dikin.

Dema ku gelek koçberên ji heman netewe, welat an jî komek etnîkî li cihekî nû bi cih dibin, civakek dîyasporayê ava dikin. Yekemîn dîyasporaya ku tê zanîn derketin û belavbûna cihûyan a li seranserê cîhanê ye piştî fethên Babilonî û Romayî yên Filistinê ye. Ji wê demê û vir de, civatên dîyaspora li seranserê cîhanê û ji wan dîyasporayên kurdan li welatên cuda yên Ewropayê, li Amerîka, Kanada û Awustralya hatine damezrandin.

Kesên li dîyasporayê ji bo koçberî û bicihbûna xwe sedemên cuda hene. Lêgerîna sirgûna siyasî yek ji wan e. Di vê gotarê de, têgîna sirgûnê ji bo mirovên ku ji welatê xwe an cîhê xwe revîyane ji bo ku li cîhek din bigerin û parastinê bikin tê bikar anîn. Gotar li ser berhemên hunerî yên wekî îfadeya siyasî û bi taybetî jî li ser hunermendên jin ên sirgûnî radiweste.

Sedemên çewsandin, sirgûn an revînê di dîrokê de zêde ne-guheriyê, lê gel, civak û çarçove herdem diguherin. Jina sirgûnî gelek caran li dijî sîstemeke siyasî bi awayekî wisa ku hikûmet bi mueyîdeyan bertek nîşan dide. Weke ku hat behs kirin, çewisandina siyasî bi gelemperî encama çalakiya hunermend e, ku dibe ku neçar bimîne ku sirgûnê wekî çareseriyek hilbijêrin.

Huner dikare bi gelek awayan bibe katalîzatorek ji bo guhertin û reforman û bi zelalî potansiye-la xwe ya siyasî ya bilind nîşan bide. Berhema hunerî di jiyana mirovekî, neteweyekê yan jî komeke etnîkî de çîrokekê vedibêje. Hunermend bi rêya peyama xwe ya siyasî gelek caran ji bo doz, kom an jî gel helwest nîşan dide û di heman demê de li dijî sîstem û rejîma zordar derdikeve. Bi vî awayî berhema hunerî dibe vegotinek – çîrokeke ku tê gotin ku dengê hunermend tê de tê bihîstin. Di tabloyekê de jî mîna wênesaza kurd Kwestan Jemal Bawan, “vebêja dîtbarî” di tabloyên wê de hatiye xêzkirin û di jiyana hunermend, serpêhatiyên hunermend û peyama ku bi rêya

tabloyê hatiye gihandin, vedi- hişmendîya mijarên siyasî yê
gere. Hunermendên jin ên li li welatên xwe de rolek girîng
dîyasporayê dikarin bi baldari- bilîzin. Li gorî Lippard (1995),
yeke taybet li ser aliyên zayendî hunera jinê xwedî hêza xeyalki-
û rewşa jinan di bilindkirina rin, tevger û guhertinê ye.

Çavkanî

- Akman, H. 1994. *Landflyktighet*. Bergen: Forlaget Migrasjonslitteratur.
- Chambers, I. 1994. *Migrancy, culture, identity*. London & New York: Routledge.
- Collins, L.G. (2006). Activists Who Yearn for Art That Transforms: Parallels in the Black Arts and Feminist Art Movements in the United States. Vol. 31, No. 3, *New Feminist Theories of Visual Culture* (Spring 2006):717-752. Retrieved 20. August, 2012 from <http://www.jstor.org/stable/10.1086/498991>.
- Eastmond, M. 1989/1997. *The Dilemmas of Exile: Chilean refugees in the U.S.A.* Göteborg: Acta Gotoburgensis.
- Eastmond, M. 2007. Stories as Lived Experience: Narratives in Forced Migration Research. *Journal of Refugee Studies* Vol. 20, No. 2:248-264.
- Fremsin, J. 1992. Eksil – filosofiens öde. *Invandrare och Minoriteter*, 5-6.
- Lewis, R. and Mills, S. 2003. Introduction, in Lewis, R. and Mills, S. (eds), *Feminist Postcolonial Theory: A Reader*. New York: Routledge, pp. 1-24.
- Safran, W. 1991. Diasporas in modern societies: Myths of homeland and return. *Diaspora*, 1(1): 83–99.
- Sløk, J. 1966. *Eksistensialisme – en innføring*. Oslo: Gyldendal.
- Taylor, C. 1994. *Multiculturalism*. New Jersey: Princeton University Press.
- Toman, C. 2009. Editorial. Women, Activism and the Arts. *al-raida*, Issue 124:2-6.

Tiştinên reş, bêbawer û qirêj

Mistoyê Heco

Û
Niha, ez xwe di nava vê neçarîyê de dibînim. Neçarîyeke ewqas mezin e ku pê difetisim. Lê ev jî sûcê min e. Min jiyana xwe bi peleke ji çiqilê xwe qetiyayî û ketî ve girêda. Min ê ji ku bizaniya ku ba wê ewqasî hov li ber min bisekine? Dinya mîna çiyayekî ji min dûr e, çî bibe jî pê nagihîjim, dûr e û herî zêde jî ev dûrbûn min diwestîne.

Ahh ba!

Çi dibû te ez bigihandima herdê?.. (ji xeyrî hestên ku dixwazin ji canê min biherikin û bikevin dîtir tişteki min tune. Ewqas sivik im.) Çi dibû?.. Hestên min hemî bayî ne, li ber bayê ne. Hemî gotinên min nazik û bêserûber in. Em çiqas dişibin hev... ez çiqas dişibim wan. Peyvên ku li hewa dimînin... lingên min ên ku li herdê nagirin...

...

Di xewna xwe de, em bi hev re diçûn sînemayê. Li ser perdê; çol, tarî û heyv... Çol jixwe di xew de bû. Tariyê ta dixist dilê min, heyv xerîbê vê sehneyê bû (wekî te). Jixwe heyv di xewa çolê de, ji xeynî xerîbeke dîtir çî ye?

Hinava min diricife. Şeqaşeqa çena min e. Ya ku xofê li dilê min dixwe heyv e?

Nizanim!

Me bi hev re dikarî xwedî li heyvê derketana û ew tarî ron bikira. Min dikarî ji te re her roj name binivîsanda, nameyên mişt hesret, mişt tu, nameyên ku bi peyvên li ber bayê ketî ve hatî hûnandin, lê ev yek ji bona hestên te neheqiyê mezin dibû. Çimkî hisên min ên seba te; li ezmanan direqisin, lingên wan pêlî herdê nakin û tu li herdê, pir dûr î. Qey dibêjî, naxwazî bikevî nav asoya xeyalên min.

...

Di van kêliyên dawîn de cixareyê li dûw cixareyê reş dikim. Qedeha min herdem tijî ye. Belkî bê solix bimînin û bikevim hemêza te... (çi rind dibû!) Çi bikim, hêvîya min jî ev e. Bênefes dakevim ser milên te...

Çi rind dibû! Bênefes, di hemêza te de...

Piştire ji vê daxwaza xwe vedigerim. Lê ku gava ketinê dilê te biêşînim? Ev îhtîmal min diêşîne. Dilê te jî wek dilê min e, ji şûşe ye. Gava bixwaze hez bike jî dişikê, wek dilê min...

(... xwestina te çi dudilîyeke mezin e û ez di nav vê dudilîyê de difetisim, çimkî te dixwazim!)

Ji kevirên di nav avê de kevz girtî dihesidim. Çiqas hezkiriyên wan keviran hene! Ez nikarim bi qasî wan jî bibim, bêkes û bextreş im. A rast me bi hev re ev bextreşî

mezin kir. Min û te! Ev bextreşî berhema me her duyan e. Ewqas mezin e, ku têra me her duyan jî dike...

...

Û di talîyê de, di destê min de, ji xeynî soz û sondan dîtir tu tişt tune ku bidim te. (Jixwe hemû soz û sondên min li ser te ne) Û tu jî ji wan ditirsî... Belkî jî ev gotinên min xofê dixin dilê te û te ditirsînin. Belkî jî tu wan, wek gotinên reş, bêbawer û qirêj dihesibîni. Lê ew pêlîstokên min ên şikestî ne.

Reş, bêbawer û qirêj in!

Ez bi wan re wek zarokên şûm dilîzim.

Ew gotinên min in.

Ew gotin ez im.

Reş, bêbawer û qirêj!


...

Tenê û tî

Hîvronî

Seyfi Doğan

li şeveke gulanê hîvronî
li sîyê xanîyê ji kerpîça
dilî min qutequte
li bendê te me
were
ma sîyê şevê me ji çavên pêl biparêza
wek berê
wek berê
dotê li ser darê bi tenê
kervanên mêrîyan reş
hêlînê çûçikê hewa
û dêlegurê ku destî berbangê ji necirvanê vedigerî
şahîd bûn ku me çiqas ji hevdu hezdikir
were sîyê xanîyê ji kerpîça
wek berê
wek berê
gulîyên xwe yê qîlê reş bi ser piştê xwe da
mina çemên behîştan biherikîne
şerpê xwe yê sor bi serî xwe da
were sîyê xanîyê ji kerpîça
wek berê
wek berê
ezê dengî gavên te yê ku difirin
ji erdê hîsbikim
û ji pêlên bê bibîzim
bes were sîyê xanîyê ji kerpîça
hundirî jîyanê min bixemilîne
wek berê
wek berê



DENG Û DERÎYÊN HESIN-2

Adem Özgür

Minibûsa girtîgehê livî, yekî bi dengêkî bilind bangê me kir û ez ji xewê rabûm. Li kêleka min du xortên ji Amedê hebûn. Em ji minibûsê peya bûn. Leşkeran li vir jî em kontrol kirin. Jixwe paşîya kontrolkirina wan qet nedihat! Em derketin derve. Pênc şeş leşker li bendê me bûn.

Leşkerekî navê me dixwend û navê kê dihat xwendin ew diket hundirê nezaretxaneyê. Nezaretxaneyêke mezin, pir bi deng û di binî erdê da bû. Kî dikete hundirê wira bêhna xwe teng dibû, mirov veditîsî. Wexta ku em peya

bûbûn me derve nedîtibû, em xistin binî erdê û ji me re gotin, “Heta ku dora we bê, hûnê li vir bisekinin, bi kesekî re deng mekin.”

Giran giran derîyên bi hesin vedibûn, şequeteqa hesina û qîreqîre leşkeran dikete guhên min: “Sıradakiii”, her ku dora yekî dihat, şequeteqa hesinan jî bilind dibû û tirs dikete nav dilê me: “Sıradakiii.”

Di hundirê nezaretxaneyê de nêzikê sêsed kes hebûn. Li alîyê din bi dehan leşker, polis û xebatkarên dadxane jî diçûn û dihatin.

Hin kes dicirifn, hin kesan dest bi girî kiribûn, hinek ji wan jixwe hînî dadgehan bibûn û ev tiştên ku bi min ecêb dihatin qet ne xema wan bû.

Em bi devdevê siwê re gihiştin dadxaneya Adanayê û wexta me hê pir bû. Herik wext derbas dibû kesên nû diketin hundir û yên dora xwe dihatin, diçûn jor. Hê dora min nehatibû, lê serleşkerê bi sê çar kesan va hatin ba min, ver gotin: “Xwe amade bike, em ê te bibin dereke din û em ê kelepçe bixin destên te.” Di nezaretxaneyê da kelepçe xistin ne mecbûrî ye, lê leşkerên tirk veng in. Wextê ku bixwazin te hêrs bikin, tiştên bêhiqûqî tînin serê te.

Min nehîşt ku ew destên min bi kelepçe bike. Li hember gotinên min hêrs bû, copê di destê xwe de li deriyê bi hesin xist, “Şaaaq!” Gotina xwe dûbare kir û min nexwest ez ji hundur derkevim. Talimat da leşkerê û ver got: “We xortê me dît helle, çî mêr e! Zû deri vekin û vî ji wir derxin û destên wî bi kelepçe kin.”

Ji deh saetan bi şunda dora min hat. Ez niha li kêleka şeş leşkeran, di korîdoreke diwar şewitî, qirêj û tije nivîs ber jor diherim. Serleşkerê ku dixwest destê min kelepçe bike jî bi me re bû. Hêrsa wî di çavên wî de xuya dikirin. Ji ber ku serleşkerê ew azar kiribû û nehîşt ma destên min kelepçe bike.

Em li ber deriyê ne. Di hundir de dozeke din heye. Ji wê dozê bi şunda dora min e. Dengên bilind ji hundur da dihat, yekî dikir qîreqîr. Me paşê evisî ku cezayeke giran dane wî û malbata wî hawar dikir.

Doza min dirêj neajot. Parêzerê min amade bû û dî, bavê min, meta min Gul û merkê wê Avo jî hatibûn. Di dadgeha cezayê giran de 10 meh ceza dane min û ez hatim berdan.

Çend mehan bi şunda ez li derve bûm, min di erebê da li derve mêzedikir û ez disa ketim xeweke kûr...

* Nivîsa yekem di hejmara 86an (Teqe û Ro, r. 40-41, s. 2023) de hatibû weşandin.

Kurdeleya sor

Halil Mîrzan Küçükyıldız

Rojnemevanê birêz, ez vê namê ji dînya walî ji te re dişinim. Ez mirim çûm dînya walî, hêvî dikim tu daxwaza min bînî şûnê. Ez pêbawerim, ku tu nîvîsvanekî hêja û bi rûmet î. Tu yê xatir kî ku bombevanekî xwekuştî bombayek li bajarekî kurdan teqand, pir kes, keç û lawik cîwan hatin kuştin. Ez jî li wî bajarî mirim. Min navê wî bajarî ji bîr kir. Dizanîm bajarekî biçûk bû, soqaqên xwe hendik bûn, çima ku ez ji Halepê hatim. Soqaqên Halepê pir bûn, çarşîya wê gelek mezin bû. Lê ez dizanîm bombebaran-din, xanîyên hilweşînî, avahîyên xelîyayî, mal û milkên wîrane çî ne. Erê, mirinî çî ye ez dizanîm. Min li soqaqên Halebê laşên jin û mêr, kurikên hatinî kuştinî pir dîtî. Wexta ku ez bi dîya xwe, du xweng û du birayên xwe ve revîyanî hatinî Tirkîye, ez pênc, ya jî şeş salî bûm. Ez tiştêkî ji

bîrnakim, wan dîmenan qet ji bîrnakim. Bavê me bi me re tunebû. Dîya me jî negot ew li kuderê yê.

Wê rojê, yanî roja bombe teqandinî ez û etika Nuray li hevşoyekî li ser textebendekî, na textebend ne, li ser kevirên ber dîwêr runiştî bûnî. Min Nuray abla rojekî ber vê naskirî bû. Min peçetê destan difirotin, Nuray li ber otelê dît, xwest ku pakêtek peçete bifiroşim wê. Nurayê bi destî min re girt. Em çûnî li çayxana li ber otelê li masekê rûniştinî, got; “keça xezal tu niha hevala min î, em niha tevhev xurînîyê bixwinî, paşê peçetan bistînim.” Ez di dilî xwe de şabûm, him kêr, him jî xwarin! Ew jî pir kêfxweş bû, got; “amma tu jî min çî pirsikir bersivê bidî, yanê qala jîyana xwe bikî.” Wê çî min pirsîya, min bersiv dayê. Min jê re reva me, bajar û gundên pêrîşan û helweşîyayî,

dîya me yê reben, her dû xwengên min yên biçûk, her dû birayên min yên sêzdeh û panzdeh salî ku li inşeta di xebitinê behskir. Me qewl kir ku em dotira ro hevdû bibînê. Ku min xatirê xwe xwest bîst qaymên xetînê dan min.

Dora dine rojê ez sibê zû çûm ber otelê li ser textebendekî rûniştim, firotina peçetan xema min jî nebû. Min dixwest etika Nuray biwînim. Ew ji otelê bi derket me dîsa li çayxanê xurînê xwar, wê got “niha bi te ve herinê dereke, ez dixwazim tu tiştêkî ji min re bikî.” Em peya hatinê ber malekê, bînaka bi qatekî ya mezin. Em li ber malê li ser keviran rûniştinê, li pêş malê meydaneka fereh, li meydanê qelbelixika mezin hebû. Jin û mêr, lê piranî xort û ciwan bûn. Min hîngê ferqkir ku Nurayê kurdelaka sor bipîstê xwe de kiriyê. Kurdela çû pir xweşîna min, min pir jê hezkir, gavekê çavê min lê ma. Min got; “va kurdela çî rindik û xweşik e.” Wê got; “heger te jê pir hezkiriyê wê bitedim, niha em van kesan, gîştik biderkevinê meşekê, boyî ku em hevdû nasbikinê min kurdela bi pîstê xwe de kir. Mezeke! bi pîstî pirkesî de heyê.”

Dûva kurdela ji pîstî xwe jê kir, ji çenteyî xwe tokayêk, şehêk bi derxist, bi ser guhê min de du kezî hunandin, çû hundirî malê meqesek anî, kurdela bi du paran kir, her gulîyekî yek lê girêda, ji çente nêynikek biderxist, got; “mezeke, çî xweşik bûyê, tu zaten keçikeka pir fodil î.” Ez ji dilî xwe de pir û pir şabûm, min xwest bêjim “Nuray abla tu ye pir bedew û rindik î.” lê min fedikir. Wê got; “Niha ez ji te tiştêkî dixwazim, niha yekê were li ser wê kursiyê bipeyîve, dû xelaskirina axaftinê tu yê herî vê kaxizê bi wî dî. Tu diwînê ew xortê bi simbêlreş, bi mintanî heşin. Min hîngê ew xortê bejn dirêj, çeleng naskir, ji wê pirsyam “Ew kî yê?”

“Ew xastekê min e, em yarê hevdu, yanê dildar in, çend heftan ber vê wî xwast em herin Kobanîyê, min gora wî nekir, li min xeyîdî. Ez niha hatim, em ji hev hezdikinê, belkî em nêzikî bizewcinê.” Min yar çî ye, dilketin çî ye nedizanê, çimakî dîya min digot ku, ”tu panzdeh salî bûyî em te bi mêrikî dinê, dixwaze tu deh kurikan binê dîne heger ne ew mêra careka din bizewice”, Nurayê kaxiz bere duqat, paşê

sêçarqat kir û da dest min, ew xortê çeleng helkişt ser kursiyê him bi kurdî, him bi tirkî selav da temaşavanan. Dûva bi tirkî berdewam kir. Min zanî, ku ew du zimanan dipeyîve, çimaki min di ew sê salan de herdû ziman jî evisandi bûn. Min bi heyecanekê xwe dabibû bendê, ku ma ew axaftina xwe biqedîne, ez bimeşim herim wê kaxizê, nameya Nurayê bi wî dim. Min di dilî de digot; “xweska navbera wan ez çêkim.” Wê bîstikê dengê teqînîya bombeye hat, gumni, ez di bin tiştêkî de mam.

Nivîsvanê hêja va nameya duduyane ji te re dişînime. Bi rastan ez nemirim, va nameya jî ne ji dînya walî de ye. Wextakî gumnî hat, erd lerizî, ar û duman ra hewa ket, peti û xirdexaş minan qurşuna li doralîyan belav bûn, Nurayê xwe heman avitîyê ser min, ez jî bîrva çûme, li nixweşxaneke min çavê xwe wekirin, heş hatin serî min, çavê min li Nurayê gerîyan, tunebû. Ji hemşîrekê pirsîyam, got; ”ew mir, wê xwe ji te rekirîyê sîper, tu filitîyayî, lê ew xelas nebû, ku ew anîn vir birina wê kûr bû.” Hingê

wê bîstikê ez mirim, girîyam girîyam, pir pê êşîyam, kesirim.

Ez niha panzdeh salî me, bi mîrekî bîst salî re zewicîme, ew ne dildarê yarê min e, ew mîrê min e. Ew nexwezê, ku ez bixebitim, peçetan bifiroşim. Daxwaza wî ya pêşe pêş ma deh kurikên me biwin. Ji bavê me jî hîn tu xeber nehatin.

Rojnamrvanê birêz, min va nameya çima ji te re şand, dizanî? Ez dixwazim tu yê alîkarîya min bikî, ew kaxiza, ew nameya Nurayê ji yarê xwe re nivisandî hîn li cem min e, min ew tim veşart, lê nivîs rêşbûyê, ez dikanim tenê rêza sifteh bixwinim. “SEVGİLİM”. Ez dixwazim tu wî kesî ku wê rojê rapêyîvî biwinî. Ez dixwazim, ku ma bizane Nuray li wî sûhnatîyê, bi eşqa wî hatîyê wî bajarî. Min kurdeleya sor heta roja îro di paşila xwe de veşart, Nuray him hevala min, him delala min bû. Kîngê keçîkek min bû nav wê bi Nurayê navkim, kurdela sor li kezîyê wê girêdim.

Rojnemevanê ezîz û muhterem, ez hewidar im tu alîkarîya min bikî, xwestine min bînî şûnê.

Dawetnameyên dawetan

Gelek caran heval, nas û dost telefonê min dikin, dixwazin ku ez ji bo daweta wan an ya zarokên wan dawetnameyekê binivîsim. Belê, dawîya dawet û daxwaznameyan nayê. Loma min xwest çend nimûneyên dawetnameyan li jêr binivîsim. Bila bibin belgeyên nivîskî ku gelek kes jê nimûne bigirin û fêde bibînin.

Amed Tîgrîs

*Şîrînbêjîya zarê me
ronahî da çavên me
sînerjî xist dilên me
çêbû evîndarîya me!*

*Em du dildarên amedî
we hêjeyan vedixwînin
dawet û şahîya xwe
bibin berbûk û xwendî!*

*Em selwî û şengebî
li dilistanê me hev dî
çav liband, dil heban
me herdu xoşewîstan
biryara hevjiyanê da!*

*Me biryara zewacê da
li xwe kir kincên bûk û zava
def û zirnê deng veda
daxwaza beşdarîya we da!*

*Çav çavan dibîne
dil dilan dihebîne
bûk û zava bi hevî ne
we li daweta xwe binîne!*

*Ha nîna ha nîna, ca nîna
em dizewicin di jîyanê de carek*

*hezar carî bûk li zavê bimbarek
jîyaneke dirêj û bextiyarene
heza carî zava li bûkê bimbarek!*

*Tilîlîlî lîlî lî
gelî berbûk û xwendîno
bi xêr bèn şahî û dilana
bextewarîya vî û wî dilî
geş kin govenda dumilî!*

*Me herduyan bi dilşadî û xoşewîstî
biryar da ku bi dawet û şahîyek
hevjiyaneke temendirêj û bextewar pêk
binin. Em dixwazin hûn hêja jî vê şahî
û şadîmanîyê bi me re par ve bikin!*

*Me ji ezebî û tenêbûnê xatirê xwe
xwest, biryara hevjiyaneke dildar û
bextewar girt. Em bi dawet û dilanekê
despêka jîyana xwe ya nû pîroz dikin.
We jî vedixwînin vê dawet û dilana
xwe ya geş û xweş!*

*Dewet e, dilan e, despêka jîyana me
du ciwanan e, em li benda heval, nas û
dostan in!*

Hevpeyvînek bi Barbara Sträuliyê re

Mehtab Îdelî



"Edebîyata devkî ya kurdan behr e! Dawîya xwe tune."
Wextê ku destana «Dewrêşê Evdî» ya Baqî Xido bi dest min ket min fehm kir ku ev di asta edebiyata gelêrî ya navnetewî de xezineyeke mezin e!

Barbara Sträuli, wergereka Swîsrî ye, çend kitêb û destanên kurdî wergerandine almanî û îngilîzî. Ew bi pirzimanî mezin bûye û li xwengeha bilind a Zurihê beşa edebîyata îngilîzî xwendîye. Mêrê wê ji Rihayê û ew li Swîsreyê zewicîne. Ew û mêrê xwe ji sala 1983an vir ve hersal tatîla xwe li gundê xwe yê deşta Pirsûsê (Sirûcê) derbas dikin.

Barbara û kek Mehmûd 27 sal in aboneyên Bîrnebûnê ne.

Sträuli, wiha qala xwe dike û dibêje:

–Ji bo dahatûya min di wê demê de du tişt mihîm bûn: Yek, ez bi salane li enstîtuya Îngilîzî beşdar projeye çapkirina şanoyên Shakespeare bi du zimanan bûm, bi îngilîzî û almanî. Ew şagirtiyeke dirêj a fehmkirin û çapkirina metînen biyanî û dîrokî bû. Du, ji xeynî îngilîzî min dîroka Roma û Yewnanî jî xwend.

Rojekê şansê min lêxist. Mamosteyê me bi Muzeya Ar-

kolojîya Eskîşehîrê re projeyek çêkiribû. Em çend xwendekarên swîsrî û mamoste li havînê di merselên gundên Eskîşehîrê li ser kevîrên kevn li nivîsên latinî û yewnanî geriyân. Li Eskîşehîrê min mêrê xwe nas kir û jiyana min hat guhartin.

Te hin destanên navdar ên kurdan wergerandin Îngilîzî û ew kirin pirtûk. Zimanê van pirtûkan him kurmancî him jî îngilîzî ye. Tu dikarî ji me re behsa vê bikî?

– Min du pirtûkên bi kurdî-înglîzî çap kirin: Destana «Dewrêşê Evdî» ya sazbandê Baqî Xido ji Kobanê û çend destanên du dengbêjen Rihayê. Navê vê pirtûkê «*Our steppe is vast... Kurdish epics and tribal stories from Urfa, 1906*» ye. Lêkolinvanê alman Oskar Mann wê salê hatiye Rihayê û ev destan berhev kiriye, lê destnivîsên wî nehatine çapkirin. Min pişt re ew destnivîs li Berlinê dîtî.

Min çima ev pirtûk bi herdu zimanan amade kiriye? Ez ne kurd im û ez nikanim li şûna kurdan biaxivim û binivîsim. Min got, ez dikanim folklorê kurdan li Ewropa û li Dewletên Yekbûyî bidim naskirin. Min ew pirtûk ji bo pîsporên folklorê ji derveyî rohilatê navîn amade kirin. Min got, dibe ku ev agahî li cem kurdan hebin. Feqet piştî zelal bû ku agahîyên herêmayên ku min berhev kiribûn, li ber destê pîranîya kurdan tunen. Tiştên ku min ji destana Baqî Xido fehm nekiriye, navên kinc û silehan û orf û adetan, erdnigarî ya erdî berî û hwd min hemû ji ixtiyarên deşta Sirûcê pirs kirin û di jêrnotên pirtûkê de nivisan-

din. Ewana berê koçer bûn û wilo zanîna wan hatiye parastin.

Destanên ku te ji kurdî wergerandin îngîlîzî bo kurdan gelek girîng in. Lê dixwazim ji te jî bibihîzim: Te çawa biryar da ku van destanan wergerîni? Ev destan bo te çi îfade dikin?

– Wextê ez hatim Tirkîyê ez şok bûm û ew şok hên dom dike. Kurmancî qedexe bû. Kurdên nîfşê min çêtir dizanin. Li rohilatê Tirkîye ciddîyet hebû. Di otobosan da herkes bêdeng bû, cixare dihate kişandin, kesek nedipeyivî, tenê çend bazirgan di nav xwe de bi tirkî dipeyivîn. Li başûrê Tirkîyê peyva «kürt» ji aliyê kesekî ve bilêv nedibû. Ez ji çandeke pîrziman hatibûm û ew rewşa ji bo min bû sebaba nerazîbûneka mezin. Ji xeynî vê min hêdî hêdî fehm kir ku li pişt wê perdeya hesinî ya qedexe ziman, folklor û edebiyateke mezin heye. Ew perde îro hate rakirin. Feqet vê nîfşê baş kar kir û hewl da.

Haya ewropîyan ji denbêjên kurdên Tirkîyê tunebû. Wextê ku deqa destana «Dewrêşê Evdî» ya Baqî Xido bi dest min ket, min fehm kir, ku ev di asta edebiyata gelêrî ya navnetewî de jî xezineye-

ke mezin e. Min biryara çapkirinê vê destanê bi rêbazên weşandinê şanoyên Şakespeare da.

Li vir divê ez bêjim ku niviskar û rojnamevan Şahine Bekirê Soreklî destana Dewrêşê Evdî ya Baqî Xido ji wendabûnê xelas kiriye. Soreklî wekî Baqî Xido ji Kobanî ye. Wê demê, di salên 1980yê de kesî guh neda hunera Baqî Xido û qîmet nedaye. Soreklî ji Baqî Xido xwestiye ku ew wan destanan li ser kasetan vebêje û jê re bişîne. Paşê ew hemû nivisandine, deqek jê çêkiriye û di radyoyê da jî xwendîye. Karekî mezin û hêja kiriye. Îro li YouTube bi sedan destanên dengbêjên berê hene. Ger neyên nivîsandin, dê ewê wenda bibin. Tenê kurdekî ji heremê dikare dengbêjiyê û devoka dengbêjiyê fehm bike û binivîse, kesên biyanî wekî min nikanin.

Bi qasî ku ez dizanim, te du pirtûkên kurdî jî wergerandine Almanî. Yek ji wan pirtûka Mehmûd Baksî ya „Gundikê Dono“ bi navê „Dono“, ya din jî pirtûka Helîm Yûsiv „99 Morîkên Belavbûyî“ bi navê „99 Zerstreute Perlen“ e. Ev herdu pirtûk bi awayên cuda pirsgirêkên civakî yên kurdan rave dikin. Tu dikarî ji

me re hinekê behsa çîroka wergera wan pirtûkan bikî ? Çima ew pirtûk?

– Bersiv hêsan e. Min bi xwe ev her du pirtûk nebijartin – pêşniyara wergerê ji min re hat. Helîm Yûsiv daxwaza wergera pirtûka „99 Morîkên Belavbûyî“ du-sê sala berê ji min kir. Min roman eciband û wê demê wextê min jî hebû. Pirtûka „Gundikê Dono“ ya Mahmut Baksî hevalê min Yisûf Yeşiloz çap kiribû. Wî, wê çaxê li St. Gallenê hem pirtûkên kurdi difrotin, him jî çapxaneyeye piçûk ji bo weşanên kurdî vekiribû. Wergera *Gundikê Dono* fikra wî bû. Min got erê, le ez hê jî fedî dikim. Ez ciwan bûm û ji xwe bawer bûm. Kurmancîya min vê demê ne ewqas baş bû, lê derdora me kesekî din kurdîaxiv tunebû. Îro ez dibêjim ku min dikaribû ev roman bi awayekî cuda û baştir wergerîna. Ez hêvî dikim ku Yusuf Yesiloz min efû kiribe. Dîsa jî, wê demê çapkirinê romaneke kurd bi almanî girîng bû. Romanên wergerandî li Ewropayê gelek kêr bûn. Alîkariya herî bi qîmet di dema wergerê de ferhenga Kurdî-Tirkî ya D. Izolî bû. Ez hîn ji vî matmayî me. Dr. Îzolî qasî ku ez zanim, endazyar bû û

li Hollandayê di kargehekê de dixebitî. Wî bi tena serê xwe ferhengek ew qas mezin, baş û bikêr çêkiribû û di sala 1987 çap kiribû. Ew berhem ji bo hebûna zimanê kurdî semboleke pir girîng e.

Di pirtûka Helîm Yûsiv de, zehmetiyên ku kurdan him li welêt û him jî di dema penaberiyê de, li Ewropayê ditine morî bi morî dîsa bi ben ve hatine rêzkirin. Te; wek keseke bi salan e li çîrokên kurdên penaber guhdarî kiriye û gelek jî alîkariya wan kiriye, dema ku ew pirtûk wergerand, tu çûyî bîranînên xwe yên berê?

– Di salên 1980î de ez ji xwendegêhê perwende bûm û derbasî Wezereta Fêrkirina Kantona Zurihê (Bildungsdirektion) bûm. Ez li ser tekîlîya di navbera dêûbavên biyanî bi dibistanan de, xwendina zarokên penaberan, hevkarî bi mamostên zimanê zikmakî û hwd. xebitîm. Penaber pêl bi pêl hatin, di sala 1980î de bi kurdan û çepên tirk re dest pê kir û heta sala 2014 bi rojavayiyên re berdewam kir. Tu rast dibêji, min wekî Helîm Yûsif zehmetiyên kurdên di dema pênaberiya wan de hemû dîtin. Feqet Helîm Yûsiv hikayên wan wilo berhev dike, wilo rastiyeke jê

derdixe, tu nizanî bigrî yan bikenî. Tu dibeyî qey ev serpêhatiyên penaberan hatine zêdekirin, lê ji tecrubeyên şexsî tu dizanî û dibê belkî jî rast bin. Lewma wergerandina ew beşa pirtûkê balkeş bû.

Di navbera sohbeta me de, te ji min re gotibû ku yek ji sedema qebûlkirina min a wergera pirtûka Helîm Yûsiv jî, em ji heman herêmê ne û heman devokê diaxivin.‘ Vê gotina te, ew gotina, ‘Têkiliya ku wergêr bi nivîskar re çêdike, di warê dîroka wergerê de ji belgeyek e.» anî bîra min. Tu li ser vê yekê çi difikirî? Li gor te jî ew gotin rast e an na?

– Devokên kurmançî pir cihê ne. Ger Hêlim Yûsiv ji Çewliqê yan jî Wanê bûya, belki min nekaribûya pirtûka wî wergerîna. Min pir wext li herêmê Rihayê derbas kir. Dîmen û erdnigariya berriyê di mêjîyê min de asê maye, devoka heremî di guhê min de ye. Amûd ji Sirûçê pir ne dûr e. Eger çîrokekê yan jî romanekê werderîni, tecrubeya wergerê ew e ku berhem weki filmeke hêdî hêdî ber çavên te derbas dibe. Heke tu tişteke jê fehm nekî, tiştê ku di wir de nebînî û hîs nekî hingê nikanî wergerîni jî. Em dikanin bêjin di

pirtuka Helîm Yûsiv du film têne raber kirin û min her du film berê jî dîtîbû: filmê peyzajê li ser sinorê nav Turkiye û Suriye û filmê li ser rewşa penabêrên li Ewropa yê. Tiştê nû ji bo min di romana Hêlim de danasîna jiyana rojanê ya kurdan bin rejima Asad bû.

Di van salên dawî de gelek pirtûkên bîyanî bo kurdî têne wergerandin. Roman, portre, çîrok û pirtûkên lêkolînan hwd. Lê tu pirtûkên kurdî bo zimanên bîyanî werdigerinî. Bi ya min, wek destana Dewreşê Evdî, divê gelek destan, çîrok û serpehatiyên kurdan bo xwendevanên bîyanî werin wergerandin. Bi dîtina te xwendevan, nivîskar, weşanger û wergerên bîyanî di warê wêjeyê de kurdan baş nas dikin an na?

– Wergerên kurd zêde ne, wergerên ku dikanin ji kurmançî wergerînin zimanekî bîyanî pir kêmtir in. Ji bilî wê ji bo wergerên folklorîk li weşanxanên zanisti li Ewropa belkî cihek tê dîtîn, feqet çapkirinê romanên kurdî bi zimanê almanî pir zor e. Bi rasti, çend nivîskarên kurd li Ewropa navdar bûn, wek Baxtiyar Ali û Yaşar Kemal, dibe ku Mehmed Uzun jî. Lê bi gelemperî xwendevan, nivîskar û weşanger di warê

wêjeyê de kurdan nas nakin. Sebeb jî sedî nod aborî ye. Di warê edebiyata kurdî de herkes belê dixebite. Nivîsandina romanên bi kurdî zehmet e, divê nivîskar li kêleka nivîsandinê bixebite jî. Da ku romanek bigihîje weşanxaneyê, divê ku pêşî were wergerandin. Xebatên wergerê bi mehan diajo û bi gelemperî werger nikane bê meaş bixebite. Paşê, nivîskar romana wergerandinê dişîne bi dehan weşanxaneyan, lê yek qebûl nake. Romanên ku kurdan nivîsandine bi giştî yan li ser travmayên xwe yê şexsî yan jî li ser travmayên gelê kurd in. Nivîsandina van ji bo nivîskar bi xwe tiştekî baş e, ev jî bo giyanê wî re tedawî û dermanek mezin e. Lê mixabin ev serpehatî êdî bala xwendevanên bîyanî nakişînin. Divê îro bê lêkolîn û pirsîn, ku xwendevanên niha kujan mijaran hez dikin, çî dixwînin?

Û reqabet di nav nivîskarên dewletên şerqî û efriqî jî pir mezin e, divê pirtûkên profesyonel bînan nivîsandin.

Pirseke taybet; him di wêjeya kurdî de him jî di ya cihanê de, ji kujan nivîskaran hez dikî?

–Adetên xwendinê bi salan diguherin. Ez êdi pir roman naxwînim. Her tim edebiyata devkî ya kurdî me-


raq dikim. Behr e, dawî tune. Li bilî wê kêfa min bi nivîsarên zanistî yên zanyarên kurd tê (êşkere bêjim, ez bi ferhengê dixwînim). Nivîskar û zanyarên kurd di bîst û pênc salên de standardê zanisti ji sifirê anîn standardeke navnetewî. Min ew pêvajo ji derve taqîb kir, pêvajoyeke awarte bû. Di salên nodî de herkesî digot: ‘zimanê kurmançî ya niviskî bê akademîya dewletê nabe’! Di sa kurdan bi xwe, bi nivisandinê û rexnekirinê zimanekî niviskî çêkir. Paşê digotin, ‘kurmançîya zanistî tune, yan jî nê xwendin’. Niha heye û tê xwendin. Digo tin, ‘asta zanyarên me kêm e’. Li hemberî astengiyên mezin zanyarên kurd bi ser ketin. Lewma nivîsarên kurdî li ser edebiyata devkî û nivîsarên zanyarên xwendegehên Mêrdîn, Çewlîg û Mûşe û hwd. bi kêfxweşiyê



mezin dixwînim. Rohat Alakom ji bo min lêkolînerkî mezin e, ew qehremanê arşivan e, pirtûkên wî jî ji bo min bi qimet in.

Ji bilî wê ez wêjeya populer hez dikim, çêrok, komedî, pirtûkên zarokan û thriller.

Têbînî: Kesên ku dixwazin xwe bigihînin pirtûkên Barbara dikarin li ser rûpelên ‘Harrassowitz verlag û Amazonê wê bibînin.



MİRÎNEKE AZAD

dergehên xurbeta mişextiyê
ji min re bûn rawestgeha
sermestiyê
demên xweş û geş
di ber temenê mesûm re gav bi gav
com bûn
bîranînên xortaniyê
li nav kaviên salên têkçûyî
can dikişînin
qedera serserî
gustilka bextê reş xistiyê
tiliyê min ya qereqûçkê
ey feleka şaşbûyî êdî bese
destê xwe ji sikura min berde
ey şevistanên koretarî
janêş û keserên min yên bêdeng
ji rengê te reştarîtir in
li nav rûpelên albûma jiyane
wêneyên bêçaretiyê hatine
neqîşandin
ez li tenêtiya westiyayî
xwe dispêrim dîwarê helbestên
tî û birçî
min nikarî bibim sîwarê hespekî çeleng
û çargavkî ber bi dilşadî
bextewarî
û asoya xeyalên şîrîn ve bibezişim
min ji min nepirsin
werin min ji stranên kezebperitî
ji wîzewîza bayê reş
ji guregura zîpikên reşewran
ji gurpegurpa tirsê dilê perpitî
ji qîjeqîja çûkên hêlîn wêran bûyî

û şeveder mayî
bipirsin
li ser zewiya hesretê
peşkên barana bereketê
qet nebarî
hevîrê kêf û sefaya seyrangehan
tehl û tirş bû
kevîrê sebirê
li nav şewata kul û kederên birînkûr
heliya
xewnerêşkên xopan
xwe li stûyê bêxewiya nav nivînan
alandîye
xweşbêhna çiçekên hewşa hinav
çilmisîn
parsûyên qefesa arezûyan
li nav mîrata axîn û nalînan
qîrçe qîrç in
ez bêhemdê xwe hatim
vê dinyaya derewîn
min çavê xwe li jiyana qehpik
bêwîjdan
bêdilovan
gerand
temaşa kir
û ez ê bi nefretekê
bi hêrsekê
bêkefen
bêdarbest
bêxatîrxwestin bar bikim herim
nav dilê goristaneke bêxwedî
û têkevim xewa mirineke
aram û azad.

Xizan Şîlan

Serpêhatîya mala Bişar û Seydo

Şirove û nivîs: Feyzi Mîrhesen

Mala bişar û Seydo, firarên ji ber Roma reş serî hilada bûn. Ev herdu komên firaran, Mala Seydo ji Muşê ji gundê Qicixê, ji eşîreta bajarê Seyidan, Seyîdan ji bavek ji eşîreta hesena ne. Seyîdxan û Teyfîq herdu bira ne, ji wan re malbata Usivê, Seydo tê gotin. Destpêka wan şerê navxweyî de dibin firar. Hin kesên nav xweyî dewlet li peyên wan digerin. Piştî ku dibin firar li çiya û deveran digerin. Bala dewletê dikişînin ser xwe. Li Serhedê heya Binxetê qala wan têkirin. Seyîdxan bi tevî hin kesan bi zivistanan li Binxetê (Rojava) dimînin. Seyîdxan û Firarên berazan digêhêjin hevdu peyman û bext didin hev, bi hev re bigerin. Hertim rola xwe leystîye.

Mala Bişar ji Erzirimê, navçeya Bayraqdar (Qereyazîyê) ji eşîreta Beraza ne. Qereyazî di serhildana firar û rabunê de hertim rola xwe leystîyê. Eşîretên wek Zirikî, Berazî, Cibirî, û Dumilîne. Dibeku min navên hîn eşîretan kê mî gotibe. Fîrarên mala Bişar, Feyzo bavê Îpegê, Evdilbaqî, Elîcan, Elîyê Feqî Silê, Mihê Xelîfe û bi dehan kes. Lê mala bêbextîya navxweyî bişewite, di hemû serhildanên kurdan de, bi destên 'xayîna' û nokeran têkbirine. Mala Seydo Seyîdxan ji Binxetê dema vedigere teqibat û suxwir lê peyê bune. Bi şev li devera Mêrdînê gule berdidinê û ji yana xwe ji dest dide. Silhedin, lawê Seyîdxan ji Binxetê (Rojava) dema vedigerin, li devera Êlih (Batmanê) bi tevî Şex Evdîrehimê birayê Şex Seyîd ve, di nava zevîya genim de, dewlet agir berdidinê û şehid dikin. Teyfîq, birayê Seyîdxanê piçk bû, navê wî di kilam û serhildanan de heye, bi alîkarîya hinkes û nokerên sixwurlî ber gundê Avzutê, Muşê şêhîd dikin.

Seydayê Cîgerxwîn di şahnema şehîdan de, li ser wan wiha dibêje:
“Dilo bêje Elîcan û Seyidxan
Şehid in hun ji bona me kurdan
Em dizanin cihê we pir bilin de
Bes e rabin xewa şîrîn nerind e.

Ji Teyfiq û hevalên wi re bibêjin
Herçî kurd in wekî we xwîndirêj in
Bi qurbana we bin sed şax û keyxu
Di gel mal û eyal û zarên xwe

Mala Bişar bi suxurîya kesên li herêmê de, qolordîya Erzurumê û Hesênqelê radikîna ser, digrin. Li devî Ava Reş de, Feyzo Bavê Îpegê jî bi tevî donzdeh kesan şehîd dikin. Serê Feyzo Bavê Îpegê jê dikin. Gustîla tilîyê de buye, bi kêrê tilîya wî jê dikin gustîlê dertînin. Tilîya wî li ser berfê dihêlin. Serê wî dibin Agirî û navçeyan ravî gel didin.

Di van êş û zordariyên wê demê de li Dersim, Agirî û gelîyê Zîlan de xwîn diherike. Di vê pêvajoyê de Mala Bişar û Seydo jî para xwe ji vê pêvajoyê girtin. Mala Seydo ku li herêma me de bûn, ez jî li wir mezin bûm û bûme şahidê gotin û serpêhatîyan. Piştî bûyera mala Seydo fermana li ser herêma me zêde dibe. Kesên ku nan dabûne firaran an jî di serhildana Şêx Seîd de navê wan derbas bibûn, yekoyek digrin û sirgun dikin.

Herêma me ku ez lêbûme û mezin bûme, gundê Muşê û çend gundê li devera Muradê ne. Jê re Xandirîs (Xan îdrî) ji gundê Melexidra, Çaxsor, /Sêgira gundê lê bume/Kanîcotk. Seydo Qicix, Heft mexelo, Qeremêş 42 du kes digrin. Bi zîncir û kelepçe, berê wan didin Muşê. Li bin gundê Xasîk, Newala çelekan de/ bi otomatîk û tivingan gulebaran dikin. Ji wan 42 kesan du kes di bin kuştîyan de bi birindarî bi şev direvin û rizgar dibin. Min ew herdu kesan dîtibû. H. Silêmanê çaxsor, Birayê wî yê bi navê Arif kuştî bûn. M. Eminê Qicixê ji gundê Seyidxan û mirovên wan bû. Dema ku rêya rêwî û kesan bi wî gundî ketibana diçûne cihê bûyerê, ji bona biranîna wan.

Ji bona nimune, di wê komkujîyê de gundê Kanîcotkê dişewitînin. Ji van 42 kesên ku girti bûn ji Melexidra, malbata Evdal, Mihemed, ji çaxsor Arifê Silo, Kanîcotk malbata mala Malo Xelîl, Samîl û kesên ku navên wan nayên bira min. Li Qeremêşê mala Zabitê Otê, Heft Mexelo û Qicix Mala Seydo 42 kes.

Piştî girtin, iskence û koçberîyê min a bi salan e, derketim derve. Dest bi nivîsa van bûyer û pirtûkan kir. Lê bi rastî êşa Feyzo Bavê Îpegê gelek tesîr dabû min. Min xwest ku van bûyer û kesên ku canê xwe dane, yeko yek binivîsînim, lê mixabim min nikarîbû bianîya ziman. Di şexsiyeta Feyzo, bavê Îpegê de, şiroveya kilama ku dengbêjan gotine, min xwest şiroveya wê bikim. Kesên jîyana xwe ji dest dane, di şexsiyeta Mala Bişar û Seydo de. Bi teybetî Feyzo, bavê Îpegê de, ji Xweda rehmet, ên ku hêj jî ji bona çand û denbêjîyê kar dikin re serkevtin dixwazim.

Em keda dengbêjan ji bîr nekin, lewre romanên devkî bûn. Êş evîn û serpêhatîyên civaka kurd anîne ziman. Kesên ku Rehmet kirine ji wan re ji Xweda rehmet û yên hêj jî dijîn re, rojên şahî û xweşîyê dixwazim. Ger ku kêmasîyek di şirove û nivîsa min de hebe, ji mallbata wan û xwendevan lêborina xwe dixwazim. Bi rastî min di şiroveyên bûyeran de navên eşîr û 'kasên ku sixurî kiribûn' navên wan neanî ziman. Lewre sixurê wê rojê dibibe ku zarokên wan, têkoşerên îroyî bin. Hin kes jî têkoşin dabûn, bûne sixur û bêbav.

Piştî nasandina mala Bişar û Seydoka em li bendên kilamên ku li ser wan hatine gotin bixwînin û dure şirova kilaman bikin.

Bendên kilamê 1

Li min lolo, li min lolo dayê firarên me kanê

Têlo digot: Hedo xweyê xwezîya min,

Birojê di ewîlî.

Êla mala Bişar û Seydo birêketin,

Wekî caran di xemilîn

Çerxa mala Bişar û Seydo ji vir heya Mêrdînê nedişuxulî

Hînga min dizanî bû siuda wan çep fitîlî.

Şiroveya kilamê 1

Dema şînan de em dibînin ku hertim pîrek bi teybetî jî xwişk di şînan de li ser bira û xismên xwe, dilorandin û sitran digotin. Dibê bira xwezî min bi wan rojên di ewilî. Dema ku Feyzo bavê Îpegê bi tevî refên siwaran ve digerîyan, siwarên hespa û bi rext û girêdan bûn. Li serhedê heya Binxetê (Rojava) salixên wan didan. Lê çima? Çerxa mala Bişar û Seydo çep fitilî?

Bişewite mala xayin û sixurên navxweyî. Bi destên wan van xweş mêran çerxa wan çep fitilî. Ev ne bi tenê feleqa mala Bişar û Seydo ye. Her wisan çiqas tevger û serhildanên gelê kurd, têkçûna wan bi destên xayînen navxweyî ye. Têlo qala Kenan û Dewrêş Begê dike. Agirî, Gelîyê Zîlan û gelek ciyan bi singuyan, derguşan ji zikên dayîkan deranîbûn.

Benda kilamê 2

*Agirê xwida bikeve mala fesad û bêbextan
Li girê çîyayê Qilîcê xeberê didin,
Qumandar zalimê Kenan Paşa
Berevkin qolordîya Erzurumê
Heseqe û Qerekosê
Bila li hewara mala bavê min bihata,
Keremê Qolaxasî, Ferzende, berxê mala Emer
hey bira hey lo bira*

Şiroveya kilama 2

Dema ku qolordîya Erzurumê davêje ser wan, Têlo wiha dibêje. “Bila li hewara mala bavê min bihatina, Keremê Qolaxasî, ji eşîreta Zirikan bû. Ferzende Berxê mala Emer, Hesenî bû. Kerem û Ferzende bi tevî her wisan eşîretên wek Cibira, Hesena, û Zirikan piştî Şex Seid û Agirîyê bi Malbat û zarokan ve, berê xwe didin Îranê bal Simkoyê Şikakî. Lê bi sixurî û alîkarîya navxweyî û dewleta tirka, şahê Îranê bi bêbextî ji wan re dibêje: “werin bal me em ê mafên penaberî bidin we.” Bi wê awayê di hewşek de wanan gulebaran dike. Hin kes di

bin laşan de sax dimînin. Bi dehan keç, buk û dayîk balav dibin. Hin kesên ku rizgar bibûn piştê vegeerîyan Bakur, Serhedê qala serpêhatîya xwe dkin.

Dengbêjên herêmê kilama wan de”Axayo li min li min. Asya bang dike Besrayê “ Ev êş û derdê giran hêj jî berdeyam e. Bi gotinek bav û kalan: “Kurmê darê ji darê ye!”

Benda kilamê 3

Hey bira, hey bira hey bira,
Xwadê xirab bike, çetin e derdê biratîyê
Çîyaye bilind zinarên asê berfa serhedê
li birayê min nake sitarîyê
Hey bira hey bira

Şiroveya benda kilamê 3

Disa Têlo dibêje: Hedo we yê derdê biratîyê zor e. Bi rastî ji kuştin û bêbextîya ku li van kesan bûne, pirtir bala min dikêşîne. Kilam û sitranên hemû serhildêran, şînan û evînîyê de, jina kurd kilam gotine. Lê zilaman kilamên wan di civak û dîwanan de anîne ziman;

Bila dayîk û bavê min xêrê nebînin

Min nedane lawikê min dil tê de

Em di gazin û îsyana keça kurd de dibînin. Di zewac û bêdilbûna xwe çewan anîne ziman. Ji evîna xwe re gelek bibext û dirust bûne. Minak; kilama Gulê Bavê Fexîrya, Hesenê Mala Muso, Edulû Dewrêş, Xec û Siyaband, kilama Hekîmo, Lawikê Metînî, Gulê û Bişar. Em di şîna bira û pismaman de ji jina kurd çiqas xwedan çand û huner e, dibînin.

Benda kilamê 4

Têlo digot Hedo, Besê gulî birê,
Ez bi dîharê textê Qereyazîyê,
Avzêrkê diketim bi kevir e,
Donzdeh peyayê mala bavê min girtine
Miqabile,
Dengê top û topan têne giregir e.

Bila sira sibê lê nexista li bejna,
Elîyê, Feqî Silê Feyzo bavê Îpegê
Li timtêl û kondirê, gustîla tîyê de zêrê zer e
Qaşa di serî de tev cewher e
Hey bira hey bira hey bira
Şirove 4

Têlo dîsa hewar û gazî dike; çiya diketim, ji bona hewara birayê xwe, Lêbelê berf û serma Serhedê jî tengasîyek mezin bûye. Dema ku firar in ji Serhedê heya Binê berîyê û Rojava çûne. Firar tîn li devî Avareş cih sitar ji xwe re çêdikin. Bişewite mala sixuran teqibatê tînin ser wan. Feleq û oxira mala Bişar û Seydo naşixule. Sixur, Roma reş û demsala zivistanê. Bi gotina Aramê Tikran “Felek û yar li min bûne yek “ Bişewite mala ‘birayên’ xayîn.

Benda kilamê 5

*Têlo digo; xweyê ez bi diharê Qereyazîyê
Avareş diketim berfê lêkir
Hîn xayîn û bêbext siwar bûn,
berê xwe dane Qerekosê gilîyên
Bexê mala bavê min kir.
Dîn û îmanên xwedan xwe ji xwedê kir
Gilîyê Feyzo, bavê Îpegê, Elîyê -Feqî- Silê
Mihê Xelîfe kir.*

Şirove 5

Têlo dîsa hewar dike lê kes li hewara wan nayên.
Dema mala Bişar û Seydo li ser hesp û zînan bûn, ji felekê re digotin xwe bide alî. Gelo çima ewqas eşîret û peya hene, van serhildêran ewqas di tengasîyê de ne? Baş e alîkarîya wan nakin, lê çima? Sîxurîya dagirkeran dikin. Hewara Têlo ji ber vê yekê tê. Birayê mirov were kuştin, tilî û serê wî were jêkirin. Ji alîyê lawê Mawîye Yêzîd ve serê lawê Hz. Elî îmam Huseyîn jî jêdikin, jana dilê Têlo, xwîşka Feyzo

jî wek serjêkirina îmam Huseyîn e. Ez nizanim gelo xwîşka Huseyîn
ji wek Têlo êşa dilê xwe anîbe ziman?

Benda kilamê 6

Têlo dogot; Hedo Besê

Ka ji min re bêjin kê gilîyê mala bavê min kir

Birayê min kuştin serî û ji bona gustîla wî tilîyê jêkir

Xweyê berf û barana Serhedê lêkir

Cenazeyê birayê min di xwînê de sor kir

Tilya birayê min li ser berfê winda bu

Sir û sermê bir

Mala xayîn û bêbextan bişewite

Serê birayê min ji bona gustîla zêr tilya wî jêkir

Şirove 6

Di vê şirova mala Bişar û Seydo de, birîna nevxweyî dide nişan. Dibêje birîna birindarê mala bavê min nagire kewê. Heyran serê jêkirî ma çewan kewê bigre? Di vir de dide nişan di kilamên şer û evîniyê de jinan kilam gotine. Lê dengbêjên zilam sitrane. Di şînan û şahîyan de hertim kilam û awaz keç û bukan gotine. Bi sedan destan û kilam hene. Ez ji keda hemû pîrek, zilamên van ked dane yên jiyana xwe ji dest dane ji Xwadê rehmet û yên hêj jî çanda me berdewam dikin, bi nivîs û medya xwe ve ji tevan re serkeftin û rojên şahî dixwzim.

Hêvîdar im serê tu kesan neyên jêkirin bi biratî û aşitî bi hev re jîyan bikin.

Ji xewna bakîreyekê

(Çîroka Şeva Yekem)

Sîya Jandar

Cih: Ne eşkere ye. Dibe ku li ber singa kesekê an jî li dojehekê...
Lê ev doje ne bi destê Xwedê hatiye avakirin
Li vir Xwedê û xwedîtiya tişteke nîne...
Li vir karakter û xewn hene...
Li vir organzmabûna hîsan
Û mirin bi cih bûne...
Tu tariya odeyekê de di kurte xeweke de xerq bibû...
Li vî cihî tenê pejna te ya esmerî, pejna şevê ya esmerî û gorek...
Mîna ku refek qulingê ber bi sahraya bê av be
Devê min ji bûyîna min vir tîna qeliya ye
Ji bûya min vir ve eşek di laşê min de hatiye pêxistin
Ji êşa dîya min, a ji malzaroka wê afiriye hatiye girtin

Destpêk

Nav: Agil

: Dil

: Giyan

: Gor

Herkes wê rojek biqasî çiroka xwe biêşe û bibe xwedî eşek metafizik. Bibe xwedî valahiyê geometrik û zeyanden xesandî. Lê ev çiroka nexesandîye nû ve li ber singa te hatiye vejyandin. Di vir de hût û kund yekin.

Di vir de mahsî û çol bi hevûdo şad in.

Aqil

Berya ku ji vî kirasê ji agir rizgar bibim dibe ku ev kiras weke tofanekê bi laşê min ve bê pêxistin.

Min ji hemû haz û amûrên laş rizgar bike. Min bike yekê bêaîk. Mi ji ilmê laş azad bike... Laşê min ê ku weke keftarê ajalekê ji ber spermê bavê min afiriye. Bûye xwedî xwîn-goşt-tilî-aqil. (Belkî herkes transeksuel be, ji ber ku ev du zeyand ancax dikarin bibin xwedî afireniyerekê.)

Lê ancax ez bi van her duyan bikarim bibim ezê azad bibim. Rizgariya laş, an jî metafora ku mêrov bikaribe xwe ji bin nîrê dilgirtine azad bike. Hema dayika min, an jî gora min a yekem... Mêrov tim jiyana xwe li ser qewirandinê dimeşîn e. Dixwaze ji vê qewirandin rizgar be û azad bijî lê dê tu caran nikari be rizgar be. Lê mêrov bê vîn tê qewirandin û bê vîn dijî.

Di vê qewirandinê de a bi mêrov re tê; xwîn û hestîn, lê li vir hestêyarî nîne. Koşka xwepertine bê xwedîye. Serdestî û bindestî nîne. Li vir yekem qewirandinê de dayikeke bi êş û bavekê bi xîreta civakî... Bavekê ku bi spermê xwe ser bilind. Bavekê ku bi bûyîna zarok re xwe mêr dihebîne. Herkes bê vîn tîn dinê dê bê vîn jî biçin... Lê ez na, ez bê vîn naçim. Ez ê yekem caran bibim xwedî vîn û deriyê jiyane di ser laşê xwe ve bigrim.

Çavê xwe digrim ode dibe gor, jî dûr laşê te di tariyê de weke kabûsekê di ser min ve digre. Ez ê di vê taritîyê de bimrim.

Lê niha bi vî agirê ku di laşê min de hatiye pêxistin, silûetê laşê te li diwarê tenêtiya min xêz dike. Ji xwe tu hêza xêzkirinê yî. Tu ji

nişkê ve weke peykerekê antî ji wan nivîsan afirî. Xîreta min nîne ku dest bidim ku laşê te yê di rengê axê de... Ez ê tu caran neghêjim vê xîretê jî. Silûtên te li ber çavê min bûne reqase di tariya Odê û di tariya hişê min de... Dîreqîsin... Dîreqîsin... Dîreqîsin... Dîreqîsin...

Lê ez ê xwe tim bi çola laşê te bigrim. Ez ê tim ava ji laşê te ji xwe re bikim ava heyatê. Ez bi çawa bi ava canê dîya xwe bûm xwedî laşek, ez ê niha bi ava canê te bibim xwedî vîn, xwedî xwe. Ez ê di hembêza te de bibim mêr. Belkî bi mêranî bijîm. Ez ê xwe di tariya laşê te de azad bikim... Ez ê azad bibim... Lê ev azadî ne biqasî azadîya herkesî ye, ev azadî a xweseriya min e... Tu di taritîyê de ji min re xwedîtiye bike... Bibe xwedî laşê min... Bihost bihost laşê min ve hilbe weke ku tavehîva bi laşê şevê ve hil pêlik bi pêlik laşê min dagir bike. Bibe dagirkirina şev û laşê min... Ezê bimrim. Ezê di germahiya lêvê te yên ku bi laşê min dikevin de bimrim. Her ku tu bi laşê min ve hilbî ez ê gora xwe di hindurê te de bikolim. Ezê laşê te ji xwe re bikim bihûşt... Bikim mizginiya ku weke sehabeyên çav bi bihûsta

xwedê ketibin bê tirs di şeran de xwe davêjin ber şûran... Min xwe bi bihûsta nav lingê te girtiye. Min xwe bi bêhn pûngiya pirça te girtiye... De min bikuje... Agirê xwe di laşê min de pê bixe... Min bike agirgeha xwe weke sofiyekê di ilmê xwe de elimiyê ilm bûbe min ferî xwe bike... Ferî agirê xwe... Ez laşek im ku bi dilmayî hatime dergahên te. Min venegerîne ji vê rê yê. Min di malzaroka xwe de bike xwedî agir. Min bike zerdestê agirê xwe. "Hemd û sena" ji bo laşê te. "Hemd û sena" ji behn pûngiya nav lingê te... "Hemd û sena" ji te.. "Hemd û sena"... "Hemd û sena"...

Ev çend carek ku di şev de xwe bi pejna navê te digrim. Dibim lêgerîna tiştê kevnar. Dibim arkologekê ku ji bo rast bi antîqayekê were bi rojan erd kolabe û daviyê de gihiştibe miradê xwe, ez jî xwe bi pejna te, bi silûetê te digrim. Her ku ber bi te ve tîm, her ku nêzê pejna te dibim di ilmê hez kirin û lêgerînê de derdikevim asta nîrvana. Bi lêgerîna pejna te re organzma dibim canê xwe hîs dikim. Di nav canê te de nû ve şîn dibim. Kok vedidim... Min bike hembêza bakîretiya xwe, bibe

afirînerê min... Laşê min biafirîne. Min nû ve li hevûdo bîne. Min di malzaroka xwede nû ve bihebîne.

Lê tu bakîreyî bi qasî şevê. Tu nû ve bi laşê xwe dihisî... Tu nû ve ferî herûdo hinarê li pêşîra xwe dibî. Nû bi pirça navlingê xwe hisyayî... Lê ez ne nû me ji bo laşê te. Dema ku çav bi pejna te ketim vir ve dibêjim qey ji Adem û Hava vir de tu bi min re jiyayî. Bêhna te, pejna te, min xwe tim ferî van kiriye. Ev bi qasî dîroka xwedê ye, tu bûyî agir bi laşê min ketî. Bêhna pûngê a ku li nav lingê te diafirî.

Ax ev bêhn pûngiya canê te çiqas dîrokiye. Mîna dîroka pîramîdan, mîna klopatrayê ku nû derketibe ser textên firavûna, mîna lénêhrandina Nîl ê bi dîrokî.

Şev û tu agirin bi min ketine.

Min bike serşoya laşê xwe, min li vir de nû ve bişo ji bêhna malzaroka dîya min rizgar bike min ji vê şaristaniya qirêj rizgar bike. Min di şaristaniya laşê xwe de azad bike. Bibe şaristana siluetan bibe şaristan ji bo şev ê...

Dil

Ev ne milkê kesekiye. Herkes dikare ji xwe re bike berete, xwe lê bigre ber bi wê ve bibe rêwî û hewrî. Lê

herkes nikare bi aramî di deriyê wê re derbas û bibe xwedî wê. Ew qesra li pişt çiyayê qaf e, ew sandoqa di destê medûsayê ye, ew hespek kumête tim dixwaz e siwariyê wê di şer de be, ew edûle, derweş bi destê xwe dişîne mirine. Heya ku tu ji qesra dil qehwa mirinê venexwî ew tu caran aramiyê pêşkeşî dildarê xwe nake, ew xwedayekê binerde.

Axafina dil

Rast e, ez mizgefta giyana me, ez azadî xwazê giyan im, xwe bi azad berê hudurê min bidin, xwe azad berê hindirê min bidin, xwe azad bikin, dema ku hûn ber bi deriyê min ve hatin ji tu tiştî metirsin, tirs di deriyê min ve nikarin bikevin hundir, heke hûn ji xwe nizanibin teqez neyên ez we hilnagirim, we nakim xwedî hêzekê û hezkirinekê. Dema berê te ket ber bi min hewceye tu bikaribî bibî BÛDA, gerek tu agirê Zerdest di xwe de bibîn î û gerek tu bi qasî Manî di ilmê zanînê de azad bî... Ez dilim deriyê azadiyê, azadîxwaza dixwazim... Heke te xwe azad kiri bê ez ê te weke sofiyekê hilgirim mizgefta xwe, di hicreyên xwe de ferbikim. Ez ê weke heciyekê ku ji heca xwe vegeriya be te pêşvazî bikim. Ez ê

te hilbigrim, te bikim xwoşewistê xwe... Lê gerek tirs ji bo we nîn be, a wê demê were bibe sofiyê mizgefta min, bibe azadî xwazê mizgefta min...

Ev rastiya dilê a ku ji bo ez bi şev di nav vê tariyê de te bikim findek pêbixim û ji bo ku silûtê te li hember min bireqise, ji bo memik û qalçên te dihejin bi çirûska vî agir re. Ji bo tu bibî şev çiraya hîsê min min vexwinî vê lêgerîne. Min ji vê êşê rizgar bikim... A niha tu li ba min li ser singê min mîna qurtek av a ku piştî kuxikekê aramî didî min.

Ez rêwî me ji bihûşê hatime, ev çend hezarsale ku li vir qewirî me lê a şaş ev e ku bihûşt şaş ferî min kiribûn, xwedê derew li min kiribû. Ez hatime deriyê te ji bo xwe bavêjim bihûšta te, li vir de ji êşa laş û giyanê xwe rizgar bibim. Laş gira giyan e bi hembêza şevê de tu ji giyanê min re bibe gor. Min di vir de xwedî bike. Ji ber ku zanim gera li ser bejna te... A di nav herdû memikê te mina gera di nav baxçeyekê antîke... Weke xwedina ahîtekê ye ku ji ber destê zordestan rizgar bibû ji ber ku zanim weke ku dengbêje di asta deng zîziya xwe de desbasê asta erotîzmê be ez ê ji bi

laşê te û zîzbûna dengê de re di asta aramiyê de organzma bibim. Hew bê hemd bi silûetê memikê te şa dibim... Heya ku xwe dighêjim canê te. Pirça nav lingê te.

Giyan

Yanî rewestgeha dawî ez im, hûnê li min vegerin, çawa hun bê dil ji malzaroka dîya xwe hatin qewirandin hûnê vê carê jî ji wir bèn qewirandin. Hûnê bikevin sarinca qefesa min. Hûnê bibin beyanî li vir de. Cawa ku hûn beyanîyê der malzaroka dîya xwe bûn... Vê carê jî hûnê bibin beyanê qefesa min... Ez di laşê herkesî re cihê kurman im. Cihê rizandinê me... Nirxê rizandinê me...

Lê ev ji bo min neraste tu bi şevê re hatiya ji hembêza te germtir nîne tu gor û aramtir. Caran şev dibe weke heyva sêzdeh mehî, mîna destekê şeş pêçî... Tu jî weke heyvê tim li min zêde dibî... Li xwe mikurtêm, dibim xwedî xwe û şevê, dibim xwedî xwe û şeş pêçiyên xwe...

Dawî

An jî piştî fikrandina û axaftina te re a bi seatan niha çar elementên silûetê te li ber çirûsa findê li di odê

an jî di vê gora min a ku ez bikaribim xwe tê de bikujim civiyane...

Bi rasthatinekê ne eşkere rastê silûetê te hatibûm. Mîna ku kesekê di çolê bê av mabe tu ihtimal nemabe ku bîreke avê bibîne dê di nişkê ve ji pişt qûçen qumê kerwanek derketibe û avê dabe wî. A min jî wisa bû tu ihtimala min bi rast hatina te nemabû lê tu nişkê ve bi silûetê rastê min hatî. "Hemd û sena" ji silûeta te re.

Ev giyan êdî di laşê te de ye. Bi laşê te re şevê hilhatiye... Xwe di xewnê de ferî laşê te kiriye.

Laşê te ku jê re bûye dergê û cihê xwezaniyê... Ez ê spermê xwe ji bo te bikujim, ezê cavên te bikim qiblegeh di hembêza şevê te. Di qemeriya memikê te de bighêjim...

Şewata findê û bi derbasiya şevê re her diçim ji xwe derbas dibim... Bi her diçe silûetê te nêzê min dibe. Zêdetir di kurahiyê te de xerq dibim herêdu memikê te û behna pûngê a ku ji nav lingê te difure yek bi yek ew tayên pirça te, her dicin bandorê li ser min dikin. Silûetê te nişkê ve bi xwîn û goşt digre... Ji kaniya bêhna te vedixwim. Naxwazim bêhna te derê der ve ji ber ku ev dinya bêhna te heq nake... Ev oda ev şev bêhna te heq

nakin... Memikê te dibin kevirê Hacer'ûl Esved dixwazim hemû diayên xwe li dor wan bikim...

Lê ez ê xwe bavêjim vê bîrê.

Di hemû silûetan de xeyalek heye... Di xeyalan de silûetek heye.

Ez û tu du rebenin, ji şevê re bûne mêvan, tu silûetekî, ez silûetekim li ber tîroja heyvê, li bin bê baniya esman rastê hevûdo hatine, em şaristan in, tu şariştan î... Tu xewa dawiyî, tu yê bibî dawiya min. Min bi pejna te sond daye agir, min bi pejna te hêstiyarî daye agir, min bi sewta te soz daye giyan, min bi bêhna pûngê a ji nav lingê te de difûre soz daye gorê û di nav lingê te de bibim xwedî gor.

Em du laş-du giyan in, mîna ku mahsiyê li ser avê bişimite ber bi hevûdo dişimitin, xwîdan û xwîn, bêhndayîn û bêhn... Lê çavên te yê reş, gerdena te a ji ber çakûçê xwedê bi hunerî li hevûdo hatiye.

Em du laş in.

Ez ê xwe di malzaroka te de bi cih bikim, ez ê tîbûna xwe bi xwîdana te bişkênim a ku ji bihûstê...

Lê xewn miradê koran e, ez û tu xwe nû ve ferî korbûna xewan di-kin, weke ku tu nû bi memikê xwe hisyabî, mîna ez nû bi mêraniya xwe hesiyabim. Ez ê mîna çavekê ku bi tirs heyva sêzdeh mehî binê re li gerdena te dinêr im, gerdena te a şif tazî. Tu jî nû bi xwe dihisî tu xewar î, tu taziya. Tu bi canê xwe dihisî nû ve.

Em korên xewan e... Tu li ser qefesa min bêhna baqe simbil, gihîştî û esmer î... Ez pale li dor firîkên te, xwe bi laşê te nû dikim. Tu mahsiya ser singa minî, çirokekî ku min xwe pê girtiye her diçe ber bi te ve tîm. Silûetê te her diçe ji çirûska findê diqete. Dibe komek agir xwe ber bi min ve berdide... Tu bakirya agir î... Tu bi qemeriya xwe mîna kirasekî li şevê hatiyî, bi qasî şevê bakîr î, tu kirasî bi şevê re... Ez jî ji vî kirasî afiriyî me... Tu qemer û bakîr... Tu silûet î...

Sandoqa xeyalan

Dilan Kaya

Li gorî gotina dîya min. Navbera min û xwîşka min xecê de şerekî qedîm hebûye. Ji ber ku ew bi temenê xwe ji min mezintir bûye nexwastiye ku ez bibim temen.

Tê zanîn ku dilê zarokatiyê dilekî xav e, belkî wê hîs kiriye ku ez binim dîya min dê wê ji bîr bike, an jî şîrşetî bike.

Lê niha vedirim û li ser xwede diponijim xwezil xwîşkê ew daxwaza te bihata cih û ez ji hêlîna xwe neqetiya ma- ji malzaroka dîya xwe dûr neketa ma.

Hema hebûn û tinebûna min di vir de biqewimiya û di vir de bidawî bûya.

Dê di nav gotina de xecê carekê gotibû; min ne ji bo şîr wisa dikir, min ji bo hez kirina dîya çavnebarî dikir, min nedixwast ku hez kirina dîya min bûbe du perçe.

Xwîşkê, delalê belkî ez wê demê kabilê rizqê te bûm.

Û birahîmê emrê te.

Ji xwe hemd ji bo xwedê ku

dîya min guh nedabû çin û tu mêjand û mezin kir.

Min fehm kiribû ku hez kirin zihmetiye, heya berdêla xwe negre tu carî xwe naxemilîne di dilê kesekî/ê de.

Dê dilê min pite pita tirsê bû, minê jî rojekê ji kesekî hez bikira, dê gola minê ji bo hez kirina xwe çî berdêl bida.

Wextê em li bin mêzera dîya xwe de rûdiniştin, dîya min behsa zarokatiya me dikir.

Digot; Zelêxa îja tu çiqas bedewbû. (destê xwe dida serserê min û maçek ji porê min digirt û berdewam dikir)

Ji ber bedewiya te hemû şîrîkên min çavnebarî dikirin, gilîyên min dibirin çem xasiya min ku bila ew ji min re hêrs be û gotina ji min re bibêje.

Ji xwe hatina min hem ji dîya min re êş bû hem jî ji bo xwîşka min xecê hevparkirina hez kirinê bû.

Dê dîya min reben çî bike,

qey bi destê wê bû, rebenoka dîya min heke hêzeke wê wisa hebûya dê hertişt bi bedewî biafirinda.

Navbera min û xecê de çend sal hebûn ji ber ku dîya min zar neanîne demekê, piştî ez çêdibim dîya min bênavber çend zaroka tîne.

Ew jî yek bi yek ji bihûšta xwe diqewirin û dibin sêwiyê wê dinyayê, weke min û her merovên din.

Êdî ez û ew em bibûn sêwiyê yek zikî, me maka bextewariyê wenda kiribû.

Ji xwe li gorî baweriyên teva jî em berê bextewar bûn, rojekê em ji warê xwe hatin qewirandin-bihûšta me bû dojh- bextewariya me bû êş û elem, derd û keder.

Dema ku em xwe hisiyên, êdî mayîna me a di mal de kêmtir bû, em di nav gund bi gavan re gavan- li çolê bis şivan re şivan bûn, em bûbûn qereçî li çol û gunda ketibûn.

Dê mal wêran meyê çî zanibûya em ê rojekê bûbûn qereçiyê emrê xwe û postê laşê mê dê bibe dahol û emê li ber bireqisin.

Ew kenê ku di devê me de weke şevên payîzê dirêj dibû

dê rojekê veguhire û bibe şevê havînê û nişkêve biqede.

Her ku em bibûn barê li sar milê bavê min jî zêde bibû-xîzanî, neçarî hatibû pêsîra bavê min de hêlîna xwe çêkiribû.

Dîsa di şeveke payîzê ên dût û dirêj de bavê min em zarokên xwe li dora xwe civand û behsa çûyîna xwe kir.

Dê biçûya dûriyê, ji bo ku bi-xebite û me ji vê xîzaniyê rizgar bike.

Her wiha bavê min yek bi yek ji me xatir xwast û çavên me maç kir û dawiyê de soz jî da me.

Got; soz be dema ku ez vege-riya ezê tiştên herî xweş û bi qîmet ji were bînim, û belkî ez ji xwe re erebeyekê jî bikirim û we lêbikim li nav gund bigerînim.

Me jî soz dabûyê heya ku ew vegere emê zêdetir mez û xweşik-tir bin.

Dê me çî bizanibiya ev dinya warê malwêraniyê ye- ew kone ku tim der û dora wê bûm dixwînin.

Bavê min çibû û gelek sal li ser re derbas bibû dê ew venegeriya bû, em xwîşk û birayan me sozê xwe girtibû û em mezintir û xwe-şiktir bibûn.

Ez êdî nû bi nû ferî hezkirine-

ke çûda jî dibûm, ji bilî hezkirina bira û xwîşkan û dîya min- min ji yekê beyan jî hez kirî bû.

Ew ûsiv bû. Gundî û cîranê me û hez kiriye min. Em hê zarok bûn dê xeyalên me yên pêşe rojê gelek bûn. Ûsiv digot; “Ezê rojkê te ji xwe re bixwazim.”

Belkî zarokatî bi xeyal dibe zarokatî- em jî zarokên xeyalpe-rest bûn.

Min bi xeyalî xwe dixemilan ûsiv jî temboliya xwe şe dikir.

Dibû zavayekê lihevûdo hatî, ez dibûm zîna zêdan û ji memê alan.

Dê xeyal jî heya cihekê bûn, min digot Ûsiv dema bavê min vegeriya û ez siwarê erêbê kirim bi soz be zewaca min û te dê bi qewlê peyamber û xwedû li me be.

Bavê min vegeriya minê zêdetir ji ûsiv hez bikira, bavê min vegeriya ez û ûsivê biketina bihûştta zûleyhayê.

Bavê min vegeriya.

Bav ji bo me bibû xeyal, ji xwe me erebe jî ji bîr kiribû, em mezin bibên.

Dîya min a ku weke xezalekê roj bi roj mehiya bû, ew ber çavên me heliya bû û bi laşê xwe piçûktir bibû.

Weke ku xezaleke çiyayî bû berê dîya min, niha di qefesa bêrikirin û neçariyê de dîl mabû.

Rojekê bapîrê min wiha goti bû; “dema emrê merovan mezdi-be, bi laşî jî piçêk dibe” ew dem em zarok bûn û me fehm nekirî bû. Niha dema ku dîya xwe dinhêrim fehm dikim ku goti-neke çiqas rast bû. Ji xwe bapîrê min jî bi bêrikirin û meraq bavê min de mirî û çavên wî di zirzeya derî de mabû, ku bavê min ê we-re û dê lawê xwe dîsa bibîne.

Bapîrê min dema ku mir teyîba xwe jî da dîya min.

Gotibû; “roja ku kurê min ve-geriya vê teyîbê bide wî.” A rast ereba me tine bû dê teyîba me hebû êdî.

Êdî dîya min derd û kulê xwe ji teyîbê re digot û li ser teyê bê de digot û dilorand, ew teyîp bibû êşa bavê min, xeyalê bavê min û li ber çavên dîya min sekinî bû.

Dîsa rojekê ber êvarekê de dîya min teyîb ji jor de anîbû xwar û bandek ji nav bandan hil-bijarti bû û kiribû cihê wê.

Dema ku deng ji teyîbê derke-ti bû, deng ji dîya min jî derketi bû. Dîya min hûre hûr hêstirê xwe lorandi bû ser teyîbê de.

Di nav wî dengî de dîya min bibû xezaleke ku bi tîrekê birîndar be çilnisî bû hevûdo.

Her ku hêstir ji çavên dîya min hatibû ez jî eşiyabûm- min jî di nav tariyê de lorandi bû.

Dê min dîsa jî fehm nekiribû ku dîya min çima evqas li ber wî dengî û wê stranê giriya bû.

Heya ku rojekê ezê rast bi wê stran û çîroka wê bihata ma. Dîya min e rebenok li ber serê teyîbê û di nav wî dengî de heliya bû

Ez jî êdî li gor edetên gund êdî xama bûm, temenê min gihêştî bû 15-16 saliya, ev temenê zewacê bû, lê dil wî temenî de tine bû tenê edet û bîryara mezinê malê hebûn.

Ûsivê min jî mezin bibû, hez kiriyê zarokatiya min. Rojekê ji min re got; “Zelêxa em ê te bixwazin.” Min jî bi dil şadî jê re got; “Werin Ûsivê min, ji xwe ez çî bikim temenê bê te.” Ji xwe bavê min jî venegeriya bû di ser me de.

Xecê jî mêrkiribû firyabû ji hêlîna xwe, kesekê ku êdî ji hez kirina min û dîya min re çavnebariyê bike jî nema bû.

Çend roj şûnda malbata ûsiv ji bo riya mala me ji dîya min destûr xwastin.

Dîya min ê dilbirîn bi dilekê nerm û gotineke şêrîn got; Dîya min got ser çavan kerem bikin û werin. Dîya min kedkara emrê min bû. Bi dengê fîqa erebê re em ji xew şîyarbûn, erebeyeke sipî li ber deriyê hewşa me sekinî bû, weke bûmê wêranîyê tîte tîta wê bû.

Bi banga dîya min re em ji mal derketin ku em binêrin ka ew kî ye?

Bûye bûme xewên me, nehîşt em bi aramî razên.

Dema em derketin dev re, me dît ku bavê min ji erebê peya bû.

Ji xwe min ew nas nekir, ew bavê ku ji zarokatiya min mavûne ev bav bû.

Yekî kal û rû û por spikîrî bû.

Ew kal bûbû, ez jî ciwan.

Dîya min a reben bi şermî xwe gihand bavûlê bavê min hilda û qêrek da min:

- Qîzê belkî mirazê te di çavên te de bimîne, ka were bavolê bavê xwe bigre.

Dîya min yekem car bû ev nifira li min kiri bû “miraz di çav de mayê.”

Bi gotina dîya xwe re, min xwe gihand bavolê bavê xwe ji destê dîya xwe girt û berê xwe da hundirê malê.

Piştî xwarin û vexwarinê, mi-
jar bû mêrkirina min, li ser sofrê
dîya min behsa Ûsiv û malbata wî
kir. Bavê min bi hêrs got; ew çi
kuçik in, ez qîza nadim kûçikan.

Xwîna laşê min sar bû, Ûsivê
min niha di nav gotinê bavê
min de bûbû kûçik. Dîya min jî
matmayî mabû, deng jê derneke-
ti bû. De dilê min bûbû tênûr û
agir pê girti bû.

Bavo!

Ez qurbano neke agirê tênûra
dilê min gur neke.

Ji çûyîna te vir ve ûsiv bav û
hezkiyê min e

Ez û ew em di xeyalan de li
erebê siwar dibûn li nav gund di-
geriyan.

Ji ber êşa bêrîkirina te min bi
hezkiyê Ûsiv berxweda.

Bavo bi hêrs ser dîya min de
vegeriya û got: “Ez ê wê bidim
hevalê xwe, min soza mêranyê
dayê.”

Agir bi dilê min ket, laşê dîya
min çilmisî, ez çilnisîm. Sofra
xwarinê li ber me bû goreke bê
binî ez û dîya xwe ketinê.

Rojek ber êvarê bavê min bi
kesekê nenas re derket û hat.

Bavê min gazî min kir; ev êdî
mêrê te û zavê min e.

Dilê min lerizî, çavê min reş
bû, min xwast biqîrîm, lê min
nikaribû deng bikim, ez di cihê
xwe de bêdeng giriyam.

Dîya min ji bavê min xêr
nedîtî bû û niha jî ez nabînin.

Piştî van bûyeran dîya min
dîsa derê sandoqa xwe vekirî bû.

Teyîp û qasê jê girt û kete nav
kefenê xeyalan.

Ji xwe min jî êdî ji stranê fehm
dikir. Dîya min dîsa bûbû rebena
ber destê bavê min.

Bavê min ez jî kiribûm rebe-
noka sozê mêranyê xwe. (Min ê
êdî tu caran ji ereban hez nekira)

Stran: Genç Xelîl

De lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê
Hefsê dibê yane bi Xwedê dilê mi gellekî wane
Hefsê dibê yane bi Xwedê dilê mi gellekî wane
Genc Xelîl kurmamê min li welatê xerîban û xurbetê gellekî nexweşe
Wezê rabim livîna rayêxim ket ketê naz balîfa bidime pale
Ezê rabim kemera ji piştta xwe
Bişikênim bo hespê Genc Xelîl bikime nale

Bazinêt xwe bişikînim bikime hûrde bizmare
Biskêt xwe bibirim bikime sereşma ser çav
Bikime tok û serhevsare, Genc Xelîl bînim siwarbikim li kimêtekî tale.
Belê ev nîşan bila di nav Osmanîyan de bête xware
Nav kesmam û kurmamê mi nekin,
Belê nebêjin siwarekî Kurde, çendî bê kar û bare
Nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê,
Nemayê, nemayê,... de li paşo Genc Xelîl
Kurmamê xwe nemînim dilo li dinyayê
De lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê were lêlê
Genc Xelîl hema çavê xwe bilindkir û bi xerîbî digirîya, ê nefeseke
Qelûnê xwastîye, Hefsê dibê ya rebî bi Xwedê rabim qelûnekî bo
Kurmamê xwe têkem, qelûnek zêrnîşane baskê Stembolê modêne bi
Karebane, pelekê darê darberu bînim bi mişarê bibirim, mivreda(?)
Qeretani bînim li ser qelûna Genc Xelîl kurmamê xwe danê nemayê,...
Belê bêm kurmamê min heft sal e ketîye ser destûrê Romîya bi tirkî
Buyrun efendim qelun ji tera,
nemayê, nemayê, nemayê, nemayê, nemayê,

Çavkanîya stranê: Kawîs Axa

Rojnivîsk-1

Bêrîvan Keskîn

Li ser textê razanê, li ser piştê dirêjkirî raza bûm. Mîna ku hemû sirra dinyayê di ew banê spî de be, min bi saetan li banê odayê dinêrî. Dema min li ew banê spî sêyr dikir, ji min were li banî bi dehan çerx dizvirin, çerxên saetan. Çerxên ku bi heman tempoyî li dora xwe dizivirîn û bi xwe re yên din jî dizivirandin. Çerxên zemên yên şev di rojê werdidan.

Di nava fikaran de bûm. Min xwe, li ser textê razanê, di cihê xwe de zivirand ser milê çepê. Çongên xwe kişandin zikê xwe. Dema min li neynika ku bi dîwêr ve daliqandî bû li bedena xwe ya westiyayî, li pora xwe ya ji cênîkan ve spî bûyî temaşe kir. Jîyan bi min mîna saetekê mezin a kû beden û ruhê mirov di wan çerxên xwe yên mezin de dihêrandî hat. Jîyanê jî extîyarî di ciwanîyê werdida. Berê giyanê mirovan di nav wan çerxan de dihêrand, piştê jî bedena mirov dihêrand.

Çerxeka saetê bi dehan çerx bi xwe re dizwirand. Lê çerxa zemên? Cudahîyek di navbera çerxên

jîyanê û çerxên saetan de hebû. Dema çerxeka saetê radiwestî yên din jî pê re radiwestîn. Çerxên jîyanê ne wisa bûn. Jîyanê, cihê çerxa rawestî zûtirîn dadigirt. Dema li vî bajarî mirovek dimir li bajarekî din mirovekî din diwelidî.

Bi çingînîya jinişkeve li nava malê belav bûyî re çerxên zemên yên gêja min birî jî belav bûbûn.

Ji odeya yal, dengê saeta par min ji kevnefiroşekî sitandî, bilind dibû. Dengê saeta rengzêrîn û dora wê bi çînên gula neqşkirî, li nava malê olan dida. Li ser saetê, di nava qelebalixa çînên gulan de xaçeka biçûçik a mîna xezaleke bizdok a ku xwe di nav dar û devîyan de ji direndeyan vedişêre, neqşkirî hebû. Ev saeta ku berê mala xaçperetsekî dixwemilandî îro jî mala min dixemiland! Xwedê dizane, ka xwedîyê vê yê berê bi çi hêvîyan li benda lêdana vê saetê mabû! Di guhê çend kesan de olan dabû dengê vê saetê? Çend emr hêrandibûn çerxên vê saetê û ya hîn çend emrên din biherîne?

Îsmaîl Lawo

Bilal Celebli

Îsmaîlê Qadirî Kuri (Îsmaîl Beştepe) ji gundê Tapekê (Tepeköy-Têrika) girêdayê Heymanê ye. Li sala 2018an li kezebê kula neçê derket. Li Enqerê di nexwaşxanê de 9 mehan tedawî bû. Lê dermana fêde nekir. Li sala 2019an wefat kir. Xwanga wî, Têlîyê li şînê kilameka bi xem û xembar got. Min ew kilama berhev kir. Xwedê rehma xwe lê bike.

Enqerê bişewite li me wê da
ez a arekî vêxim pê da pê da
xwe dikim qurbanê nexweşxanê mêrat de
qardeşê min î gencî tê da

Lawo lawo Îsmaîl lawo
xwang qurbano, xwang westîyo

Keçê ez rawûm ser xwe şevda
min gundê Tapekê gîştik tevda
gundo gundo!
min Genç Îsmaîl nedî di navda

Keçê kûr biyê! Mala qardeşî min li neqewê
anê anê spî dikê mîna şevê
feleka xayîn here ji min dûr be
te nego Îsmaîlî biçûk e, çêlikê xwe nakevin xewê

Min go keçê kûr be, çî ye çî ye
ez herim ku ji dest min tişt nêye
ez li dîyarê malê kekê ketim
qardeşê min î gencî îsal li nav birayê xwe tunne ye

Lawo lawo Îsmaîl lawo
xwang qurbano, xwang westîyo
Seda rawûm arekî dagirim bira dûke
Zûke zûke anê zûke
keçê qardeşê min î hîn pir biçûk e
ne lawikek zewicand, ne keçikêk kirî bûke

Keçê ez rawûm ser xwe siwê zû da
dîwarê mala kekê ketim, mala Îsmaîl maye mij û dûda
xwang kûr bin, dest qardeşî min biçûk medin
giran giran herin bi rû da

Min go anê ware min vê qederê
xwanga rezîl qeder daye ser qêderê
keçê maxê malê te cahîl e
xwanga rezîl nikare heqê te biderê

Min go besse besse bira besse
va feleka xayîn îsal li me çi pir kir hewese
min go feleka xayîn wê da dûr min here
te ne go Îsmâil biçûk e çêlikê xwe nawin vêkes e

Lawo lawo Îsmâil lawo
xwang qurbano, xwang westîyo

Anê diwêm sêwî ber dest in
qurban li ber qapîya dadiwestin
hetak delalî Îsmâil nanekê bi destdin
xwangê rezîl juni diwestin

Banî banî keçê banî
jur ra çêm e bin ra kanî
xwanga rezîl nehe mene tevnek danî
ji kula ser cîgerê ra çarêk nanî

Xwang qurbano şev e, şev e
işiqê Enqerê geh reş diwin geh vêdikevin
nehe mene min Elî kire şofer, Bahattîn xedem e
Ecewîto bû çiftçi şivanê te
çima çare tişteki tunne

Lawo lawo Îsmâil lawo
xwang qurbano, xwang westîyo

Min go warê min vê qederê
kevirek hatî ber tekerê
nizam mala kekê pîsnefs ketê
nizam hatin nezerê

Keçê qe qardeşê min nemirîye
hem rençber e hem çiftçi ye
qardeşê min li ser terla xwe raketîye
xwangê xwe dixapîne, dixapîne

Lawo lawo Îsmâil lawo
xwang qurbano, xwang westîyo
nehe me ne xwang nema yo
xwanga rezîl qet nema yo

kirîna rexneyî
logik
di jêra xelas neke

ji bo çandîna
gulîlkan
ax pêwîst e

ahmaxeki
derîyê bê merdiwan
şelafî

Quto

Seyfi Doğan

bihar e
ji axê bi ducana
bînê barûtê tê

Kijan
berçavkan
di çavên xwe kim


wexta ku
roj çû ava
sîyên wenda bibin

çemên kûr
avê xwe namiciqe
roja teze

hîva nû
qayîxa
asûman

bayî biharê
axê zîya berbat dikîye
kevirê giran

mala derewîn
li kevîyê rê
rojên kut



"Kürt Kimliği Mücadelem"

Nasnameya kurdî û tekoşîna min

Ikram Oguz

Zagonêk ji zagonên dagirkerîyê ye. Dagirker dema ku welatek dagir bikin, wek gava yekemîn zimanê miletê ku li wî welatî dijî, qedexê dikin, dûra jî bi çand û hunera wî ra, bi kok û dîroka wî ra dilîzin, ku wî bipişîfînin û ji kokê va biqelînin.

Dewleta tirkan jî li Bakûrê Kurdistanê gor vê zagonê tevgerîya û wek gava yekemîn zimanê kurdî qedexê kir, dûra bi çand û huner, bi kok û dîroka kurdan ra lîst û hê jî dilîze...

Dagirkerên tirk bi dizî û çilpizîyeke bêpîvan kilam û stranên kurdî berhev kirin, ew wergerandin zimanê xwe û tapuya wan li ser navê xwe qeyd kirin.

Bi sîyaseta ku hîmê wê li ser red û înkarkirina kurdan hatîye avêtin, bi berevajîkirina bûyer û belgeyên dîrokî û bi zilm û zordariyeke bêsînor li tunekirina serê kurdan gerîyan.

Bi armanca avakirina civa-keke yekreng û yekdeng, bi pergala civakê ra lîstin. Bi derxistina *Qanûna Yekgirtina Perwedeyîyê*

va zarokên kurd ji perwerdeyîya bi zimanê xwe yê zikmakî bêpar man û bi zimaneke bîyanî hatin pişafatin.

Lêbelê wek çeka ku di destê xwedîyê xwe da biteqe, fêl û fêlbazîya dagirkeran jî gor daxwaza dilê wan neçû serî û di nivî da ma. Ew zarokên kurd ên ku li dibistanên dewletê û ji alî zimanva hatin pişfatin, di heman demê da ji hebûn û dîroka gelên cîhanê hayîdar bûn. Di wê dîrokê da xwe jî dîtî û li kok û esaleta xwe ya veşartî gerîyan. Bi hiş û hişmendîyeke têkûz, li dijberî zilm û zordarîya dagirkeran derketin, bi bîr û bawerîyeke xurt û bi belgeyên dîrokî fêl û fêlbazîyên wan pûç kirin û hê jî dikin.

Ji wan kesan yek jî bêguman lêkolîner û nivîskar Mehmet Bayrak e, ku ew jî di vê pirtûkê da bi berfirehî qala çîroka tekoşîna xwe ya ji bo nasnameya kurdî kirîye, dike...

Ev pirtûk jî wek pirtûkên wî yên din ji alî weşanxaneyê *ÖzGe* va, li Enqerê hatîye çapkirin û 712 rûpel e. Naveroka wê, ji wêne û belge, ji nivîs û xweparastinên wî yên ku di dadgehên dewletê da kirîye, pêk tê.

Wî çawa dest bi tekoşîna ji bo nasnameya xwe ya kurdî kirîyê, di wê pêvajoyê da rê û dirbên ku li ber wî hatine girtin, astengîyên ku derketine pêşîya wî, zext û rextên ku lê hatine kirin, hemûyan bi bûyerên jîyayî û bi belgeyên dîrokî va li ber çavan radixîne û yekoyek vedibêje...

Di pêşgotina pirtûkê da jî ew bi kurtayî tîne ziman, ku sedem kar û xebatên wî yên di warê kurdolojîyê da, zexta û rexta ku ji alî dewletê va lê hatîye kirin, ti car kêma nebûye û herdaîm kudîyaye.

Loma ne pêwîst e, ku ez di vê nivîsê da qala hemû bûyer û belgeyên di pirtûkê da cîh digrin, bikim. Lê dixwazim li vir qala bîranîneke xwe bikim, ku ew jî bi mijara vê pirtûkê, bi taybetî jî bi pêvajoya weşana *Özgür Gelecek* va giradayî ye.

Dema ku ev pirtûk gihîşte destê min û min bi kêf û kelecana li berga wê ya pêşîyê temaşe kir, çawa ku bi straneke dengbêjan ra mirov xwe di nav deşt û zozanên welatê xwe yê rengîn da bibine, min jî bi dîtina wêneyê bergê va xwe li Stenbola xopan dît û di nav bîranînên xwe yên wê demê da wenda bûm...

Dawîya salên 80î, di ser darbeya leşkerî ya 12ê Îlonê ra jî sal û demsal derbas bibûn. Bi destpêka darbeyê ra kurd û tirk ên ku hatibûn derdestkirin û di bin lepên dewletê da pelixîbûn, ji wan bi deh hezaran kes hê di heps û zîndanên da dinaliyan. Herwiha yên ku ji dest û lepên dewletê filitîbûn û xwe avêtîbûn welatên bîyanî, ew jî ji welat û hezkirîyên xwe dûr, di şert û mercên koçberîyê da ber xwe didan. Bi seranserê xwe va Tîrkiye bibû zîndaneke servekirî, civaka ku bi salan bêdeng mabû, hêdî hêdî ji binî va dikelîya, ji tirs û xofa domdar difiltî û deng dida.

Di dem û rewşeke wusa da wek çend keç û xortên kurd, me li Stenbolê komeleke çandî damezrandibû. HKD, bi navê xwe yê tirkî, *Halk Kültür Derneği- Komela Çanda Gel*. Çîroka damezrandina vê komelê jî çîrokeke kûr û direj e. Lê mijar ne komel e û bila çîroka wê jî ji nivîseke din ra bimine.

Di heman deme da Mehmet Bayrak jî li bajarê Enqerê dest bi kar û xebateke pîroz kiribû. Wek xwedî û edîtorê wê yê giştî, bi navê *Özgür Gelecek*, kovareke

mehane ya sîyasî û çandî amade dikir û diweşand.

Jibo rêvebir û endamê komelê navê **Mehmet Bayrak** navekî bîyanî nebû, me navê wî ji kar û xebatên wî yên berîya 12ê Îlonê jî bihîstibû. Ji dûr va be jî me hemûyan ew nas dikir, pêşwazî li kar û xebata wî ya pîroz dikir û dişopand.

Jiber ku me kovara *Özgür Gelecek* û weşana wê jî gor nêrînên xwe yên sîyasî ji xwe ra nêzîk didît, piştgirîya wê dikir û jê ra dibûn alîkar. Bi weşana her hêjmarê va, me gor hêz û quweta xwe kovar dixwest, ew li Stenbolê belav dikir û difiro.

Di wan salan da çapkirina kovar û pirtûkan jî, qasî amadekirin û weşana wan pirsgirêkeke mezin bû. Kovar û pirtûka ku bêhna kurd û kurdayetîyê jê bihata, her çiqas qedexe neba jî, ji tirs û xofa dewletê ew ji alî çapxaneyan va nedihat çapkirin.

Qasî ku tê bîra min, piştî weşana çend hêjmaran, li Enqerê derfeta çapkirana *Özgür Gelecekê* êdî nemabû. Ji bo ku kovar di dema xwe were çapkirin, Mehmet Bayrak jî hatibû Stenbolê. Ji bo çapkirina her hêjmarê ew li

çapxaneyek digerîya, em jî di dema çapkirinê da dibûn alîkar, ku me kar û barê wi yê giran û astengîyên ku derdiketin pêşîya wî, bi çavê sere xwe didît.

Wê demê li derdora me jî hinek kesên ku xwe wek sîyasetvan û rêvebirên giregir dihesibandin, peyda bibûn. Ew di kuncikên tarî da, bi peyv û gotinên tûj û tund diaxifin, lêbelê dema ku derbiketana kûçe û kolanan, ji sîya xwe jî diketin şikê û vediciniqîn.

Cihê ku ji bo xwe ewle didîtîn û li cem kesên ku bawerîya xwe pê dianîn, xwe rêvebirên binerd, xwedîyê kar û barê giran nişan didan. Bi vegotina çîrokên ezber, mêranî û mêrxasîya xwe derdixistin pêş, kêmasî û newêrekîya xwe vedişartin. Lêbelê kesên ku wek Mehmet Bayrak kare weşangerîyê dikirin û tekoşîneke bêhempa didan, kesên pasif û ji rêzê, kar û xebata wan jî piçûk û sivik didîtîn.

Ew ji sîya xwe ditirsîyan, jiber ku kes nebine, rîya xwe dirêj dikirin, di nav kûçe û kolanên teng ra difitilîn û xwe diavêtin komelê. Dûra bi şêwaza kesên ku di ser pozê xwe ra mêt û mêrxasek nabînin, diaxifin û ji me ra digotin; *“Özgür Gelecek di weşana xwe*

da qels e. Mehmet Bayrak jî ji bo ku nekeve heps û zîndan, di weşana kovarê da zîmaneke nerm bi kar tîne. Dema ku hat komelê, hûn bi tundî wî rexne bikin, ku bila ew zîmanê xwe yê nerm terk bike. Di nivîsên xwe û di weşana Özgür Gelecekê da tûj û tundîyê derbixe pêş, ku bayê me jî di nav kûçe û kolanan da lêbixe û olan bide...”

Ji alî dewletê va Mehmet Bayrak kurdekî xeternak, ji alî hinek sîyasetvanên kurdên ku ji sîya xwe ditirsîyan jî mirovekî pasif dihat dîtîn. Ji alî dewletê va ew di heps û zîndan da dihat darizandin, ji alî hinek kurdan va jî ew dihat rexnekrin.

Tevî vê nakokîyê, hinek gotinên tûj û tund, li me jî xweş dihat. Loma dema ku bihata rojevê, me jî bi dilê xwe yê pak û bi mebesta xwe ya paqij, helwesta Mehmet Bayrak û zîmanê ku wî di weşana kovarê bi kar dianî, rexne dikir.

Jiber ku em wê deme xort bûn, xwîna me dikelîya... Me aqilê xwe danîbû alîkî, di nav xewn û xeyalên şoreşgerîyê da, bi kelecana dilê xwe tevdigerîyan.

Li alîkî şerê çekdarî dest pê kiribû, li welat... Dengê ku ji

lûleyên keleşan derdiket û li serê çîya û banîyan bilind dibû, di nav gund û bajaran da olan dida...

Li alîyê me jî, “kovareke mehane û weşana wê ya bi zimaneke nerm”, têra me nedikir û xewn û xeyalên me yên wê demê nedixemiland...

Çima ev mînak û Mehmet Bayrak?

Ji wê deme pê va têkilîya min û Mehmet Bayrak ti car neqetîya, di herdem û di her rewşê da, bi hez- kirin û rêzdarîyeke taybet kudîya û hê jî dikude.

Di vê pêvajoya dûr û dirêj da, min di sekn û helwesta wî ya ku di kar û xebata xwe ya pîroz û mayînde da anîye cîh, dît ku gotin bi tena serê xwe çiqas tûj û tund be jî, anîna wê ya ser zar û ziman karekî hêsan û sivik e.

Ger ku di cîhê xwe da neyê go- tin û neyê qeydkirin, kîngê ji zar û ziman derbikeve, wek bayê bezê difire û wenda dibe. Her çiqas tûj û tund be jî, ti car cîhê xwe nagrê û ji wendabûnê jî nafilite.

Kar û xebata Mehmet Bayrak jî, sekn û helwesta wî ya xwedî îstiqrar jî vê rastîyê careke din li ber

çavan radixîne û bi zelalî îspat dike.

Ew kesên ku 40 sal berê xwe sîyasetvan û rêvebirên giregir di- hesibandin, kî bûn?

Xêncî çend gotinên ezber û dubarekirî çî kirin û li paş xwe mîrateke çawa hiştin?

Ne kes navê wan dizane, ne jî ji kar û xebata ku binerd û nedîtbar hayîdar e.

Lê Mehmet Bayrak û *Özgür Gelecek*, ya jî ba navê xwe yê Kurdî Pêşeroja Azad?

Piştî hêjmara 8an dawî li we- şana kovarê hat, lêbelê îro di xala kurdolojîyê da *Özgür Gelecek* êdî wek dibistaneke zanyarî tê dîtin û naskirin.

Mehmet Bayrak jî wek damezranêr û mamosteyê wê dibistanê, di berhemên xwe yên domdar û mayînde da, qasî ku rûreşîya dagirkeran li ber çavan raxist û radixîne, ewqas jî dîroka kurdan zelal, pêşeroja wan jî ronî kir û dike...

Ev pirtûk, “*Kürt Kimlikli Mü- cadelem - Nasnameya Kurdî û Tekoşîna min*” jî çîroka tekoşîna Mehmet Bayrak e, ku divê her kurd wê çîrokê bixwîne û ji hebûna wê bêpar nemine...

Li ser xwarinên kurdî

Dr. Bangîn Fayo



Xwarinên kevneşopî yên kurdî, li gorî taybetmendiyên erdnîgariya herêma ku kurd lê dijîn û aboriya herêmî ya li vê erdnîgarîyê diguhere. Mitbexa kurdan li ser sewalkarî, çandinî û rezvaniye ye.

Li başûrê Kurdistanê hin fosîlên pez ên ku dîroka wan vedigere 600 sal berî zayîne hatine dîtîn, di kolanînen ku di sedsalên paşerojê de jî li Rewandiz û Kirmanşahê delîlên derbasbûna berhevkirina çandinî û sewalkariyê êşkere bûn. Lêkolînen dûre jî aşkere kirin ku

li heman erdnîgariyê teknikên parastinê yên sebze û goşt bi pêş ketine. Bi gotinek din ev agahî bi me nîşan didin ku çanda xwarinê ya kurdan xwedî dîrokeke kevnar e.

Şaxên sereke yên mitbexa kurdî li gor taybetmendiyên erdnîgarîya herêmê, genim û goşt in. Genim dibe ard û savar(bilxur). Savar di gelek xwarinan de tê bikaranîn. Savar navê genimê hişk e ku bi taybetî li başûrê Kurdistanê tê gotin.

Di gelek xwarin û çêkirina nan de jî ard tê bikaranîn. Wan ard kirin hevîr û ji hevîr jî nanên cûrbecûr çêkirin. Nan ji bo kurdan xwarineke jêneger bû.

Nanê sêlê(tîr): Ev nan zirav û gilower e. Gava tê çêkirin şûnda hişk dibe. Dema pêdivî bû, bi destan çend dilop av pê tê werkirin, tê nermijî kirin.

Nanê tenûrê: Ew nanê ku bi lédana dîwarên tenûrê tê pijandin.

Nanê hewramî: Nanekî tenik e, bi qasî 70 cm dirêj e.

Sifreyên dawet, şîn û cejnê di çanda xwarinên kurdî de dîyardên girîng in. Ev xwarin li gorî demsalê li odeyên mezin an jî li hewşan têne dayîn. Xwarin li gorî rewşa aborîya kesê ku xwarinê dide diguhere. Goştê ku pez, berx an mirîşkê danî ser rizê; ew nîşan dide ku xwedîyê malê di rewşa aborîyê de baş e an na.

Li gel zadê bi goşt, dîzik û fasûlî ji mêvanan re tê pêşkêş kirin. Xwarin li ser sifreyê di rêzan de têne rêz kirin. Di cejnê de jî xwarin bi vî awayî tên amadekirin, lê xwarin di nava malbatan de tên xwarin. Merasîma şînê jî dema amadekirin û parvekirina

xwarinê ye. Xwarina şînan bi alîkariya xizm û cîranan bi rojan didomin. Ji kesên ku tên sersaxiyê re çay û qehwe jî tê dayîn. Xwarin bi nîvro û şev du caran û ji bo mêr û jinan di odeyên cuda de têne pêşkêş kirin. Kesên ku tên şînê, ji bo piştgirîkirina xwedîyên miriyan pere, pez, şekir, çay û hwd. tînin.

Kevneşopîya seyrana li ber çêman di Newrozê de hê jî didome. Di van seyranan de bi gelemperî kutilk, kufte, şifte û dolme têne xwarin.

Kurd xwarina xwe bi pîranî rûniştina li ser kulav û mînderan li erdê dixwin.

Wekî kevneşopiyek ji berê de, ew rasterast li ser erdê, li ser sifreyê tê pêşkêş kirin. Hemû xwarinên pijandî, germ, sar, xwarinên sereke û şîranî di heman demê de têne pêşkêş kirin.

Giranîya xwarinên kurd li ser sebze, berhemên şîr, pincarên xwezayî, berhemên hevîrî û goşt in.

Çend çêjen taybet ên mitbexa Kurdan

Mehîr ji dan û dew çêdibe.

Keledoş ji mast, şîr, dan, nok, goşt û giyayên zivistanê hişk dikin.

Tirşik ji goşt, bacanên sor û yê n reş, pîvaz, îsot û xwê çêdibe.

Kutilk kutilka dîlanê û kutilka bacanreşkê

Kutilkê dîlanê ji savarê hûr, pîvaz, goştê qîme, sîr, xwê û ji biharatan çêdibe.

Kutilkê bacanreşkê ji bacanên reş, goşt, riz, pîvaz, sîr, xwê, zêd û biharatan çêdibe.

Kufte her herêm û bajarek kufte n xwe yê n bi navên cûda hene. wek; xiloloka Amedê, kufteya xav, liklikî, kolostîk û hwd

Biryan ji goştê berxê çêdibe.

Qelî ji goştê pez û dewar çêdibe. Û gelek xwarin û kebabên cûda.

Kilor ji hevîr tê çêkirin. Wek kilorê sêlê, kilora goşt, kilorên toraqê, kilora şilavkî, borek û hwd. Boreke kurdan navdar e. Ji hevîr û şekirê pudra çêdibe. Tirk dibêjin '*Kurd borêxi*'

Kate ji hevîrê tirş an bêhaveyn tê çêkirin. Li her herêmekê malzemeyên cûda tèn danîn û binavkirin.

Û hê jî bi sedan xwarinên ku nikarin têkevin rûpelan hene. Sedema vê pirrengiyê ew e ku civaka kurdan civakeke kevnar û qedîm e.

Her çiqas ji ber parçebûna welatê kurdan em nikarin navên mitbexa kurdî tam standart bikin jî, em dixwazim çendeka bi nav bikin.

Mitbexa Botan, Dersîm, Anatolîya Navîn, Behdînan, Hewraman, Mehelmî, Mêrdîn, Erdelan, Tolhildan, Soran, Xerzan, Serhed û deşta Rewanê, Xorasan, Êzdixan û Hesîçeyê, wirm û Kurdistana sor, Amed, Metînan û hwd.

Têkiliya ermenî, suryanî û tirkan, fars, ereban û gelên din ên ku bi kurdan re bi hev re dijîyan, di xwarinan de jî tê dîtîn. Li gel ku bi salan di bin zordestiyê de dijî jî, mitbexa kurdî hewl dide avahiya xwe ya resen biparêze. Lê mixabin gelek xwarinên kurdî ji aliyê civakên wek tirkan, ereb û farsan ve hatin girtin û xistin nava mitbexa xwe û wek xwarinên xwe bi cîhanê dan naskirin. Divê çarçoveyê de divê gelê kurd li mîrata xwe ya çandî yê hatiye jîbîrkin û talankirin xwedî derkeve û biparêze...

Seba Heskîfê¹

Ali Duran Topuz

I

Siya dinê

Îro çiqas giran e!

Bin taveke cemidî

Kûsiyê tarixê wergerandine ser piştê

Heskîf nûxurîya tarixê ye bû ku îro dixendiqînin

Kanê gemîya te li kû ma, Nûh?

Nûh, em çima ji vê lesarê xelas bin?

Ava dinê îro çiqas giran e!

Dinê li me kirine aş

Me dihêrin, kevirên bajarê di me dihêrin

Av berdane ser qubeyan, minare dizîne

Çerxek agirîn digêrin

Zimanê me nagere ku em bibêjin agir çî ye av çî ye

– Ev çî ye silav dide ji çîyan?

– Çeqçeqa mirinê ye!

– Ev çî ye dibare ji êsmîn?

– Xwêya hêstira me ye!

Em li zimanê xwe digerin

Bi zimanekî biyanî

Em ji xwe direvin

Bi çavên girtî

Siya dinê îro çiqas giran e!

¹Va nivîsa bi du beşa (Seba Heskîfê I - II) di bloga parêzer, rojnameger û nivîskarê ji Qoçgîrî Ali Duran Topuz de hatibû belavkirin. Bi pêşniyar û destûra wî em li vir jî belav dikin.

II

Çavên we ronî be ez mirim
Ez pêr mirim, şeva dî dîsa mirim, îro dîsa û sibe...
Sibeya min mirineke pir dirêj e

Şûna lê² megrîn seba Heskîfê
Av berdan û ez xendiqandim
Li ber çavên dinê!

Ez deh hezar salî bûm
Mirina min jî ewê deh hezar salan biçe
Şûna lê megrîn seba Heskîfê

Çavê di we ronî be
Bila yê di min şêlû bimine
Bin tasek ava genî de



Ev wêne ji koleksiyona dijîtal a Pirtûkxaneya New Yorkê (hatîye wergirtin. Sala weşandina wêne: 1867, Thomas Félix.

Wêne bi navê *Collection: Hassan - Kiff (Kurdistan)* hatîye bi navkirin.

²Şûna lê: Di devoka Qoçgîri de, bêhûde, beleheq, belesebeb, berheva, bêsebeb...

NÛJÎN QIDO Û SÊ ROJÊN MÊ

Salih Bozan

Ev pirtûka sê kurteçîrok in di bin dengê top û bombeyên cenga Efrînê de hatine nivîsîn. Ango çîrokên cengê ne. Di wêjeya cihanî de çîrok, roman û helbestên cengan rengêkî xwe yê teybet heye, ji berku ew bi rewşa civakê de girêdayî ye. Eynî ku ev berhemên li ser dozên gelemperî ne, lê bi giştî nivîskaran nûçeyên cewşenan dibihêsin û li ser dinivîsin. Bi gotineke din, berhemên wan ne tim helkewtî bûn. Wan bûyer û lehelgên xwe dibijartin. Dibe ku di her lehengekî de du, sê, çar mirov dikirin yek. Armanceke wan a pêşende ji nivîsê re hebû. Wekî bervaniya welatê xwe, piştgiriya leşkerên xwe û bilindkirina hestên netewî yên gelê xwe. Bi giştî dixastin dîroka berxwedana gelê xwe wenda nebe. Lewra berhemên wan bûn sirûdên netewî û di bîrweriya gel de cawîdan man. Lê lehengên çîrokên Nûjîn Qido ne peydakirî û bijartî ne. Ew mirovên zindî yên di nav buyeran de çalak bûn. Êş û jana cengê duhmek duhmek dikişandin. Herweha em ka-

nin bibêjin ku çîrokên Nûjînê çîrokên zindî ne, dûre nîgaşan in (xeyal). Dibe ku Nivîskara me bixwe lehengeke van çîrokan e. Bi gotineke din ev çîrokana ji helkewta cengê hatine wergirtin. Di çîroka duyem de nivîskar dinivîse: “Min nizanî qet rojek weke îro wê bike ku ez û çîroka xwe jî bibin dîrok”.

(Rûpel:36)

Pêşende ez dixwazim mijarên sereke yên di van çîrokan de bînim ber çavan:

1. Dagirkirina Efrînê.
2. Bandora dagirkirinê li xelkê Efrînê.
3. Girêdana gelê Efrînê bi warê xwe re.
4. Desthilatdariya civaka kurdî ya nêrza li ser jinê.

Di van çîrokan de em nizanin çima ev dagirkirina pêk hat û kî di paş de ye? Gor nasiya min bi xelkê Efrînê re, ew mirovên di warê siyaset û civaknasiyê de ne paşketî ne. Xelkê Efrînê bi doza kurdewerî de ji mêj ve girêdayî ye. Lê kesek di van çîrokan de tiştêkî li ser engîza

vê dagirkirinê nabêje. Ev kesana, ne giş kal û pîrên nexwendî ne. Piranîya wan ciwan in, xwendî ne û bêguman wan nûçeyên televizyonan dibihîstin. Heta kal û pîrên kurdan ji ber televizyonên kurdî ranabin. De çawa kesek li ser êrîşa dewleta Tirkîyê tişteki nabêje? Cenga Efrînê 58 rojana berdewam kir. Cengewerên kurd bi awayekî efsanwerî berevaniya welêt kirin. Televizyonên cihanê rojane nûçe li ser vê cengê didan. Ma ev kesên di van çîrokên de daxivin di guhê gê de bûn ku tişteki li ser biryara dewleta Tirkîyê ji bo dagirkirina Efrînê nebihîstin?

Em dîzanin Efrîn di bin desthilatdariya kurdî de di hemû warî de pêş diket. Di warê fêrkirina ziman û wêjeya kurdî, di warê mûzîk û stranên kurdî û di warê gavên serxwebûna kurdî. Bi kurtî Efrîn ji bin sîtema dîroka koledariyê gav bi gav derdiket. Nivîskar Nûjîn bi xwe dersê zimanê kurdî li Efrîna azad dida. Ev ronîkariya kurdî kînkêşîya şofînistên dewleta tirkîyê har kir. Sed sal in dewleta Tirkîyê gelê tirk û kurd perwerde dike ku kurd netiştêk in, ne netewek in, ne miletek in, bê ziman in, bê kultûr û bê dîrok in. Di çîrokên Nûjînê de



bi jankêşî tê gotin: „Têkçûna me weke millet, ziman û kes, belê em ji binî li ser kaxetan dihatin pişaftin bê ku haya me jê hebe“. (R.35).

Di pênc, şeş salan de Efrînê ji cihanê giş re, ne bes ji tirkan re, xuya kir ku kurd miletekî zindî ye, ji kûraniya dîrokê hatiye, ew bi kelepora xwe ji gelê tirk zengîntir e.

Rastîya ku nayê veşartin, dewlata Tirkîyê ji vê tevgera kurdî ya geşbûna siyasî, kultûrî û hunerî bizdîya. Xwest di cida vemirîne û desthilatdariya kurdî ji hole rake. Desthilatdariya kurdî li Rojava û cengewerên kurd arîşena kurdewarî (spirits) li her çar parçeyên Kurdistanê bilind kirin. Di hundirî her

kurdekî de hestên netewî serê xwe rakirin. Belam em kanin bibêjin ku cengewerên kurd cihan giş bi doza kurdî naskirin dan.

Dagirkirina Efrînê ne pilana çetên îslamî bû, belam a dewleta Tirkîyê bû. Êku vê rastiyê paşguh bike, bi taybetî yê kurd, ew êş û jana dîrokî ya gelê kurd fêm nake. Çetên îslamî bi nanezikê ketin vê çengê. Lewra, ji despêka dagirkirina Efrînê armanca wan wêrana mal û milkê nişteciyên herêmê bû. Çavên wan li dizî, pere, zêr û destdirêjiya jinan bûn. Lê çavên dewleta Tirkîyê li desthilatdariya kurdî bûn. De çima di van çîrokên de bes çeta tewanbar dibin û kesek nêzike dewleta Tirkîyê nabe?

Hîcar ev kesên di van çîrokên de daxivin ma nedidîn çawa balafirên cengî yên artêşa Tirkîyê Efrîn bombebaran dikin. Ku ne balafirên dewleta Tirkîyê bûna, çetên îslamî newêribûn pêle sînorên Efrînê bikirana. Paşê, kê rê da çetan mafên mirovên sivîl bi vî awayî hovane binpêk bikin?

Ev pirtûka li paytexta Tirkîyê Izmîrê hatiye çap kirin(2023). Dibe ku hemû gotinên ku dewleta Tirkîyê tewanbar dikin hatibin rakirin, ji bo di çapê re derbas bibe.

Ez texmîn dikin, kî vê pirtûkê bixwîne dê ev pirsana di sewdanê (aqil) wî de serî xwe rakin.

Lê dîsa ez dibêjim, ev kêmasiya bihaneya van çîrokên danaxe. Bi taybetî di warê hawara gelê Efrînê de û di warê wêje û zimanê kurdî de. Ji aliyekî din, ev çîrokana bi mijarên xwe zengîn in.

Rastiyek di van çîrokên de tê gotin, ku çetên îslamî pirçî hatin Efrînê, lewra hemû tişt wêrankirin. Lê xuya bû ku ew ne bes birçî hatin, belam ji girşan û gerdişan hilmîştî bûn. Ew wekî nejdevanên îslamî yên despêka ola îslamî hatin Efrînê.

Xeyne kujtinê, gelek efrînî mecbûrî penaberiyê bûn. Ew penaberî Şehba, Heleb, Kobanî, Qamişlo û herêma Kurdistana Başûr bûn. Ta niha em dibînin û dibihîsin dewleta Tirkîyê û çetên wê çî kiryarên dirinde bi xelkê Efrînê dikin, bi tayîbeti bi jin, keç, kal û pîran. Belam heta darê zeytûnê rûçikandin. Cilên jinên xwe li jina efrînî feriz kirin. Efrîna rengîn bi tevahî kete bin rengê reş ê îslamî.

Nûjîn, bi zimanekî sana û raste-go ji me re xuya dike: “Hey Xwedê! Em reviyam, em li gel miletê mayî xayîn derketin“. (R.46).

Di dîroka penaberiyê de her penaberek bi vê xinzîyê (xiyanet) hest dibe. Ew hest dibe ku xinizî bi welat û gelê xwe re kir. Li penaberiyê, ro, ezman, zemîn û hemû wêne biyanî ne. Kederek di dilê penaber de rewze dibe, bi demê re giran dibe û li dawiyê her penaberek bi wê kederê dimire. Em vê rastiyê di stranên jinên kurd li Xorisanê dixwînin (vegere pirtûka *Sêxistîyên Kurmancî Xorasan-Celîlê Celîl û Gulê Şadkam*) û di stranên jinên peştônî (Efxanistan) de jî dixwînin. Jina peştônî li ser jina ku sirgûn bûye weha daxive:

Ev jina sirgûn bûye di her duhmekekê de dimire. Rûyê xwe bi warê xwe de dike, ji bo ji sekerata xwe ya dawîn rizgar bibe.

Nûjîn di çîroka duyem de dibêje: «*Ciwanên welêt yan dibûn leşker yan jî dev ji welêt berdidan û berî xwe didan koçberiyê. Mirin li ber derî bû û ciwan weke pelgên daran diketin. Şer li me bû mêvan, tinebûn jî weke herdem û li me bû qeder ku em koçberiyê jî bibînin*». (R.43).

Jina peştônî ya nexwendî bi vê rewşê kûr hest dibe. Ew dizane ku dagirker biserkeve, wê çî were serê gel, bi taybetî serê jin û zarokên wan. Lewra dilyarê xwe hişyar dike ku ji ber dijmin nerive. Ku birive

dê evîna wî ji dilê xwe bavêje:

Dilyarê min ku tu ji ber dijmin reviyayî li min vemegere!

Here ji xwe re li penagebekê li walatekê dûr bigere.

(Ev helbestên jinên peştônî ji destnivîsa pirtûka min: *Lan-dayî-Helbest û Stranên Jinên Peştônî*)

Em dizanin ku jina efrînî wekî jina peştônî bi dilûcan li paş cengewerên welêt sekinîn. Di 58 rojên cengê de piraniya gelê Efrînê ji warê xwe neliviya.

Bêguman mirovên sivîl zêdetirîn di cengan de zîyanê dibînin. Ji berku ceng zagonan, girşan û gerdişan binpêk dike. Di hemû cengan de jin pirtir jankêşiyê dibînin. Zarok, bira, hevjin û dilyarên wan şehîd dikevin, Malbat hildiweşin û pir caran dagirker jinan çaris dikin. Lewra em dibînin piraniya penaberan tim jin in.

Lehengên çîrokên Nûjîné vê rastiyê bi awayekî yekser tekez dikin. Piştî dagirkirinê, li hember çetan cengewer êdî neman, bes mirovên sivîl yên bê çek man. Hinekan berî xwe dan çolan û li xelasiya zarokên xwe gerîyan, hinekan jî xûna xwe kirin mistên xwe û rû bi rû li pêş çetên îslamî perîşan rawestiyen. Ji-

na efrînî dibêje: «*Gawir ketin welêt. Me qirika xwe mecbûr da ber kêrên wan*». (R.49)

Gor axaftinên jinan di van çîrokan de, koçberî jî mirinek e. Li ser zimanê kalekî tê gotin: «*Zindî dema ku bardikin; çi ji welêt, çi ji mala xwe, çi ji dunyayê dimirin*». (R.63). Zimanê kalan û pîran dîyar dikir ku di bin desthilatdarîya dagirkeran de em li ber mirinê ne, lê penaberî mirineke dirêj e, bira em li ser xaka xwe bimirin.

Ev lehengiyeke efsanwerî ya gelê Efrînê ye.

1

Xelkê Efrînê di penaberiyê de ji nişkave hest bûn çiqas Efrîn li ber dilê wan giranbiha ye. Lewra çavên wan ta niha li vegeê ne. Penaberên efrînî, xeyne yê hatin Ewropa, heta di endîşe û di xewnên xwe de vegeê dibînin. Ew nikanin bawer bikin ku ev dagirkirana û penaberîya rast e. Di pirtûka Nûjînê de tê gotin: «*belkî ev rewşa han xewn be, ne rast be û mirina ciwanan rojane li ber sînoran derew be*». (R.65).

Tiştêkî balkêşê din em di van çîrokan de dixwînin. Xelkê Efrînê di vê mêmatê de bi hevdu re dilsoz derketin, piştgirî û alîkariya hevdu kirin, nan xarin û cil li hevdu parve kirin.

Çendîn tirajedîya Efrînê li gelê kurd giran e, lê dîroka kurdî ya serdemî de mêrxasiya cengewerên Efrînê dê bimîne sembola berxwedana netewî ya gelê kurd. Van cengeweran ji cihanê bi tevahî re xuyakirin ku çendîn ew bi axa xwe de girêdayî ne. Lê pêûsên nivîskarên kurd (bi taybetî kurdên Rojava) li ber qorbaniya wan lawaz derketin. Ji berku ew ta niha ne gihîştine zanahiya ku kanibin vê pêwendîya germ a di navbera cengewerên kurd û welêt de bibînin. Lewra Şoloxovekî me nîne (*Dona Hêmin*). Borîs Polîvoyîyekî me nîne (*Çîroka Mirovekî Rastger*) û Kostentîn Sîmonovekî me nîne (*Sêyîna Cengê*). Şehîdên Efrînê di bîraweriya gelê xwe de bi xûna xwe navên xwe nivîsîn. Kî kane navê wan ji dîrokê hilkişîne, ji kelepora kurdî rake? Lê mixabin nivîskarên gelê kurd di vê cenga dijwar de û heta paşê jî, tiştêkî hêja li ser bobelata Efrînê dernexistin. Dibe ku ev çîrokên Nûjînê pirtûka pêşende be di vî warî de.

2

Aliyekî din di çîrokên Nûjînê de heye gelek giring e, ew jî aliyê civakî ye. Lehengên van çîrokan li ser pêwendîyên civakî jî daxivin.

Lê yên li ser rewşa civakê daxivin ne kesên wiqas zana ne. Belam piraniya wan kesên gundî ne. Di tevahiya civaka me ya Suriyê de cudahiyeke di navbera civaka gundî û ya bajarî de heye. Çi li aliyê ereban û çi li aliyê kurdan be. Rewş li herêma Efrînê jî weha ye. Asta zanahîya civakî li gundên Efrînê ji ya kurdên li bajarê Efrînê û Helebê dijîn ta niha paşketîtir e.

Gerek em rastiyeke din jî bibêjin. Li gundên Efrînê xwendevan ne hindik in, heta yên ku gihîştine zanîngehan jî hene. Lê girşan û gerdişên êlî û malbatî desthilatdariyê li wan dikin. Bi gotineke din, bandora zanahizê li civakê hîn lawaz e. Pir caran keçên xwendî didin mêrên nexwendî, an kalan. Carina jî keçên berbext didin mêrên zarok.

Dibe ku engîza bingeşin ji vê rewşê re xizanî be. Em dizanin piraniya malbatên gundî xizan in. Bav dixwazin keçên xwe bidin mêrên zengîn ji bo di jiyana xwe de weke wî perîşan nejin. Ev rewşa em di çîrokên Nûjînê de meyze dikin.

Gerek em cudahiyeke din li vir rava bikin ku eynî civaka kurdî wekî hemû civakên rojhilatî

civekeke nêrza ye, lê dîsa taybetiya civaka kurdî heye. Mebesta min civaka kurdî ne wekî civaka erebî bi yasageriya ola îslamî de wiqas girêda ye. Li Rojava pir caran gerdişên êlî û malbatî ji yasageriya îslamî hêzdartir in.

Em dizanin evîn di civaka îslamî de kedexe ye, û pêwendiyên ganekî li dervayî zewaca fermî bi kujtina jinê bidawî dibe. Gor ola îslamî di paş van pêwendiyên de Pelîd (Şeytan) desthilat dar e. Kec li ber qedera xwe ye. Zewaca wê bi vîna bav û biran de girêdayî ye.

Em kurdên Rojava dizanin ku di warê civakî de jinên Efrînê ji jinên Kobaniyê û Qamişlokê pêşketîtir in. Wan gelek maf bi xûna xwe bidestxistine. Lê kelepura kurdî di bin siya civaka debengî û ya ola îslamî de ta niha rizgar nebûye. Yasageriya îslamî jinê dike koleya mêr. Ev pêwendîya di dirêjîya dîrokê de gelek taybetmendîya civaka kurdî bi aliyê civaka erebî de guhart.

Gerdişên civaka kurdî yên kevnar ne wekî yasageriya ola îslamî teng bûn, û ta niha jî ne wiqas teng in. Belam rola jina kurdî di gelek warê civakî de ne kêrî rola mêran e. cengewarên

YPJê ev rastiya derxist ber çavan. Bîrûbaweriya îslamî bi demê re civaka kurdî gor yasageriya îslamî veguhart. Lewra em dibînin jana jinên îslamî di hemû netewan de nêzikî hevdu ne. Kêşeya yekem di vî warî de bav û bira rola bingehîn di zewaca keçan de dilîzin û di ser wan re jî miftiyê îslamî hazir e.

Di çîroka duyem de jina kurd aşkere li ser mêrê xwe yê ne bi dilê xwe pê re zewicîye dibêje: „... *weke ku ez bi lawirekî re dijîm. Heta bala xwe nedida rewşa welat, wî dikir ku haya wî ji hawirdora xwe tine be, an jî ne xema wî be kî dimire, kî tê kujtin*“ . (R.37)

Giringî li cem mêrên weha sê tiştin; Ezîtiya wî, malê wî û bexteweriya wî. Ji aliyekî de, jin kêrî mêran e û ji aliyê din ve, çî tê serê gel ne xema wana ye. Çiqas xort û keç di cengê de werin kujtin, pozê wan naşewite. Di dîroka kurdî de ev nimûna tim desthilatdar bû, û kurdên weha dibûn engîya têkçûna berxwedan û şoreşên kurdî. Ku em li kîjan raperîn û şoreşên kurdî vegerin, em ê bibînin ku piraniya serokeşîrên kurd, oldarên kurd û zengînên kurd xinzî bi raperînan û şoreşgerên kurd re kirin. Têgeha xiniziyê li cem wan

nîne. Belam têgeha berjewendiyê giring e.

Nûjîn xuya dike ku civaka nêrza evînê bînpêk dike. Lê qet nikane vemirîne. Evîna Zeynebê di çîroka yekem de serê xwe ji girşanên civaka nêrza û yasageriya îslamî re bi temamî danexist. Di dîroka çîrokên evînê de ti carî evînê serê xwe ji zordaran re danexist. Ku evîndar ti çareyê ji evîna xwe re nabîne, ew xwe dike. Ev xwekujtina gelek watedar e. Evîndar (keç an xort) di vî xwekujinê de azadiya dilê xwe dibîne, wekî ku ji civata nêza re bi dengê bilind dibêje „Na“. Zagon, girşan, gerdîş û ol ti carî nikanibûn deriyê evînê bigirtana. Heta di cengan de evîn serê xwe danaxe. Ji berku ev hesteke serbixwe ye. Ji mirovê despêkî de û ta niha evîn pakîze ma. Ev pakîzeyê dibe engîza xwekujtinê.

Di hersê çîrokan de helkewt (reality) daxive. Em li keskî rewşenbîr, siyasetmedar û oldar rast nayên. Li vir civak yekser daxive. Bi gotineke din em kanin bibêjin li vir zêdetirîn dil daxive ne sewdan. Di eynî demê de dil bi dilan re daxive. Lewra tirajedîya Efrînê zêdetirîn di van çîrokan de xuya dibe.

Pir caran sewdanê nivîskaran bi rêya zimên nikane bêtarên mezin daxê ser rûpelan. Ji berku ziman nikane van bêtaran dorpêç bike. Kî kane dilê dayîka ku li ser kurê xweyî mirî porê xwe dirûçikîne vekolîne. Çiqas nivîskar jîr be û bilîmet be, ew nikane derbasî dilê wê bibe û kela jankêşiyê wê bibîne.

Carekê xortekî ispanî bi helbestvanê Çîllî yê navdar Pablo Neruda re (1904-1973) got: Ez dixwazim bibim helbestvanekî navdar wekî te, tu çi tembeyan li min dikî? Neruda lê nihêrî û bişirî. Paşê jê re got: Ji bûyerên biçûk despê bike, wê çaxê dê xwendevan bixwe bûyerên mezin nas bikin. Ji berku bûyerên mezin ji zimanê mirov mezintir û ferehtir in. Bêku Nûjen vê tembeya Pablo Neruda bibhîse (ez weha texmîn dikim) wê di çîrokên xwe de ev tembeya bicih anî. Wê jiyana rojane di bin dakirkeran de bi xwendevan naskirin da. Ji wan bûyerên rojane û axaftina çend kesan em kanin tirajedîya xelkê Efrînê di wan rojên cengê de kûr bizanibin.

3

Zimanê Nûjînê hêsan e. Ti pirs-girêkên mezin tê de nîne. Hevokên wê hevgirtî ne. Eynî ku wê wêjeya

erebî di unervêrsîte de xwendî ye, lê di kurdîtiya xwe de ji bin bandora zimanê erebî rizgar e. Peyvên erebî di teksta wê de pir kêr in. Ên hene jî, ew peyvên ku zemande ketine zimanê kurdî û fonotîka kurdî girtine. Xwendevanê çîrokên wê hest nabe ku ew zimanê erebî dizane. Nûjîn bi kurdîyeke gelêrî dirame û dinivîse. Lê kurdîyeke zelal e. Lewra bi hêsanî ramanên xwe digihîne xwendevan. Wekî ku navnîşana çîrokên Nûjînê „*Sê çîrokên me*“ bi nav dibe, ez kanim bibêjim ku zimanê wê jî zimanekî mêza ye. Ti astengiyên mezin di derbirîna wê de nîne. Hevok bi germî milên xwe didin milê hevdu. Bi gotineke din zimanê wê wekî ava solînekê bi nermî û bê fêxan dimeşe. Ez texmîn dikim ku Nûjînê ji perwerdeya kurdî baş sûd girtiye. Lê ev nayê wateya ku çewtiyên rêziman û rênivîsê di teksta wê de nîne. Ev kêşeya me nivîskarên kurdên Rojava gişkan e. Madele ez ne zimanzanekî kurd im, ez ê li ser vê mijarê tiştekî nenivîsim.

Li dawiyê ez dixwazim bibêjim ku çîrokên Nûjînê pelgenameyek wêjeyî ye ji dîroka Efrînê ya nûdem.

27-salîya Bîrnebûnê:

Heta niha çi kir û divê çi bike?

Adem Özgür

Kurdên ku ji 300 salan zêdetir e ji welatê xwe hatine dûrxistin û li çolên Anatoliya Navîn hatine bi cîhkirin, hê jî ziman, çand û gel-nasiya xwe ya resen heta îro jî parastine. Kurdên Anatolîyê, ji ber dûrbûn û mercên dijwar ên fîzîkî û astengiyên siyasî, nekaribûne bi xizmên xwe yê Kurdistanê re pêwendîyeke xurt pêk bînin. Pêwendîya ku hebûye jî di nav demê de ji ber dûrbûna ji Kurdistanê hatiye radeya qutbûnê. Kurdên Anatolîyê, di destpêka koçkirinê de, di nav sînorekî biçûk de jîyaneke kambax a mişextiyê jiyane û bi mercên pir xeternak re rûbirû mane.

Di sedsala 1800an de, ji alî osmanîyan ve, di çarçoveya yasayekî li vê harêmê hatine bi cîhkirin û ew roj îroj e li vê herêmê di nav wan mercên dijwar de jiyana xwe domandine. Bi vê helwestê Dewleta Osmanî xwestiye ku rêya vegera van kurdan a li Kurdistanê yekser bê girtin. Li gel hemû astengî û siyasatên ku li dij wan

hatine meşandin jî, Kurdên ku ji welatê xwe hatine qewirandin, vê herêma biyan şên kirine û di nav vê çolistana Anatoliya Navîn de ji xwe re giravên jiyane çêkirine.

Cûdahîya mezhebî û eşîrtî

Kurdên Anatoliya Navîn bêtir di nav sînorên bajarên Enqere, Konya, Kirşehir, Aksaray, Kirikkale, Çankiri û Kayseriyê de dijîn. Her wiha bêtirê van kurdan suneyên henefî ne, lê belê li gel vê hindek bin jî elewî û sunneyên şafî jî hene. Bêtirê yê şafî şêxbizî ne. Di nav kurdên Anatoliya Navîn de cudahiyên mezhebî û eşîrtî tu carî nebûye arîşeyek mezin û ji ber vê yekê ev mesele nebûye babeta rûdanên bezyanê. Ji ber dorpêçkirina xeteriya têkçûnê nasnameya kurdîtiyê ji xwe re kirine hîmê xweparastinê û ji ber vê yekê jî pêwendiyên wan li gel hev her baş bûye û hev parastine. Ev destkeftiyên hevparastinê bi zewac û danûstendina bazirganiyê xurttir bûne. (1)

Dibistan û bajar

Li gel kêmbûna lêkolînên akademîk û zanistî jî, tê payîn ku hejmara şênîyên kurd ên li Anatoliya Navîn ji milyonek zêdetir e. Ev kurdên ku heta salên 1960an, bi awayekî rêkûpêk kurdewariya xwe parastine, her bi zimanê kurdî jiyana xwe domandine û di nav civaka xwe de bi cilûbergên kurdî kevneşopa kelepura kurdî ya resen domandine. Lê belê piştî salên 1950-60an bi gelemperbûna derfetên avakirina dibistanan û perwerdehiya bi tirkî û bi zêdebûna pêwendiyên bi bajaran re deriyên bişavtinê jî vebûne. Piştî 40 salên dawî jî bi zêdebûna kanalên televizyonê û çapemenîya dîtbarî û di panzdeh salên dawî de jî bi belavbûna tora înternetê kurdên Anatoliyê ketine nav xeteriyeke mezin a bişavtinê. Êdî keç û xort, jin û mêr û kal û pîrên kurdên Anatoliyê cilûbergên kurdewar li xwe nakin û nifşên nû di nav civakê de kurdî kêmtir bikartînin. Tê gotin ku eger ev rewş wiha berde-wam bike, di nav van kurdan de nîrxên kurdewariyê wê bi xeteriya tunebûnê re rûbirû bimîne.

Kovara Bîrnebûn

Hin rewşenbîrên kurd ên Anatoliya Navîn ku koçî welatên Ewropayê kirine û li wê derê dijîn, di sala 1997an de, bi mebesta çand, huner û dîroka kurdên vê herêmê bigeşînin û li ser van babetan lêkolînan bikin û biweşînin dest bi xebatên çapkirina *Bîrnebûnê* dikin û piştî demekê li Almaniyayê dest bi derxistina vê kovarê dikin. Kovara Bîrnebûn ji sala 1997an bi şûnde êdî di her hejmareke xwe de li ser jîyan, dîrok û çand û hunera kurdên Anatoliyê gencîneyeke bêhempa pêşkêşî kurdan dike, dibe yek ji girîngtirîn çavkaniya daneyên kurdên vê herêmê. Ev kovara ku di 27 saliya xwe de bi hejmara xwe ya 89 derket pêşberî xwênerên kurd, li gel ku di destpêkê de bi kurdî-tirkî derketibe jî, di nav demê de hêdî hêdî giranîya xwe daye ser kurdî û îro hemû naveroka wê bi tevahî kurdî ye. Kovar di destpêkê de bi dirûşma “*Kovara hunerî, çandî û siyasî ya kurdên Anatoliya Navîn*” dest bi weşanê kir, niha jî bi he-man armancê vê xizmeta xwe ya giranbûha didomîne.

Kovargerîya balkêş

Di sîh salên dawî de li gel geşbûna zimanê kurdî û xurtbûna pêwendîya wê ya bi jiyana bajarvanî, zanistî, teknoloji û her beşên jiyana nûjen nivîskar û rewşenbîrên Anatoliya Navîn ku devoka kurdî ya Anatoliya Navîn diparêzin jî hene. Va kesan devoka vê herêmê ku ji devokên li Kurdistanê hinek cudatir e dinivîsin û xwedî li vê cudahiyê derdikevin. Ev rewşenbîr û nivîskarên vê herêmê bi ser gi-handina nîşên nû vê cudahiyê arasteyî nîşên nû jî dikin û êdî şagirtên nûjen jî li gor şarezabûna xwe di kovara *Bîrnebûnê* de nivîsan dinivîsin. Bi vê taybetiya xwe, kurdên Anatoliya Navîn û *Bîrnebûn*, him di derbarê dîroka Anatoliya Navîn de, him jî di dîroka Kurdistanê de ji bo rojnameriya kurd xebateke pir girîng û balkêş derdixin holê.

Bêalîbûn û 27 sal

Bîrnebûnê di derbarê taybetiyên dîrokî, civakî, erdnîgarî, olî, ziman û wêjeya devkî û nivîskî, kevneşopî, etnografî, folklorî, taybetiyên hozî, rewşa aborî û siyasî, koça derve û hundur û babetên din ên li ser kurdên Ana-

toliya Navîn de gencîneyek mezin pêşkêş kirîye. Li aliyê din kovar, di çerçoveya prensîba bêalîbûnê de tê çapkirin. Ev yek jî di hejmarê “Destpêk” a hejmarê yekem a kovarê de, ku li ser dîrok û çanda kurdî radiweste, hatiye teqezkirin.

Ji destpêkê da heta îro wek Nebî Kesen, Nuh Ateş, Ali Çiftçi, Seyfi Dogan, Fikret Yıldız, Muzaffer Özgür, Mem Xelikan, Berivan Keskin, Mehmet Bayrak, Rohat Alakom, İhsan Türkmen, Mehtab İdeli, Altun Başaran, Osman Alabay (Curukî), İrfan Baysal, Bekir Darî, Hacı Erdoğan, Vahid Duran, Amed Tigris, Mahmud Lewendi, Memê Hilkeçikî, Hesenê Metê, Neçîrvan Qilorî, Memê Mala Hinê, Prof. Dr. Hacı Akman, Xizan Şilan, Yusuf Yeşilöz, Yusuf Polat, Ecevit Yıldırım, Memduh Selim, Nesrîn Bayram, Fatoş Koyuncuer, Mille Evindar, Mistoyê Heco, S. Erdem, Enes Rojvan, Bilal Celebli, Hizir Akbîna û gelek kesên din di kovarê de cîh girtin.

Kovargerî, medyaya dijîtal û edîtorî

Di van çend salên dawî de populerbûna kovaran ji nûve zêde dibin. Di heman demê deli dinyayê

hejmara kovar û xwendevanên kovaran de zêdebûnek xuya heye. Ji ber ku li hember kêmasîyên internetê hejmara rûpelên kovaran, dema weşanê, sînorên mijarê dîyar in. Lê her çend kovar xwedî modelek edîtorî û aborî bin jî, hewceyê dijîtalê/nûbûnê ye jî. Bi vê minesebetê em nikarin bibêjin ku kovara Bîrnebûnê û medyaya dijîtal girêdayê hev in. Mixabin *Bîrnebûn* hê ji van tiştan dûr e. Ji ber ku dema ku em qala medyaya dijîtal dikin weşanên podcastan, hişê çêkirî (yapay zeka), bultenên e-nameyan, videoyên kurt, kovarên dijital û malperên bi hêsanê tên xwendin tên bîra me. Divê alîyekî kovar bê weşandin li aliyê din jî hesabên Bîrnebûnê yê sosyal medyayê aktîf bîn bikaranîn; di malperê de wêne, grafîk, xerîte, agahiyên balkêş û nivîsên nûjen bîn belavkirin. *Bîrnebûn* hinek ji van tiştan dûr e. Ez di vê baweriyê da me ku eger kovar bikeve cîhana dijital dê zêdetir xwe bigihîne xwandevanên xwe.

Çavkanî:

Adem Özgür, *Bîrnebûn* a kurdên Anatoliya Navîn: *Dengê bîra sirgûniyê*, BasNûçe, r. 13, s. 8 - 14 Sibat 2016: Stenbol.

Kêmasîyeke din a ez dibînim ev e; di hejmarên kovarê de mijarên dîyar nîn in û nivîskar di nivîsan de azad in. Ev jî dibê sedemên dûbareyên mijaran. Divê di her hejmarê de li ser mijareke were sekinandin û herî kêmdî derbarê wê dosyayê de pênc nivîs/hevpeyvîn hebin. Li aliyê din hin helbestkar, helbestên xwe bi sernavê “helbest” dinivîsin. Em çawa nikarin ji sernavên nivîsan re bibêjin “nivîs”, divê ji sernavên helbestan re jî wisa nayê gotin. Wek mînak, lêkolînerê bixwaze li ser helbestên kurdên Anatoliya Navîn lêkolîneke bike, dê çawa wan helbestan wek çavkanî bide? Divê editorên kovarê helbestên bêsernav qebûl nekin.

Bîrnebûn bo me dibistanek e, em dikarin kêmasîyên heyî ji holê rakin û kovarê bipêş bixin.

Bi vê minesebetê 27 salîya kovarê û Newroza me pîroz dikim!

"DIE REBELLIN", SERHILDÊR

Bekîr Dari kitêbeka zarokan a felsefî ya pirxweş bi zimanê almanî çêkiriye.

Kerê serhildêr li ser rêya xwe dimeşe. Çirok bi xweşî dawî dibe. Ev ne tenê ji bo zarokan e! Kitêp ji aliyê weşanxaneyê *tîr-verlag* ve li Almanyayê hatiye weşandin. Bi 64 rupelên rengîn û cildkirî hatiye çapkirin. Li piştbergê bi ev gotinên li jêr kitêp hatiye nasandin.

“Ya girîng ew e ku hûn raman û têgihîştina xwe ji tiştên negihîştî, ji xeyalan rizgar bikin, ji bo herkes xwe bigihîne wan û bi jiyane tişt bikin.

Bi çûna ser berfa nû ya paqij, bêguneh û ji qebûlkirina her tiştî re vekirî şopên ku we li duv xwe hiştine hinekî meşîya bişûnda, bê ku xil û xarîya şopan bifikire, vegere, li şopên xwe binêre û bi serbilindî bêje: "Ev şopên min in!" Wek dayîka ku nû zarok anîye dunê, jiyane nû diyarî kiribe, bextewar û serbilind be."

Bekîr Dari di sala 1956an de li Anatoliya Navîn hatiye dinê. Bingeha xebata wî ya hunerî şewazeke derbirinê ya tund e.



DIE REBELLIN



"Wichtig ist, eigene Ideen und Wahrnehmungen von Traum und Unerreichbarem für jeden erreichbar zu machen und mit Leben zu füllen. Mit Leben zu füttern.

Eigene Spuren in einem neuen Schnee, der gerade gefallen ist, unschuldig und zart und für alles empfängsbereit. Die Samen einzusetzen mit eigenen Spuren, egal wie falsch oder richtig sie sind. Und weiterlaufen und mit Abstand zurück gucken und sagen: 'Das sind meine Spuren!', genauso wie eine Mutter sagen würde, 'das ist meine Geburt'. So glücklich zu sein wie jede Mutter, dass sie Leben geschenkt hat."

Bekir Dari,


Kurde, 1956 in Mittelanatolien geboren. Der Schwerpunkt seines künstlerischen Schaffens liegt in einer intensiven expressionistischen Ausdrucksform.

© 2023 tir-verlag-berlin - für die deutschsprachige Ausgabe - 1. Auflage
ISBN 978-3-947765-14-0 – Bestellung über den Verlag oder den Autor.

Ev kitêba Bekîr Dari li malpera weşanxaneyê tîr-verlagê yali jêr peyda dibe.

<https://www.tir-verlag.com/shop/die-rebellin>

DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÛKARÏ
— TEVLÏ PÊÏEROJA ZAROKAN BIBIN —



TÊKILÏ / KONTAKTA OSS
Mjölнарstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner

